

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Mehmet YONAT**

**NÛDEM DERGİSİ VE NÛDEM DERGİSİ'NDEKİ SÛRGÜN İZLERİ**

**YÛKSEK LİSANS TEZİ**

**Muş 2015**



**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Mehmet YONAT**

**NÛDEM DERGİSİ VE NÛDEM DERGİSİ'NDEKİ SÛRGÜN İZLERİ**

**YÛKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**

**Doç. Dr. Murat AKTAŞ**

**Muş 2015**

**K.T**  
**ZANÎNGEHA MÎŞ ALPARSLANÊ**  
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Î ÇANDA KURDÎ**

**Mehmet YONAT**

**KOVARA NÛDEMÊ Î DI KOVARA NÛDEMÊ DE ŞOPÊN**  
**SURGUNÊ**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Doç. Dr. Murat AKTAŞ**

**Muş 2015**

## SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim ve Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Nüdem Dergisi ve Nüdem Dergisi*’ndeki Sürgün İzleri” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Raporum sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Raporumun ..... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

10.07.2015

Mehmet Yonat

*M. Geyo*

TEZ KABUL TUTANAĞI

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Murat Aktaş danışmanlığında, Mehmet Yonat tarafından hazırlanan bu çalışma 10/06/2015 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Doç. Dr. Murat AKTAŞ  
Jüri Üyesi : Doç. Dr. Abudrahman ADAK  
Jüri Üyesi : Yard. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza :  
İmza :  
İmza :

Yukarıdaki imzalar adı geçen öğretim üyelerine aittir.

Doç. Dr. Mehmet Kamil COŞKUN  
Enstitü Müdürü

## NAVEROK

NAVEROK .....	i
KURTE .....	IV
ÖZET .....	V
ABSTRACT .....	VI
KURTEBÊJE.....	VIII
ÎNDEKSA ŞIKLAN.....	IX
DESTPÊK .....	1

## BEŞA YEKEM

### PÊNASEYA SURGUN Û DIYASPORAYÊ

1.1.SURGUN .....	8
1.1.1. Surgun Çi ye?.....	8
1.1.2 Aliyên Neyînê yên Surgunê.....	11
1.1.3 Aliyên Erênê yên Surgunê.....	12
1.1.4. Surgun û Nivîs.....	13
1.1.5. Surgun û Neteweperwerî .....	14
1.1.6. Surgun û Xesûdî .....	15
1.1.7. Dawiya Surgunê .....	15
1.2. DIYASPORA .....	16
1.2.1. Diyaspora Çi Ye? .....	16
1.2.2. Dîroka Diyasporayê û di Nav Wê Dîrokê de Wateyên Girtiye.....	17
1.2.3. Taybetiyên Diyasporayê .....	19
1.2.4. Cureyên Diyasporayê .....	22

## BEŞA DUYEM

### ÇAPEMENIYA KURDÎ Û DIYASPORAYA KURDÎ YA EWRUPAYÊ

2.1. BI KURTASÎ DÎROKA ÇAPEMENIYA KURDÎ.....	25
2.1.1. Di Dema Osmanîyan de Çapemeniya Kurdî.....	25
2.1.2. Di Dema Komara Turkiyeyê de Çapemeniya Kurdî .....	27
2.1.3. Li Sûriyê Çapemeniya Kurdî .....	28
2.1.4. Li Iraqê Çapemeniya Kurdî .....	29
2.1.5. Li Îranê Çapemeniya Kurdî .....	30

2.1.6. Li Qafqasyayê Çapemeniya Kurdî .....	31
<b>2.2. DIYASPORAYA KURDÎ YA EWRUPAYÊ .....</b>	<b>32</b>
2.2.1. Kurdên Swêdê .....	36
2.2.2. Kurdên Almanyayê.....	38
2.2.3. Kurdên Fransayê .....	40

## BEŞA SÊYEM

### NASÎNA KOVARA NÛDEMÊ

<b>3.1. ARMANCA NÛDEMÊ .....</b>	<b>42</b>
<b>3.2. NÛDEM, ZIMAN Û EDEBIYAT .....</b>	<b>45</b>
3.2.1. Zimanê <i>Nûdemê</i> û Standardîzasyona Zimên.....	45
3.2.2. Çapxaneyê <i>Nûdemê</i> û <i>Nûdem</i> Werger:.....	47
3.2.3. Dibistana <i>Nûdemê</i> .....	48
3.2.3.1. Quncika Agorayê.....	48
3.2.3.2. Xelata <i>Nûdemê</i> ya Edebiyatê .....	49
3.2.3.3. Xelata Nobelê .....	50
3.2.3.4. Cafê <i>Nûdem</i> .....	50
<b>3.3. ABORIYA NÛDEMÊ.....</b>	<b>51</b>
3.3.1. Astengên Aborî .....	51
3.3.2. Di <i>Nûdemê</i> de Reklam .....	54
<b>3.4. XÎMÊN NÛDEMÊ .....</b>	<b>55</b>
3.4.1. <i>Nûdem</i> û <i>Hawar</i> .....	55
3.4.2. Di <i>Nûdemê</i> De Werger.....	61
<b>3.5. Nivîskarên Sereke yên <i>Nûdemê</i> .....</b>	<b>69</b>
3.5.1. Fîrat Cewerî.....	69
3.5.2. Derwêş Medenî Ferho .....	73
3.5.3. Şahîne Bekirê Soreklî .....	75
3.5.4. Dr. Cemşîd Bender .....	77
3.5.5. Zeynelabîdîn Zinar .....	78
3.5.6. Xelîl Dihokî.....	79
3.5.7. Mehmed Uzun.....	79
3.5.8. Rojen Barnas .....	80
3.5.9. Rohat Alakom .....	82

3.5.10. Ferhad Pîrbal .....	82
-----------------------------	----

**BEŞA ÇAREM**

**DI KOVARA NÛDEMÊ DE ŞOPÊN SURGUN Û DIYASPORAYÊ**

<b>4.1. DI NÛDEMÊ DE CUREYA DIYASPORAYA KURDÎ .....</b>	<b>84</b>
<b>4.2. DI NÛDEMÊ DE TAYBETIYÊN DIYASPORAYÊ .....</b>	<b>87</b>
4.2.1. Ji Welatê Xwe bi Darê Zorê Derketin û Herî Kêm Ber bi Du Welatan ve Koç Kirin .....	88
4.2.2. Bîr û Baweriyeke Hevpar ya Derbarê Welêt de.....	90
4.2.3. Îdealîzekirina Welêt û Berpirsiyareke Hevpar ji bo Beqa, Ewlehî, Restorasyon, Refah û Jinûveavakirina Welêt.....	93
4.2.4. Pêşketina Tevgerên Vegerê yên Ku Qebûleke Hevpar Dest Xistiye .....	97
4.2.5. Bi civata Xwedîmal re Têkiliyên Xirab, Îdiaya Neqebûlbûna ji Hêla Wê Civatê ve.....	99
4.2.6. Hîsa Yekîti û Empatîyê bi Nûnerên Heman Grubê re.....	100
4.2.7. Di Welatên Xwedîmal de Îhtîmala Jiyanê Afîrîner û Zengîn bi Toleranseke Pluralîzmê ve .....	101
4.2.8. Di Civata Orjînal û ya Xwedîmal de Otonomiya Dîtbarî.....	102
<b>ENCAM.....</b>	<b>104</b>
<b>PÊVEK.....</b>	<b>106</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>124</b>
<b>ÖZGEÇMİŞ.....</b>	<b>.....</b>

**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**KOVARA NÛDEMÊ Û DI KOVARA NÛDEMÊ DE ŞOPÊN SURGUNÊ**

**YONAT, Mehmet**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Murat AKTAŞ**

**2015, 141 Rûpel**

Mijara vê tezê ew e ku biberfirehî danasîna kovara *Nûdemê* bike û şopên surgun û diyasporaya kurdî di vê kovarê de bigere. Bi vê tezê armanca me, nasîna kovara *Nûdemê* ye ku ji hêla diyasporaya kurdî ya Ewropayê ve hatiye derxistin û bi vê yekê ve hem hatiye xwestin ku tevgerên diyasporaya kurdî ya Ewropayê were fêmkirin û hem jî terîfa diyasporaya kurdî bê kirin. Di vê tezê de hem rê û rêbajên çendinî hem jî yên çawanî hatine bikaranîn. Ji bo ev kovar baştir were nasîn ji kovara *Nûdemê* gurzên numuneyan hatiye derxistin. Dîsa bi lêgerîna lîteraturê ve terîf û şimûla surgun û diyasporayê hatiye nivîsîn û di vê çarçoveyê de, di kovar *Nûdemê* de şopên surgunê hatiye gerîn.

Encamên girîng yên ji vê xebatê hatiye destistin ev in; bi derxistina kovara *Nûdemê* ve vejandin û pêşxisina zimanê kurdî hatiye xwestin û bi kovargerîyeke standardên dunyayê ve vê armancê hatine şopîn; bi vê kovarê ve gelek nivîskarên kurd hatine gihandin; pirî taybetiyên diyasporaya kurdî bi eşkere di vê kovarê de derketiye meydanê; ev kovar ji hêla surgunan ve hatiye dexistin û ji ber vê yekê ev kovar ji hêla derûnî ve gelek taybetiyên surgunê dihewîne; ev kovar bi ciwarê ku derketiye ve sînordar nine lê ew hem li diyasporaya kurdî hem jî li welatê kurdan hatiye belavkirin.

**Peyvên Anaxtar; *Nûdem*, Diyaspora, Surgun, Kurdî, Edebiyata Nûjen.**

**ÖZET**  
**YÜKSEK LİSANS TEZİ**  
**NÜDEM DERGİSİ VE NÜDEM DERGİSİ'NDEKİ SÜRGÜN İZLERİ**

**Mehmet YONAT**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Murat AKTAŞ**

**2015, 141 Sayfa**

Bu tezin konusu *Nûdem Dergisi*'ni geniş kapsamlı tanıtmak ve bu dergide Kürt sürgün ve diasporasının izlerini aramaktır. Bu tez ile Avrupa'daki Kürt diasporası tarafından çıkarılan bir dergi olan *Nûdem* dergisinin tanıtılması hedeflenmiş ve bu yapılırken hem Avrupa'daki Kürt diasporasının hareketlerinin tanınması hem de Kürt diasporasının tanımının ve kapsamının ortaya çıkarılması amaçlanmıştır. Bu tezde hem nicel hem de nitel yöntemler kullanıldı. *Nûdem Dergisi*'nden çıkarılan örneklem gruplarıyla bu derginin daha iyi ve açık tanıtımı hedeflendi. Yine literatür taramasıyla sürgün ve diaspora terimlerinin tanımı ve kapsamı geniş bir şekilde yapılarak bu bağlamda *Nûdem Dergisi*'nde sürgün ve diaspora izleri arandı.

Bu çalışmadan elde ettiklerimizden önemli olanlar şu şekilde sıralanabilir; *Nûdem Dergisi* ile Kürt dilinin hayatlandırılması ve ilerletilmesi için çaba gösterilmiş; bu amaca ulaşmak için dünya standartlarında bir dergiclik anlayışı benimsenmiş; bu dergi ile bir çok Kürt yazar yetişmiştir; Kürt diasporasının özelliklerinin büyük bir kısmı açık bir şekilde bu dergide görülmüştür, bu dergi sürgün edilmişler tarafından çıkarılmış ve bu sürgün olanların psikolojisini yansıtan yönler içermekte olduğu için sürgünün psikolojik yönleri açık bir şekilde bu derginin içeriğine yansımıştır; bu dergi çıktığı yer ile sınırlı olan bir dergi değildir, aksine hem Kürt diasporasına hem de Kürtlerin ana vatanına yayılan bir dergidir.

**Anahtar Kelimeler:** Nûdem, Diaspora, Sürgün, Kürtçe, Modern Edebiyat.

## ABSTRACT

Master Thesis

### THE JOURNAL OF NÛDEM AND TRACES OF EXILE IN NÛDEM

Mehmet YONAT

Supervisor: Doç. Dr. Murat AKTAŞ

2015, 141 Pages.

This thesis aims to identify the Journal of *Nûdem* comprehensively and to search the marks of Kurdish diaspora and exile. Its aim is to introduce *Nûdem*, which is a journal published by the Kurdish diaspora in Europe and together with this, it aims to introduce both the movements of the Kurdish diaspora in Europe and to identify the Kurdish diaspora. Both qualitative and quantitative approaches were used in this thesis. The journal was introduced clearly and well with the samples taken from it. Furthermore, the terms such as exile and diaspora were identified and their scopes were drawn extensively with literature review and thus the marks of diaspora and exile in *Nûdem* were searched in this context.

The important things we get from this study can be: the journal of *Nûdem* efforted to revive and improve Kurdish language and it tried to do this with a universal type of journal publishing. Many Kurdish writers improved themselves with this journal; the characteristics of Kurdish diaspora can be seen clearly in this journal, it was published by the ones who were exiled and thus it carries the psychology of them. This journal is not restricted with the place that it was published; on the contrary it spread both to the Kurdish diaspora and to the homeland of Kurds.

**Key words:** *Nûdem*, Diaspora, Exile, Kurdish, Modern Literature.

## **SIPASÎ**

Di pêvajoya vê teza min de şewirmendê min Doç. Dr. Murat Aktaş bi rexne û pêşniyariyên xwe ve asoya min fireh kir. Lewma beriya her tiştî ez sipasiyên xwe ji wî re pêşkeş dikim. Dîsa birêz Firat Cewerî di pêvajoya vê xebatê de hem ji hêla destxistina çavkaniyan ve hem jî ji hêla nasîna diyasporaya Kurdî û derûdora *Nûdemê* ve her wext bi sebr pirsên min bersivandin. Ji ber vê yekê ez teşekkurê ji bo wî deyn dizanim. Wek dawî ez ji malbata xwe û hevalên xwe re sipasiyên xwe pêşkeş dikim ku her wext di vê pêvajoyê de piştgirî dan min.

**MUŞ 2015**

**Mehmet Yonat**

## **KURTEBÊJE**

**bnr.** : Binêrin

**ç.** : Çap

**c.** : Cîld

**h.b.** : heman berhem

**h.g.** : heman gotar

**h.m.** : Heman Malper

**hwd.:** Her wekî din

**j.** : Hejmar

**r.** : rûpel

**wer .:** Wergêr

## ÎNDEKSA ŞIKLAN

Şekil 3.4.2.a Rêjeya Nivîsên werger ya di G.N. a Nûdemê de.....	65
Şekil 3.4.2.b. Rêjeya Wergêran ya di G.N. a Nûdemê de.....	68
Şekil 4.5.1.a. Rêjeya nivîsên Firat Cewerî ya di G.N. a Nûdemê de.....	71
Şekil 3.5.1.b. Rêjeya Nivîsên Firat Cewerî ya di G.N.a Nûdemê de.....	72
Şekil 3.2.2. Rêjeya Nivîsên Medenî Ferho di G.N.a Nûdemê de.....	74
Şekil 3.5.3. Rêjeya Nivîsên Sahînê Bekirê Soreklî ya di G.N.a Nûdemê de .....	76
Şekil 3.5.7. Rêjeya Nivîsên Mehmet Uzun ya di G.N. a Nûdemê de.....	80
Şekil 3.5.8. Rêjeya Nivîsên Rojen Barnas a di G.N. a Nûdemê de .....	81

**TABLO**

Tablo 1.2.2. Berawirdkirina Pênaseyên Berê û yên Nû yên Diyasporayê ..... 19

Tablo 2 Gurza Numuneyan ya *Nûdemê* ..... 109

## DESTPÊK

Di vê tezê de em ê li ser kovara *Nûdemê* bixebitin. Kovara *Nûdemê* di navbera salên 1992 û 2001ê de, her sal çar hejmar, bi temamî 40 hejmar û ji bo deh salan bê navber ji hêla nivîskar Firat Cewerî ve li Swêdê hatiye derxistin. Ev kovar, kovareke edebî, hunerî û çandî ye. Armanca vê kovarê di hejmara yekem a vê kovarê û di hin hejmarên din ên vê kovarê de hatiye zimên. Bi çend gotinan, em dikarin armanca vê kovarê derxin holê. “Armanca wê ya sereke ew e ku di rêya gel de be, ji bo vejandina zimanê kurdî û ji bo pêkanîna edebiyata kurdî ya nûjen bibe bingeh.”<sup>1</sup> Ji ber ku kurd ji hêla pênc dewletên cuda ve tên birêvebirin, kurdên parçeyekê pirî caran ji edebiyat û tevgerên hunerî yên parçeyên din bê hay dimînin. Ji ber vê rewşa sosyo-polîtîk tevgerên edebî yên diasporayê ji bo hevnasîna van parçeyan gelek bi kêr tê. Di vê çarçoveyê de kovara *Nûdemê* ji bo hevnasîna parçeyan gelek bi kêr hatiye. Jixwe *Nûdem* vê mijarê wek armanceke bingehîn ji xwe re girtiye. “Hevkarên kovarê hemû parçeyên Kurdistanê ne û bi vî awayî xwendekarên kovarê dê bi hêsanî bikaribin der heqê edebiyata kurdên Iraqê, Îranê, Sûriyê, Sovyetê û Ewropayê de nûçeyên nû bibihîzin û kovar dê bi vî awayî di navbera kurdên parçekirî de bibe pireya hevdunasîn û hevdubihîstinê.”<sup>2</sup>

Kovara *Nûdemê* bi îddîayeke mezin derketiye meydanê. Wê xwestiye edebiyatek di asta edebiyata dunyayê de derxe meydanê û bibe ekoleke wisa ku di paşerojê de navên nivîskarên vê êkolê di rex navên nivîskarên dunyayê yên navdar de bên dîtin. Celebnivîsên vê kovara hunerî, edebî û çandî bi kurtî di hejmara yekem de wuha hatiye diyarkirin; “çîrok, helbest, parçeroman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, werger, edebiyata dunyayê ya modern û klasîk, klasîkên kurdî, xelatên navneteweyî, sînema, tiyatro, nivîsên li ser edebiyat, huner û kulturê, wêne, karîkator û hwd.”<sup>3</sup> Dîsa hatiye diyarkirin, bêyî ku ji çarçoveya kovarê dûr bikevin hin celebnivîsên din jî li *Nûdemê* dê bên zêdekirin an jê bên kêmkirin.

Profesyonelî û navnetewetî taybetiyên bingehîn bû ku kovara *Nûdemê* bala xwe pir dida ser. *Nûdem* di hejmara xwe ya duyem de wiha vedigot; “em ê bi pîvanên navneteweyî, bi estefîk, bi profesyonelî û ya herî girîng jî bi dengê Kurdistanî

---

<sup>1</sup> Firat Cewerî, “Çend Gotin”, *Nûdem*, j.1 (Bihar 1992), r.3

<sup>2</sup> Cewerî, h.g, r.3

<sup>3</sup> Cewerî, h.g, r.4

derkevin.”<sup>4</sup> Dirûşmeya *Nûdemê* jî ev bû; “gelî nivîskar, hunermend, ronakbîr û xwendevanên kurd yên hêja! Werin em mil bidin milên hev, em bi hev re civata xwe ya ku bermaya gelek medeniyetan e bigihînin cihana nû!”<sup>5</sup>

Wek me li jor jî vegot *Nûdem* li Swêdê ango li surgunê hatiye derxistin. Xwedî û berpîrsiyarê giştî yê kovarê Firat Cewerî, kurdekî surgunbûyî ye. Dema em dîroka çapemeniya kurdî dinêrin em dîroka çapemeniyeke surgunbûyî dibînin. Ji rojnameya kurdî ya ewil *Kurdistan* ku li Qahîrê ji hêla Mîqdad Mîdhed Bedirxan hatibû derxistin bigre, heta salên li pey meşrûtiyeta duyem a Osmaniyan û Herba Cihanê ya Yekemîn kovar û rojnameyên li Stenbolê derketine, dîsa ji *Hawara* Celadet Elî Bedirxan heta kovar û rojnameyên di nîveka dawî ya sedsala bîstan de li Ewropayê derketine, çapemeniya kurdî pîrî caran li surgunan jiyaye. Ji ber vê yekê surgun, heta roja îro bûye parçeyek ji dîroka çapemeniya kurdî. Her qonaxek ji qonaxên surgunê yên çapemeniya kurdî ji yên pey xwe re hin tiştan hiştine û bandorê li ser qonaxên pey xwe hiştine. Ev bandor hin caran zêde û hin caran jî kêmbûne.

Kovara *Nûdemê* jî di bin bandora hin qonaxên çapemeniya kurdî de maye. Dema em kovara *Nûdemê* dinêrin em herî zêde bandora kovara *Hawarê* dibînin ku ev kovar di sala 1932an de ji hêla Celadet Elî Bedirxan ve li Şamê hatibû derxistin. Eger em diyardeyên vê bandorê binêrin em ê pêşî li rastê alfabeê bîn. Celadet Bedirxan alfabeya latînî ya kurdî ku bixwe ev alfabe çê kiribû, di kovara xwe *Hawarê* de bikar anîbû. Ji ber ku kurdên Ewropayê bi taybetî kurdên Turkiyê li Ewropayê û li Turkiyê fêrî alfabeya latînî bibûn, di kovar û rojnameyên xwe de vê alfabeê bikar dihanîn. Lê di alfabeya latînî ya kurdî de standardek tunebû. Ji bo vê pîrsgirêkê çareser bikin, piraniya kurdên diasporayê li ser wê alfabeê hemfikir bûn ku Celadet Bedirxan çê kiribû û di *Hawarê* de bikar anîbû. *Nûdem* jî kovarek e ku di standardîzasyona alfabeya kurdî ya latînî de bi bandor bûye. Diyardeya duyem a ku *Nûdemê* di bin bandora *Hawarê* de hiştibû ew girîngî bû ku *Hawar* dabû zimanê kurdî. Ji ber ku *Nûdem* jî girîngî dida zimên, di navbera *Hawar* û *Nûdemê* de têkiliyeke wisa çêbibû ku *Nûdem* xwe wek dewam û xwîşka *Hawarê* didît. Her du kovar jî bikaranîna zimanê zikmakî wek şertê sereke yê ji bo jiyana miletek didîtin. Di van kovran de ji rewşenbîr û xwendevanên kurd her wext hatiye xwastin ku bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin lê ne bi zimanê

<sup>4</sup> Firat Cewerî, “Çend Gotin”, *Nûdem*, j.2 (Havîn 1992), r.4

<sup>5</sup> Cewerî, h.g, r.4

serdestan. Di civîn û konferansên xwe de û di hemû jiyana xwe ya civakî de kurdî bi kar bînin da ku kurdî ji holê ranebe û kurdiyeke bi têra jiyaneke modern dike, derkeve meydanê.

Di vê destpêkê de eger em behsa têkiliya *Nûdemê* û siyasetê nekin ew ê mijar kêm bimîne. Her wekê tete zanîn taybetiyeke civatên diyasporayê ya bingehîn, parçebûyîna fikrî ya navxweyî ye. Yanê, bi gelemperî kesên li diyasporayê li ser armanceke hevbeş in, lê fikrên wan ên der barê rê û rêbazê de wisa cuda ne ku pirî caran dikevin nav gengeşiyên dijwar. *Nûdem* jî vê cudahiya fikran ferq kiriye û ji xwe re prensîbek ava kiriye da ku ji van gengeşiyên dûr bimîne û di nav fikr û ramanên cuda de pireyek û danûsitandinek derxe holê. Dema em kovara *Nûdemê* dinêrin em dibînin ku wek prensîb *Nûdem* her wext xwestiye ji siyasetê dûr û ji hemû rêxistin û tevgerên kurdî re di heman nêzikahîyê de be. Ev prensîb hin caran rexneyên gelek giran sitandiyê. Di vê tevgera xwe de *Nûdem* çiqas serkeftî bûye ev jî mijara gengeşiyê ye, lê wek prensîbeke bingehîn a vê kovarê behskirina wê, dê ji bo nasîna *Nûdemê* bi kêr were.

Piştî ku me li jor bi kurtasî behsa *Nûdemê* kir em vê carê jî behsa vê xebata xwe bikin. Armanca vê xebatê çi ye û çima em vê xebatê amade dikin? Armanca vê xebatê; nasîna kovara *Nûdemê* û di vê kovarê de li şopên surgun û diyasporayê gerîn e. Bi vî awayî, em ê bi vê xebatê, li ser kovara *Nûdemê* hûr bibin û bi vê jî bandora diyasporayê ya li ser geşedana edebiyata modern a kurdî fêhm bikin. Girîngiya vê xebatê û bersiva çima ez vê xebatê dikim jî ev e: Bandora edebiyata surgunê di geşbûna edebiyata dunyayê de eşkere ye. Surgun çawa bondorê li edebiyata dunyayê bi gelemperî kiriye her wisa jî li edebiyata gelan jî kiriye, bi taybetî edebiyatên kêmaryan ji surgunê gelek sûd wergirtine û pirî caran bi xêra surgunê bi coş geş bûne. Dîsa tê zanîn ku dilê edebiyat û zimên di kovar û rojnameyan de davêje. Bi taybetî milletên ku ne xwediyê dewlet in û saziyên wan ên fermî ji bo perwerdeya bi zimanê zikmakî nînin, çapemenî ji bo wan jiyana edebiyat û zimanê nivîskî ye. Di vê çarçoveyê de dema em rewşa çapemenî, edebiyat û standardîzasyona alfabe û zimanê nivîskî ya kurdî dinêrin, em dibînin ku bandora surgunê di wan de bi awayekî mezin xwe dide ber çavan. Em dikarin bêjin ku zimanê nivîskî û edebiyata nûjen a kurdî bi taybetî jî ya kurmanciya jor li surgunê ango li diyasporayê şêkil girtiye. Bi vê xebatê em ê li şopên surgun û diyasporayê yên di kovareke surgunê de bigerin û em ê hem bikaribin têkiliya surgun û edebiyata nûjen a kurdî fêhm bikin, hem kovara *Nûdemê* nas bikin, hem qonaxek an

ekoleke zimanê kurdî ku li Swêdê pêşkетиye fêm bikin û hem jî bandora surgun û diasporayê, di hevnasîna entelektuelên kurdan a bi hev re fêm bikin.

Ji bo fêmkirina girîngiya vê xebatê eger em hinek behsa şert û mercên derûdora kovara *Nûdemê* bikin dê mijar zelaltir bibe. Wek me li jor jî got çapemeniya kurdî pirî caran li surgunê geş bûye. Ewil di sala 1989an de li paytexta Misirê, li Qahîreyê ku ew dem bajarekî Osmaniyan bû, rojnameya ewil a kurdî bi navê *Kurdistanê* tê derxistin. Ev kovar paşê jiyana xwe ya çapemeniyê li Ewropayê berdewam dike û li wir anglo li surgunê jiyana xwe bi dawî tîne. Qonaxa duyem a çapemeniya kurdî Stenbol e. Piştî îlankirina meşrûtiyeta duyem a sala 1908an çapemeniya kurdî li paytexta Osmaniyan geş dibe. Hin komeleyên kurdan çî yên xwendekaran çî jî yên ji hêla malmezînan kurdan ve tîn damezirandin, hin rojname û kovar derdixin. Ev geşebûn bi derketina herba cihanê ya yekemîn, radiweste û piştî herbê careke din dîsa dewam dike. Piştî herbê dîsa bi rêya komeleyan hin rojname û kovar tîn derxistin. Lê rojname û kovarên ku dertên ne tenê ji hêla komeleyan ve hin caran ji hêla şexsan ve jî tîn derxistin. Ev rewş bi avabûna Komara Turkiyê re bi temamî ji bo salên dirêj radiweste. Heta salên 1990î pirtûkên ku li parçeya Tirkiyê dertên ji ber qedexeya ziman zêde nîne. Kovar û rojnameyên ku di vê navberê de dertên jî dîsa gelek kêr û temenkurt in. Lê piştî sala 1991î ku qedexeya li ser zimanê kurdî li Tirkiyê nîsbeten radibe, dest bi weşana hin kovar û rojnameyan tê kirin. Wek qonaxeke din em li paytexta Suriyê di sala 1932an de rastî qonaxa *Hawarê* tîn. Di vê qonaxê de alfabeya latînî ya kurdî hatiye afirandin û bikaranîn, û gelek giringiyeke mezin ji bo zimanê kurdî hatiye dayîn. Di dema dewleta Sovyetê de tevgerên çapemenî û edebî bi giranî li Erîvanê pêk hatine, lê Erîvan di dawîyê de bajarekî ermenan e û dîsa em dikarin bêjin li derveyê welêt ev terger pêk hatine. Li Bexdayê jî hin tevgerên çapemeniya kurdî pêk hatine. Ji bo perça Iraqê rewş hinek cuda bûye û azadiya siyasî ya nîsbî û di dibistanan de perwerdehiya bi zimanê kurdî li ser weşanên kurdî bandoreke mezin pêk anîye.

Qonaxa Ewropayê ew qonax e ku herî zêde nêzikî îro ye û bandora herî zêde li ser îro hiştiye. Qonaxa Ewropayê em dikarin di sê gavan de binirxînin. Gava yekem salên 1960î ye ku kurdên ji Turkiyê ji bo debara xwe bikin wek xebatkar çûne Ewropayê. Di vê gavê de, tevgerên mezin ên rewşenbîrî çiqas çê nebin jî bi temamî jî ji tevgeran xalî nînin. Hin kovarên kurdî di vê demê de hatine derxistin. Gava duyem; salên 1970yî ne. Piştî cûntaya leşkerî ya sala 1971î ya li Turkiyê, çalakvanên kurd ên li Turkiyê reviyên

Ewropayê û li wir hin kovar û rojname derxistin. Lê ji ber ku ev cûntaya leşkerî zêde nedomiya hin ji wan kesan vejeriyar welêt, hin ji wan di quncên xwe de man û hin ji wan jî tevgerên xwe berdewam kirin. Esas tevgerên mezin ên rewşenbîrî di gava sêyem de hat meydanê ku ev gav jî piştî cûntaya leşkerî ya 1980yê bû. Piştî vê bûyerê bi hezaran kes ji Turkiyê revîn û hatin li welatîna Ewropayê wek penaber bi cih bûn. Ew kes kesên aktîvîst, siyasîmedar û kesên xwenda bûn. Ji bilî bûyera cûntaya leşkerî ya 1980yê şoreşa Îslamî ya Îranê ya di sala 1978an û rewşa xirab a kurdên Iraqê bû sebeb ku bi hezaran kes ji parçeyên din ên welêt derkevin û li Ewropayê bi cih bibin. Ev rewş hem ji bo pêkhatina diyasporayêke bihêz a kurdan li Ewropayê hem jî ji bo hevnasîna rewşenbîrên kurdan ên parçeyên welêt bi kêr hat.

Ew welatên Ewropayê yê ku kurdan wek penaber qebûl kirine ji bo mafên penaberan, qanûnên wan curbicur bûn. Hin ji wan gelek mafên baş ji bo çand û zimanê hindeikeyan didan, lê hinekan jî giraniya xwe didan li ser entegrasyon û helandîna wan kêmaryan. Di nava wan welatên Ewropayê de dewleta ku ji hêla mafan ve herî pêşketî Swêd bû. Bi derfetên xwe yê der barê azadiya çandî û nasnameyî ve Swêd ji bo kurdan bû navendeke cezbê. Tevgerên çandî û folklorî wisa li vir çê bûn ku xêncî Kurdîstana Iraqê ku qismen serbixwe bû, li tu welatek û tu parçên Kurdistanê tevgerêke bi vî rengî pêk nehat. Her bajarê Swêdê yê ku kurd lê bi cih bûbûn komeleyên çandî vekirin û ew komele bûn cihê hevdîtin û aktîvîteyên wan kurdan. Paşê, “di sala 1982an de li serbajarê Swêdê, li Stockholmê federasyonêk ava bû û çî bigire hemû komeleyên kurdan ên li Swêdê di bin sîwana federasyonê de hatin bal hev. Ev kurdên ha, ji hemû beşên Kurdistanê bûn û loma ew bi devok û zaravayên cihê dipeyivîn. Berî avakirina federasyonê û bi xurtî jî bi avakirina federasyonê re zimanê kurdî li ba kurdan bû zimanê siyasî, zimanê sohbet û munaqaşeyan, zimanê xwendin û nivîsînê û federasyon dest bi derxistina kovareke bi navê *Berbangê* ku xwerû bi kurdî ye kir.”<sup>6</sup> Beriya ku kurd werin Ewropayê, bi gelemperî kurd zimanê serdestan bi kar dihanîn. Bi pêvajoya diyasporayê ve ziman hêdî hêdî guherî û kurdî giraniya xwe nîşan da. Li Swêdê pêşî gelek kovar û rojnameyên kurdî derdiketin, lê paşê ji bêçaretîyê ev hejmar ket û yê man jî bi berdewamî û bi kurdî jiyana xwe domandin. Di vê pêvajoyê de bi sedan pirtûkên kurdî hatine çapkirin û bi dehan nivîskarên kurd gihiştin û ev tevger û nivîskar îro di damezirandina edebiyata kurdî û standardîzasyonê zimanê nivîskî ya kurdî de

---

<sup>6</sup> Firat Cewerî, “Surgun û Edebiyata Kurdî”, *Nûdem*, j.33 (Bihar 2000), r.103

xwediyê bandoreke mezin in. Ji ber vê geşedana edebiyat û zimanê kurdî li Swêdê di dîroka zimanê kurdî de ji bo vê qonaxê gotina “Ekola Swêdê” tê bikaranîn.

Mijara surgunê bi gelek zanistên civakî re têkildar e. Wek mînak bi derûnnasî, civaknasî, medya, edebiyat û hwd. Ji ber vê yekê ev teza me jî hinek rengê înterdîsîplînerî girtiye. Lê bi vê taybetiya xwe re, ev dîsîplîna me dê krîterên edebiyatê yan jî metodên derûnnasiyê bi kar neyne. Ji ber ku di xebata me de nasîna kovara *Nûdemê* tê kirin ev xebat bi medyayê re têkildar e û ji ber ku rewşên sosyo-polîtîk ên ku li ser surgunê û li ser pêvajoya wê bi bandor tînin nîrxandin, ev xebat bi civaknasiyê re têkildar e. Ango em dikarin bêjin ev xebata me xebateke dîsîplîna medyaya civaknasiyê ye.

Ji bo vê tezê wek metodolojî me hem metodên çendanî hem jî yê çawaniyê bi kar anîn. Metoda me ya çendanîyê wiha bû; me ji hemû hejmarên kovara *Nûdemê* gurzek numûneyan (sample group) stand û me ew gurza numûneyan ji bo nasîna kovarê di gelek cihên curbicur de bi kar anî. Mesela, me vê ji bo nasîna nivîskaran, nasîna kovarê, nasîna cureyên nivîsan ên di kovarê de, îstatîstîkên wergerê û hwd. bi kar anîn. Ji bo metodên çawaniyê jî me li lîteraturê nêrî û ji çavkaniyên bi mijara me re têkildar in, wek çavkanî bi kar anî. Dîsa xebatên pirtûkxaneyan jî di nav metodên me de bûn.

Me di beşa yekem de, bi kûrahî kovara *Nûdemê* da nasîn. Di serî de armanca *Nûdemê* û paşê guherînên şiklî yê di nav demê de yê di vê kovarê de hate ziman. Dîsa di vê beşê de em li ser dibistana *Nûdemê* anga di *Nûdemê* de tevgerên perwerdeyê sekinîn. Mijareke din a sereke di vê beşa yekem de abora *Nûdemê* ye. Abora kovarekê dê ji bo nasîna kovarê gelek kêrhatî be. Ji ber ku mijareke sereke û armanca bingehîn a *Nûdemê* ziman û standardîzasyona wê bû, me di vê beşê de behsa vê mijarê jî ji bo nasîna *Nûdemê* kêrhatî dît. *Nûdem* ji ber ku ne tenê kovarek e di heman demê de navê çapxaneyek, kafeyek û kovareke din a bi navê *Nûdem Werger* e, me behsa van jî kêrhatî dît û di vê beşê de me behsa wan jî kir. Wek dawî me di vê beşê de behsa tîkiliya kovara *Nûdemê* û kovara *Hawarê* kir. Lewra di navbera van herdu kovaran de tîkiliyeke gelek zexim heye. Fêmkirina vê tîkiliyê ji bo nasîna Kovara *Nûdemê* ciheke heyatî digire.

Di beşa duyem de, ji bo em *Nûdemê* û çapemeniya kurdî ya surgunê baştir fêmkirin, em li ser qonaxên çapemeniya kurdî yek bi yek bi kurtasî sekinîne. Dîsa ji ber ku

kovara *Nûdemê* kovareke diyasporayê ye, naskirina diyasporaya kurdan a Ewropayê hem ji bo nasîna *Nûdemê* hem jî ji bo nasîna diyasporayê wê bi kêr were. Ji bo vê yekê, me bi gelemperî behsa diyasporaya kurdan û bi taybetî jî behsa hin kurdên li dewletên Ewropayê yên ji bo diyasporaya kurdî muhîm in kiriye; wek Swêd, Almanya û Fransa.

Beşa sêyem jî dîsa parçeyek ji wan parçeyan e ku armanca wê danasîna kovara *Nûdemê* ye. Di vê beşê de, me nêzîkî deh nivîskarên kovara *Nûdemê* da nasîn û cihên wan di kovara *Nûdemê* de nîşan dan. Dîsa me behsa ziman, nivîskar û cureyên nivîsên *Nûdemê* kirin. Di dawiyê de ji ber ku di kovara *Nûdemê* de werger ciheke gelek muhîm digire, me behsa werger û wergervaniyê kir û di *Nûdemê* de cihê wergerê nîşan da.

Me beşa çarem ji bo pênaseya surgun û diyasporayê veqetand. Di vê beşê de, ji ber ku bingeha vê teza me li gerîna şopên surgun û diyasporayê di kovara *Nûdemê* de ne, me van her du têgehên bi berfirehî da nasîn.

Beşa pêncem ku beşa dawî ye wek beşa bingehîn a vê tezê ye ku li ser şopên surgun û diyasporayê di kovara *Nûdemê* de disekine. Me di vê derê de, li gor prensîbên ku me di beşa çarem de diyar kirine, li pey şopên surgunê ketine.

**BEŞA YEKEM:**  
**PÊNASEYA SURGUN Û DIYASPORAYÊ**

**1.1.SURGUN**

Em ê bi kurahî li ser surgun çî ye, aliyên wê yên neyînî û erênî, têkiliya surgun û neteweperweriyê, surgun û xesûdî û encamên surgunê bisekinin.

**1.1.1. Surgun Çî ye?**

Di ferhengên de surgun wiha derbas dibe; ji hêla otorîteyan ve yekî ji welatê wê/î eslî dîrxistin; hal an rastiya ji cih û war kirinê; kesê/a ku ji bo welatê xwe yê eslî hatiye qedexekirin; ji bo demeke dirêj ji hêla zordariyekê an ji ber rewşê qetîna ji welatê an dîrketina ji malê; kesê/a ku ji hêla zordariya rewşê an ji dil welatê terk kiriye.<sup>7</sup> Surgun; ji zemanê berê heta îro di nav mirovahiyê de hebûye. Ji surguna demên berê bigre heta sedsala demên modern ev bêje di nav mirovahiyê de jîndar bûye. Di nav herîkîna demê de, terîfa vê bêjeyê li gor zeman û rewşê gelek caran fireh û teng bûye û gihîştîye heta îro. Ji ber vê taybetiya wê ya nediyarbûyî, terîfeke vê bêjeyê ya mîsoger tune ye.

Dîsa, di eslê xwe de bi zerb û zorê ji cih û warê xwe bûyîn, taybetiya bingehîn ya surgunê ye ku sedem û encamên vê zordariyê bi siyaseta, civak û edebiyatê re têkildar e. Ev jî ji bo terîfkirina vê bêjeyê astengeke din e. Lê bi terîfên hin nivîskaran ve û vegotina taybetiyên gelenper yên vê bêjeyê ve, em ê ji bo vê bêjeyê terîfekê bigerin.

Gelek nivîskar ji bo tarîfa surgunê terîfine kirine û yek ji wan terîfan ya Jo-Marie Classen e:

*“Surgun ew tişt e ku qehreman êdî li welatê ku hatiye dunyayê najî yan nikare bijî. Ev jiyîna li derveyê welatê dibe ku bi dil û bi biryareke zanîn yan jî bê dil bi zorê be. Hin caran, surgun dibe ku di encama hin şertan de çêbibe wek xebata ji bo aborê li derveyê welatê. Surgunên wek vê ezabeke zêde li qehreman nade kişandin. Lê dibe ku surgun bi darê zorê ve jî hatibe kirin. Ev cure surgun, bigelempêrî di encama lihevnekirina navbera dewletê û surgunî<sup>8</sup> de pêk tê. Pîrî caran ev cure surgun, ew kesan surgun dike ku bandora wan li ser şert û şertan nîne û hin caran jî ev cure surgun ew kesan dixê ku ew jî siyasatvan in ku hebûna wan ji bo raqîbên wan tehlûke ye.”<sup>9</sup>*

<sup>7</sup> <http://dictionary.reference.com/browse/exile> (05.05.2015)

<sup>8</sup> Ez ê di vê nivîsê de bêjeya ‘surgun’ê hem ji bo bûyera surgunê hem jî ji bo kesê/a surgunbûyî bikar bînim.

<sup>9</sup> Boldor, Alexandru, **Exile As Severance**, Teza Doktorayê, Louisiana State University, r.3 ([http://etd.lsu.edu/docs/available/etd-07122005-112749/unrestricted/Boldor\\_dis.pdf](http://etd.lsu.edu/docs/available/etd-07122005-112749/unrestricted/Boldor_dis.pdf)) (10.05.2015)

Di vê vegotinê de, em rastê du taybetiyên bingehîn yên surgunê tên. Yek ji wan, ne bi temamî be jî qismêke mezin a surgunê di encama zerb û zorê de pêk tên. Yanê, surgun di encama zerb û zorê, kesek yan hin kesan ji cihê wan derdixe û dişîne cihekî din. Taybetiya duyem ku pirî caran li ser vê qismê tê sekinandin; surgun ji ber sedemên siyasî pêk tên. Kes an grubek kesan bi rêvebiriyên welatên xwe re ji hêla siyasî ve hev nakin û di encama vê de hêza dewletê ango hêza hakim e, ew ji cihên wan dikin. Her çiqas terîfa surgunê pir fireh be jî van herdu taybetiyên surgunê, yanê di encama zordariyê de û ji ber sedemên siyasî bûyîn, du taybetiyên sereke yên surgunê nin û bi mijara me re dîrekt têkildar in.

Surgun hem dibe ku bi tenê hem jî bi civatkî bibe. Dema em li dîroka însaniyetê û milletan dinêrin, em gelek caran rastê surgunên civatkî tên. Ev surgun ji ber birçîtî, herb, tiştine siyasî, hwd. dibin û ji ber van sedeman civatekê yan milletekî yan komeke din ji cihê ku dijîn ango ji welatê xwe mecbûr dimînin yan xwe mecbûr hîs dikin û koçê cihekî din dikin. Wek surguna civatkî, ku me li jor behsa wê kir, surguna şexsî jî heye. Şexs pirî cara ji ber sedemên siyasî û yên din, mecbûr dimînin an jî xwe mecbûr hîs dikin û koç dikin an tên koçkirin. Wek îlawe li ser van herdu cure surgunan, em dikarin behsa surguna ruhî jî bikin ku ev surgun ne ji hêla mekanê ve cihguherînek e, lê ev xwe di welatê xwe de li surgunê hîskirin e. Shakespeare ji bo vê dibêje; eger azadî li derve be, surgun li cem we ye. Di nav van cureyên bingehîn ên surgunê de, em ê li ser cura duwem bisekinin, yanê em ê behsa surguna tenê dibe û tenê ye bikin.

Ji bo em baştir hakimê terîfa surgunê bibin, nêrîna dîroka surgunê dê kêr bê. Me ji hêla hêzek ve cih û warê xwe bûyînê, wek terîfa surgunê vegotibû ku ev terîf îmakanê dide ku em bigihêjên vê encamê; ji bo bûyera surgunê pêk were, pêdivî ji civateke bi rêk û pêk ango dewletek yan saziyeke civakî heye. Bi gotineke din ve, hebûneke civakî ya tekûz û sîstema qanûnan ji bo vê fenomenê pêdiviyeye bingehîn e.<sup>10</sup> Em dema dewletine berê dinêrin, ji van dewletan yên herî berê jî wek riyeye cezayê serî li surgunê dane. Ji ber ku dewletine berê basît bûne û saziyên wan yên civakî tekûz nebûne, cezakirinên wan jî li gor vê rewşê şikl hildane. Mesela ji ber ku girtîgeh tunebûne ew dema yekî/ê ceza bikirana, yan wî/ê dikuştin yan jî surgun dikirin.<sup>11</sup>

---

<sup>10</sup> Boldar, r.12

<sup>11</sup> Boldar, r.12

Agahiyên me yên derbarê dîrokê de ji ber ku bi nivîsan ve sînorkirî ye û ji ber ku zanista dîrokê bi nivîsê ve dest bi xebatên xwe dîke, em ji bo dîroka surgunê tenê dikarin tekstên nivîskî bikar bînin. Lîsta dîroka surgunê ji Misiriyên berê ve dest bi seruvana xwe dîke û Romayî wan dişopînin. Di qanûnên Romayîyan de gelek zagonên bi surgunê re eleqedar henin. Mesela, surgun di qanûna wan de wek hundakirina hemwelaftiyê (civitas amissio) tê terfî kirin. Derbarê surgunê de, di qanûna Romayîyan de gelek kiryar hene û hin ji wan kiryaran pir balkêş in. Yek ji wan kiryarên balkêş “Aqua et igni interdictio” ye ku wek cezayê nerm tête dayîn. Ev ceza, suçdar ji bikaranîna avê û agirê mehrûm dîke ku ev tişt sembolen saziya dewletê ne.<sup>12</sup> Di mesîhîtiyê de û di baweriyên din de jî em şopên surgunê çî ji bo înzîvayê çî jî ji bo cezayê dibînin.

Di pêvajoya dîrokê de em rastê gelek nivîskaran tên ku ew berhemên xwe yên bêhempa di surgunê de nivîsîne. Hin ji wan tenê ji bo baştir binivîsin, bi dil çûne surgunê û hinek ji wan jî di hundirê xwe de surgunê jiyane. Wek mînak Montaigne cureke “*monarşîzmê*” yan “*surguna hundirî*” hilbijart û vê yekê bi dûrmayîna siyaset û aktîvîteyên sosyal ve pêk anî. Lîsta van mînan bi Rousseau û Voltaire ve berdewam dîke. Hugo di pêvajoya hejdeh sal surguna xwe de hin helbestên xwe yên navdartirîn nivîsiye. James Joyce ji bo xwe surgunê hilbijart ji bo xwe ji stresa entelektuelî û hestiyarî dûr bixe.<sup>13</sup> Bi gotineke din ve surgun, çî bi dil be, çî bi darê zorê, çî ji hêla derûnî ve xwe surgunê hîskirin be, çî jî ji hêla erdnigariyê ve cih guhertin be; surgun, surgun e. Lê em vê jî ji bo ferqa navbera surgunên bidil û bêdil de bêjin ku her du jî hîsa tenêtiyê û biyanîtiyê dijîn lê surgunên bidil ji qedexeyên eşk yên surgunên bêdil muzdarîb nînin.<sup>14</sup>

Demên modern de, terfî û mahiyeta surgunê hinekî hatiye guhertin. Surgun, di demên modern de ne tenê bi kesan ve sînordar bûye, êdî ji ber şer, xela û nexweşiyên surgun bi girseyî derdikeve pêşiya me. Ji bo vê yekê Edward Said dibêje;

*“Pêşiya demên modern surgun cezayekî xeternak bû; çimkî surgun ew jiyana bû ku; bêarmanc, dûrmayîna ji malbatê û ji cihên aşîna, xwe hîskirina li mala xwe, çênekirina aşî di navbera xwe û cihê nû de, nêrîneke bi hesret û eş li paşerojê û bi hêvîşikestî li pêşerojê û mayîna derveyê civatê. Di sedsala 20. de surgun ne wek ew tişt bû ku di dema Romayî de dihate kirin ku wan digirt kesine surgunê mezrayeke*

<sup>12</sup> Boldar. r.13

<sup>13</sup> Boldar, 17-18

<sup>14</sup> Edward W, Said, **Kiş Ruhü**, Metis Yayıncılık, Çapa Duyem, İstanbul: Mayıs, 2006, r36

*Behra Reş dikirin, lê sedsala 20. de surgun, civat an gel ji ber şer, xela, nexweşî, ji cihê dijîn koçkirina ji bo cihên nû bû.*"<sup>15</sup>

Me li jor jî îfade kir di demên modern de mahiyeta surgunê gelek fireh bûye. Esas, nuha hin cureyên jicîhêxwebûyîne hene ku firehiya wan cureyan kêr zêde hundirê vebêja surgunê tije dikan. Edward Said ji bo surgunên demên modern dibêje, "Di navbera surgunên berê û yê demên modern de ji hêla mezinahiyê ve ferqek heye. Herbên modern, emperyalîzm û rêvebirên totalîter û xirsên wan yê niv-teolojîk in ku vê ferqê derxistine holê."<sup>16</sup> Paul Tabori di demên modern de lîsta kesên surgunê wiha rêz dike; "Penaber, kolonîst, penaberên demdemî (transmigrant), kesên ji civatê hatin avêtin, mitrip, rêwiyên dunyayê digerin, mêr û jinên ji civatê hatine avêtin, entelektuelên koçber, pey herba cihanê ya duwem kesên "bê cih û war" manin, yahûdiyên li surgunê, yahûdiyên derwêş, surgunên din..."<sup>17</sup>

### 1.1.2 Aliyên Neyînî yê Surgunê

Surgun di derûniyeta merivan de gelek bibandor e. Ji ber ku ev jî faktoreke ku bi surgunê re têkildar e, divê di vir de behsa hêla surgunê ya derûnî jî bê kirin. Surgun; bûyere herî dijwar e ji bûyerên di jiyana însanan de tîr serê wan. Kesê/a surgun bûye di surgunê de rastê gelek tiştên nû tê û ev tiştine pîrî caran wî/ê dêşîne, zehmetiyan dide wî/ê. Dîsa surgun bitemamî zehmetiyan encam nade, lê surgun bi xwe re gelek tiştine bikêr jî tîne.

Surgun, dema surgun dibê xwe di tenêtiyeke xeternak de dibîne û ji hêla psîkolojîk ve dikeve nav halên rûhî yê curbicur. Li ser van halên ruhî pîr tiştine hatine gotin û ev halên rûhî ji hêla gelek nivîskaran ve hatine vegotin. Gelo surgun qetîneke bêhêvî ji welêt û ji kokên xwe ye yan rêwitiyeke bizewk a dunyake din e? Dîsa gelo surgun di navbera du welatan de mayîn e; welatê nû û welatê berê? Ji bo vê Saîd dibêje;

*"Ew gotinên ji bo surgunê tê gotin; surgun bi temamî ji welêt qetîn, tecerrut, veqetîneke bêhêvî ye, ev gotin bitemamî çewt in. Xwezî vê qetîna kûr pêk bihata. Ji ber ku ew gav dê hun ê bifikirîban; ew tiştine ku we li paşîya xwe hîştine dê êdî nehatiban fikirîn û vegeerîn û ev ê jî ji bo we bibûya teseliyek. Rastî ev e ku ji bo kesên surgun bûye, zehmetî ne tenê ji hêlînê dûrketin e, lê zehmetî jiyaneke e ku te bi ew tiştine li paşî re têkildar dike û dîsa temaseke e ku bi îmkanên jiyana nûjen ve te her wext bi wan cihan re têkildar dike ku te di paşîya xwe de hîştîye."*<sup>18</sup>

<sup>15</sup> Edward W. Said, **Entelektüel (Sürgün, Marjinal, Yabancı)**, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2011, r.53, 54

<sup>16</sup> Edward W. Said, **Kış Ruhu**, r.29

<sup>17</sup> Boldar, r.26-29

<sup>18</sup> Said, r.54, 55

Nivîskar Ali Biçer dibêje, sugun pirî caran labîrentek e ku bi windabûneke reş ve diqede.<sup>19</sup> Surgun wek venandina kemînek e. Kê ji wê kemînê xilas bibe, ew ê aliyên surgunê yên erînî dest bixwe. Bi taybetî entellektuelên li surgunê rastê vê kemînê tên. Li dûr ciheke ku nayê zanîn ji hêla huner û entellektueliyê ve kirina çalakiyên baş ne ewqas rehet e. Ji bo jiyaneke wiha aktîf divê ew tiştên pêdivî pê henin hemû werên destxisitîn. Pey vê destxistina tiştên nû vê carê divê bi tiştên berê re ev tiştên nû werên mezckirin (Dema ev tiştên ber hev hin caran zêdehî çêdibin. Ew gav jî hundakirina zêdehiya mecbûrî ye).<sup>20</sup> Vê tekiliya di navbera do û îro de pirî caran surgunî dixê nava halên rûhî yên curbicur. Surgun bi nirxên berê ve ew tiştên nû dinirxîne û hema bêje her wext pozberiyekê di navbera berê û nuha de dertê pêşiya wî/ê. Wexteke dirêj surgun, xwe di halê rûhî yê zivistanî de hîs dike ku di vê halê surgunîyê de hem hêviya hatina biharê hem jî jibîrnekirina payizê heye.<sup>21</sup>

### 1.1.3 Aliyên Erênî yên Surgunê

Surgun ji hêla encamên xwe ve ji bo dîn û edebiyatê gelek kêr tê. Ev avantajêke bingehîn ya surgunê ye. Lê vê nêrînê nikare li ser wan êş û kederan bigire yên ku li surgunê pêk tê. Qey surgun ne ew tişt e ku ji hêla însan ve ji bo însanên din hatiye çêkirin; wek mirinê. Lê surgun encama dilovan a mirinê jî nade. Ew însên ji kenveşopa wî/ê, malbata wî/ê, erdnigara wî/ê diqetîne.<sup>22</sup> Wê nêrîna ku surgunê wek avantajê dîtin jî, mirov dikare wek dezavantajêke din yê surgunê bibîne.

Surgun her çiqas hindabûnek be û gelek aliyên wê yên dijwar jî hebin, pir avantajên wê jî henin. Wek di gotineke pêşyan de jî hatiye gotin, di guhertina mekan de bereket heye û em dikarin vê gotinê ji bo surgunê jî bikar bînin. Heta pirî caran surgun wek şerta pêşî ya rewşek baştir hatiye dîtin. Said ji bo pêdiviya surgunê dibêje:

*Ji bo mirov nasname û heyatê tijîtir û watedartir bike surgun tecrubeyeke pêwîst e ku divê tehemûl li wê bê kirin. Bi riya surgunê ve xilasbûn di demên pêşî de tişteke dînî bû. Lê gelek îdeolojiyên siyasî, mîtolojî, û kenveşop vê nêrînê xwedî derketin. Surgun ji bo rewşeke baştir dibe şerta pêşî. Pêşiya ku bibe dewlet surguna miletekî û pêşiya serketina pêxeberekî surguna wî di nav çîrokên de tên dîtin; wek Hz Musa, Hz Muhammed û Hz Îsa.*

Gelek pêşdeçûyîn hem ji bo şexsê/a entellektuel yê/a surgunî hem jî ji bo civatên wî/ê yên berê û nû henin. Ji bo kêrhatina entellektuelên surgunî bo civatên wan yên berê

<sup>19</sup>Mehmet Uzun, **Bir Dil Yaratmak**, İstanbul: İthaki Yayınları, 2009, r.228

<sup>20</sup> Uzun, r.229

<sup>21</sup> Şehmuz Diken, **Amidallılar Sürgündeki Diyarbekirliler**, İstanbul: İletişim Yayınları, 20,09 r.17

<sup>22</sup> Said, **Kış Ruhü**, r.29

em ermenî, yahûdî û kurdan wek mînak dikarin bidin. Her wekê wê em Devleta Yekîtiya Emerîkayê jî ji bo kêrhatina wan entellektuelan bo civata wan a nû dikarin wek mînak bidin. Edward Said dema behsa fayde û karên surgunê dike wan bi rêzê ve dide û di serî de dibêje, entellektuel tu tiştî pêşin qebûl nake û di demên bê îstîkrar de dizane li ser lingên xwe bisekine.<sup>23</sup> Ji ber ku surgun dema cihê xwe diguherîne rastê dunyake nû tê û di ruhê wî/ê de bêîstîqrariyekê pêk tê û bi vê bêîstîqrariyê re divê mucadeleyê bike. Di encama vê mucadeleyê de carinan têkçûyîn pêk werin jî carinan ev mucadele bi serketinê ve diqede. Vê serketinê hêza bi bêîstîqrariyê re mucadeleyê di ruhê surgun de cih dike û wî/ê derdixe asteke bilind ku vê astê wî/ê ji însanên rêzê cuda dike.

Surgun ji bilî ku hêza bi bêîstîqrariyê re mucadelekirinê bide qezenckirin, gelek hunerine din jî dide vî/ê entellektuelî/ê. Yek ji wan ew e ku surgun asoya vî/ê entellektuelî/ê fireh dike. Ev entellektuel vê hunerê bi vê rêyê ve dest dixwe ku ew bi asoyeke fireh ve jiyane û bûyerên wê dinihêre û fikrên xwe yên berê û yên nû berawird dike. Bi vê rêyê ve entellektuel bi nêrîneke nû ve hem fikrên berê hem jî fikrên nû dinirxîne.<sup>24</sup> Wek mînak entellektuel dikare bîr û baweriyên xwe yên berê û yên nû yên derbarê dîn, mafên mirovan, metodên mucadeleyê, hwd bide ber hev û bi vê riyê ve ev entellektuel pirî caran dikare ji nêrîneke teng xilas bibe û bi asoyeke fireh ve van diyardeyan binirxîne. Yek karek ji karên surgunê yên bingehîn jî ew e ku surgun tiştan tenê wek çawa tene xwiyane nabîne lê ew wan tiştan dikare analîz bike û dikare serî, dawî û prosa wan binirxîne.<sup>25</sup> Wek mînak entellektuelê/a surgunî îktîdarekê wek halê wê yê li ber çavan nabîne, lê wê îktîdarê çawa dest pê kiriye, çi bûye sebep ku ew derketiye, pêvajoya wê çi ye û ew ê bigihîje çi armancê, bi perspektîfê ve dikare bibîne ku surgun daye qezenckirin.

#### **1.1.4. Surgun û Nivîs**

Bi bandora psîkolojiya surgunê ve êdî entellektuel di dunyayeke din de ye. Ew her tiştî dinirxîne û êdî tu tişt jî bo wî sabît nîne. Di ruhê wî de xwesteka nivîsê çê dibe û êdî jî bo wî tenê lîmaneke xwe sipartinê heye; ew jî nivîs e.<sup>26</sup> Nivîs dibe malbata wî yê nû. Ji bo vê pîskolojiyê Mehmet Uzun dibêje, “gava mirov kitêbekê, berhemekê derdixe

---

<sup>23</sup> Said, h.b, r.63

<sup>24</sup> Said, h.b, r.63

<sup>25</sup> Said, h.b, r.64

<sup>26</sup> Said, r.62

meydanê, wek ku zarokek nuh were dinyayê, bi mirov re eyîni his çê dibe.”<sup>27</sup> Edî nivîs û pirtûkên wî/ê entellektuelî/ê ji bo wî dibe parazgeheke wek malbatekê û ew xwe di nav nivîsên xwe de biaram hîs dike.

Paragrafa jor jî nîşan dide ku surgun ji bo derd û elemên xwe li ser xwe bavêje, xwe dispêre nivîsê. Lê gelo nivîs tenê ji bo em surugunê analîz bikin dê têrê bike? Gelo di nivîsên nivîskarên surgunan de em dikarin hemû dîmenên surgunê bibînin û hemû problem û bermayên surgunê di van de der bixin holê? Di demên modern de surgun tê serê hezeran însanan û ev mîsoger e ku wan girseyan hemû nivîs nanivîsînin. Ji bo surguna van kesên ku di nivîsan de derbas nabin Said dibêje:

*“Ji bo em bikaribin surgunê wek cezayekî siyasî ya li gor dema me fêhm bikin, divê em ji wê haritaya surgunê xilas bibin ku ji hêla edebiyatê ve hatiye xêzkirin. Divê mirov nivîskarên wek Joyce, Nabokov û Conrad dayine alîkî. Di şûna wan de, divê em wan penaberên gundî bifikirin yê ku hin sazîyên Yekîtiya Netewan (YN) ji bo wan hatine damezirandin û ji bilî qarneyê nan û numrê wan yê di wan sazîyan de tû tiştên wan tune.”<sup>28</sup>*

### **1.1.5. Surgun û Neteweperwerî**

Di navbera neteweperwerî û surgunê de têkilî heye. Ji welêt dûrmayîn, hesreta vegera welêt, tiştên siyasî sedemên bingehîn yê surgunê ne. Dema em van sedemên bingehîn dinêrin em rastê wê tiştê tîn ku ji bo surgunê welat û sînor û îdeolojî lazîm e. Di çarçova welat, sînor û îdeolojiyê de, pêdivî ji civateke wisa heye ku ew civat xwe bi nasnameyek, erdnîgariyek, armanc û dîrokeke hevpar heye. Ancax din nav van şert û şûrtan de mirov dikare surgun bibe, an na surgunî çê nabe. Ango divê ji bo her civatekê cih û fikr û ramanên taybet hebin ku endamên wê civatê bi dirketina ji nav wê civatê ve surgunê bijîn. Ji bo rewşek wuha jî di meneya modern de neteweperwerî pêwîst e. Çimkî neteweperwerî beyana aîdbûyîna cihek, netewek, û mîrasek e û ancax welatekî ji hêla ziman, çand û edetke hevpar ve hatiye afirandin ji hêla neteweperweriyê ve tê qebûlkirin. Esas, tîkiliya di navbera neteweperwerî û surgunê de dişibe dîyalektîka Hegel ya bi ser navê xulam-efendî. Çimkî di vê tîkiliyê de tiştên zid şikil didin hevdu.<sup>29</sup> Surgun, ji kok, welat, ax, yekîtiyê dîrketin e û taybetiya welateke neteweperwer jî ji bo kesan kok welat, ax pêşkeşkirin e. Ji vê hêlê ve surgun û neteweperwerî zidên hev in. Ev zid şikl didin hev wek ku Hegel di dîyalektîka xwe ya kole-efendî de diyar kiriye.

<sup>27</sup> Firat Cewerî, “Edebiyata Kurdî Ya Surgunê », Nûdem, j.1, (Zivistan 1992), r.40

<sup>28</sup> Said, **Kiş Ruh**, r.31

<sup>29</sup> Said, h.b., r.31

Vê şikildayînê bi rîya têkoşîna surgun ji bo bigihêje kok, welat, ax û yekitiya xwe ve pêk tê. Bi gotineke din ve, di çarçova têkiliya neteweperwerî û surgunê de surgun di encama neteweperweriyekê de surgun bûye û bê cih û war maye, yanê neteweperwerî ku taybetiya wê bingehîn xweyîbûyîna cih û waran e, zidê xwe bêcihûwarbûyîna yanê surgunê encam dide. Her wekê vê surgun jî dixwaze bigihêje xweyîbûna cih û waran. Ji ber vê xwestekê ye ku surgun her wext li pey artêş û dewletan e.<sup>30</sup>

### 1.1.6. Surgun û Xesûdî

Surgun gelek bi derûniyetên curbicur ve dertê pêşiya mirov. Hin caran derûniyetên wisa derdikevin rastê mirov, mirov ecêb dimîne. Yek ji wan derûniyetên ecêb yê surgunan xesûdiye. Di encama vê xesûdiyê de dijminiyeke li hember hemû kesên din ên ku di nav grûba wan ya bisînor de nîne derdikeve meydana. Ji bo vê dîsa Saîd dibêje:

*“Surgun di eslê xwe de haleke xesûdî ye. Eger di destê we de pir kêmtîşt hebîn, hun ê parastineke êrîşkar ve wan biparêzin. Tiştên hun surgunê dest dixin tam jî ew tiştin ku hun naxwazin parve bikin. Dema hun sînoran derûdora xwe û hemwelatîyên xwe xêzîkin, aliyên surgunê yê herî xirab derdikevin meydana. Dijminiyeke li hember yê din heta li hember kesên weka we di rewşeke xirab de ne û piştgiriyeke mezin di nav grûba we de, aliyên xirab yê surgunê nin. Ka gengeşiyê bêtîcare ku qasê gengeşiya di navbera yahûdîyên sîyonîst û ereban de, li ciheke din heye. Filîstînî jî hêla yahûdîyan ve hatine surgunkirin ew yahûdî ku surguniya wan bûye destan.... surgun bavê surgunê ye.”<sup>31</sup>*

### 1.1.7. Dawiya Surgunê

Di vê beşê de em li ser surgun çî ye, bêja surgunê, dîroka wê û ji aliyê derûnî ve avantaj û dezavantajên surgunê sekinîn. Gelo pey van gengeşiyên ruhî surgun digihêje kêjan qadê? Kesê/a surgun ji hêla pîskolojîk ve dikeve kêjan rewşê? Wek qanûneke dunyayê di encama têkoşînan de mirov çawa dikare serkeve her wekê wê dibe ku mirov sernekeve. Ji hêla rûhî ve tiştên ku hatiye îdealîzekirin wiha tê terfîkirin:

*“Ji bo zihneke terbiye dîtiye, guherfîna fikran kanekê kamiltiyê ye ku derbarê tiştên nayên dîtin û demdemî de û bi demê re hiştina wan hemûyan di dawiya xwe de. Kesê/a ku welatê xwe rind û xweşik dibîne hê di serê rê de ye; kesê/a ku her cihê weka welatê xwe rind û xweşik dibîne jî bi hêz û quwete; lê mirovê/a dunyayê wek welateke xerîb dibîne mukemmel e. Ruhê ku di serê rê de ye, hezkirina xwe li ser noxteyêke dunyayê teksîf kiriye; însanê/a bi hêz û quwet hezkirina xwe belavê her derê dunyayê kiriye; însanê/a mukemmel jî hezkirina xwe temirandiye.”<sup>32</sup>*

<sup>30</sup> Said, h.b., r.32

<sup>31</sup> Said, h.b., r.33-34

<sup>32</sup> Said, h.b., r.41

Ev rewşa îdealîze dibe ku hişkiyeke dijwar bide entelektuelê surgunî. Lê gelo wisa ye? Gelo xweşiyên vê nêrînê tune ne? Yanê xwe aîdê tu cihekê hîsnekirin aliyên xweş di hundirê xwe de nahewînin? Ji bo vê Saîd dibêje:

*„Behsa xazên surgunê dibe ku hinek tewş werê. Lê derbarê hin rewşên surgun yên xweş de jî mirov dikare behs bike. ‘Wek welateke biyanî li hemû dunyayê nêrîn’ nêrîneke azad dide mirov. Pîrî mirov tenê çandek, cihek, welatek ferq dikin; lê surgun herî kêr du çand, welat, cihan ferq dikin ku ev jî haza pirçandiyê, di demekê de gelek dîmenan ferqkirinê dide mirov. Yanê ferqkirineke kontrapuntal<sup>33</sup> dide mirov.”<sup>34</sup>*

## 1.2. DIYASPORA

Diyaspora ew civat e ku di encama surgunekê de derketiye holê. Gelek curên wê û taybetiyên wê henin. Em ê di bin vê bingeşê de li ser diyaspora çî ye, dîroka civatên diyasporayê, cure û taybetiyên diyasporayê kûr bibin.

### 1.2.1. Diaspora Çi Ye?

Di ferhengên de diyaspora wiha derbas dibe; Yahûdiyên ku li deveyê Îsraîlê dijîn; gruba ku ji welatê dê û bavê xwe hatine dûrxistin, bi taybetî bi darê zorê hatine dûrxistin wek Afrîkayiyên di encama bazirganiya trans-atlantîk ya koleyan de ji welatên xwe dûr ketine; gruba dînî ya di nav grubek dînek din ya hakim de wek kêmar dijî.<sup>35</sup>

Diyaspora ji peyva “dispersion from”ê tê ku wateya wê ev e; kirina yan pêvajoya belavbûna tiştan an însanan li ser ciheke fireh. Nexwe li gor vê di destpêka diyasporayê de merkezek, ciheke taybet û “malek” heye ku belavbûn ji wir dest pê dike.<sup>36</sup> Wek biwêjek diyaspora hem di nav dîrokê de hem jî di heman demê de gelek wateyên cuda girtiye. Gelek tiştine li ser vê biwêjê hatiye nivîsîn. Em ê di vê derê de qasê ku me karî vegotinekê ji bo diyasporayê bînin û bi cure û taybetiyên diyasporayê gotinê ve ji bo vê biwêjê terîfekê pêşkeş bikin.

Bi maneyeke gelemperî ve ji bo tarîfa diyasporayê em dikarin behsa du kategoriyan bikin. Kategoriya ewil diyasporaya cihûyan (yahûdî) e. Ev kategorî mîna tîpeke îdeal ya diyasporayê tê rawekirin. Ev kategorî tîpolojîyê ji bo diyasporayê derdixe holê û bi vê tîpolojîyê ve hin rêbaz tîpîkî avakirin da ku bi van rêbazan ve were

<sup>33</sup> Di muzîkê de, dema du yan zêdetir melodî bi hev re lê dikeve.

<sup>34</sup> Saîd. **Kiş Ruhî**, r.42

<sup>35</sup> <http://dictionary.reference.com/browse/diaspora> (05.05.2014)

<sup>36</sup> Mînoo Alinia, **Spaca of Diaspora; Kurdish Identities, Experiences of Otherness and Politics of Belonging**, Doctoral Dissertation, Department of Sociology, Göteborg University, Göteborg, 2004, r.97

fêmkirin ka kêjan grup gruba diyasporayê ye kêjanê nîne. Di vê kategoriyê de du nosyonên bingehîn henin; aîdê cihek bûyîn û vegera wê derê. Kategoriya duyem, diyasporayê wek aîdbûyîna cihek nabîne. Di ravekirina diyasporayê ya vê kategoriyê de, ku wek aîdbûyîna cihek nebûyîn tê terîfkirin û ji tecrubeyên Afrîkayîyan derketiye holê, diyaspora, mîna pêvajoyeke sosyo-kulturel tê dîtin ku li ser çêbûyîna nasnameyan kûr dibe û di bingeha xwe de cewabek e ji bo surgun û cihûwarêxwebûyînê. Ew li ser aîdê cihek bûyînê û vegera wê derê zêdetir li ser cihûwarêxwebûyînê û pêvajoya wê disekine. Xwestina “malek” di vê kategoriya terîfa diyasporayê de bi xwestina “welatek” ve ne heman tişt e.<sup>37</sup>

Paragrafa jor terîfa diyasporayê di du kategoriyan de vedibêje. Dema em herdu terîfan jî dinêrên di wan de cihûwarêxwebûyînê û li welateke din jiyînê di bingehê de nin. Gelo hemû kesên li derveyê welatê xwe dijîn dikevin nav kategoriya diyasporayê? Li ser vê yekê fikrên cuda henin. Yek nivîskarekî ku li ser vê yekê fikrê xwe haniye ziman Cohen e ku li derveyê welatê jiyînê wek krîtera bingehîn dîtiye. Bi gotineke din ve, li gor Cohen li derveyê welatê jiyînê, parçeyek e ji şert û şûrtên diyasporayê. Nexwe di terîfa wî de, hemû însanên seyar û yên ku ji welatê dûr ketine ji çî sedemê dibe bila bibe, parçeyeke diyasporayê ne. Li gor vê jî, di navenda terîfa Cohen de “cih” di merkezê de ye, ji ber ku ew diyasporayê ji bo hemû kesan fireh kiriye, kesên ku ji cihê xwe dûr dijîn.<sup>38</sup> Di vê derê de, bi min, pîrsgirikekê heye. Ji ber ku, dibe ku hemû kesên bi nasnameya diyasporayê ve hatin terîfkirin li derveyê welatê bijîn lê nayê wê maneyê ku her kesê derveyê welatê dijî di nav gruba diyasporayê de be. Ji bo di nav grûba diyasporayê de cih girtinê, hin nivîskar hin kirîter danînin. Dîsa diyaspora di nav dîrokê de wateyên curbicur girtiye. Em ê nuha li ser dîroka diyasporayê û di nav wê dîrokê de wateyên girtiye bisekinin.

### **1.2.2. Dîroka Diyasporayê û di Nav Wê Dîrokê de Wateyên Girtiye**

Dîroka diyasporayê di orîjînalê xwe de bi tecrubeyên grubine taybet wek cihû û ermen ve dest pê kiriye. Paşê diyaspora tenê ne ji bo cihû û ermenan lê ji bo hin kêmahiyên dîni yên Ewropayê jî hatiye bikaranîn. Ji salên 1970an vir ve ji bo terîfa diyasporayê gelek gotin hatin gotin û şîrove hatin kirin. Yek nivîskarek ji nivîskarên baştirîn ên li ser vê mijarê xebitîne Thomas Faist e ku ew ev hemû terîfan di nav

---

<sup>37</sup> Alinia, h.b, r.97-98

<sup>38</sup> Alinia, h.b, r.102

çarçoveyeke baş de bi kurtasî û sade dide. Faist dibêje, meriv dikare sê karakterîstîkên bingehîn ve piraniya terîfên diasporayê têxe nava çarçoveyek. Dîsa ew ji bo her karakterîskê du binbeş vedike ku yek bikaranîna berê û du, bikaranîna nû ya vê karakterîstîkê ye. Karakterîstîka yekem, bi sedemên koçê û cihûwarêxwebûyîne ve eleqedar e. Bikaranînen berê yê ve karakterîstîka diasporayê ve koç û cihûwarêxwebûyîne refereyê bi darê zorê ji cihûwarêxwebûyîne dikin û ev fikra wan jî ji tecrûbeyên cihûyan û di van dawiyên de jî tecrûbeyên filîstîniyan tê. Bikaranîna nû ya vê karakterîstîka diasporayê ve koç û cihûwarêxwebûyîne bi hemû cur cihûwarêxwebûyîne ve girê didin lê ne tenê bi yê darê zorê ve. Di nava van cihûwarêxwebûyîne de diasporayên bazirganî wek Çînîyan, diasporayên koçên ji bo xebata derveyê welêt wek tirk û mexsîkayîyan.<sup>39</sup>

Karakterîstîka duyem ya terîfa diasporayê têkiliya di navbera welêt û cihê koçê de ye. Ji bo vê karakterîstîkê bikaranînen berê li ser vegeftina malê (mala ku di xeyalan de heye) disekinin. Mesela ew bi projeyên li ser welêt ve dixwazin bandorê li ser dahatûya welêt çêbikin. Lê, karakterîstîka duyem ya diasporayê ku li ser têkiliya bi welêt re disekine, bikaranînen nû bi şîroveyeke din ve terîf dike. Ew ne wek bikaranînen berê yê ve karakterîstîkê li ser bandora welêt disekinin; lê, pirtir li ser têkiliyên kûrtir bi welêt re hûr dibin. Ev bikarînan û watekirinên nû li ser benda di nav welatê di xeyal de û welatê çûyî de pirtir li ser têkiliyên paralel yê di navbera welatê orîjînal û welatê koçê de disekine.<sup>40</sup>

Karakterîstîka sêyem ya terîfa diasporayê, entegrasyona civata kêmar ji bo civata xwedîmal e. Bikarînan û watekirinên berê wiha bawer dikin; tu kêmar bi temamî ji hêla civakî ve nikare entegreyê civata nû bibe. Dîsa ji hêla polîtîk, aborî û çandî ve nikare bi temamî entegreyê ve civata nû bibe. Kêmar, li gor watekirinên berê yê ve krîterê, her wext li hember piraniya civatê duwaran datînin û disa wek vê, civata piranî jî duwaran li hember hindekeyan datînin. Nexwe, li gor vê menedayina berê, asîmîlasyona etnîkî û dîmî tê wateya dawîanîna ve diasporayê. Lê watekirin û bikaranînen nû yê ve krîtera

---

<sup>39</sup> Thomas Faist, "Diaspora and Transnationalism: What Kind of Dance Partner?" di nav ve de, *Diaspora and Transnationalism (Concepts, Theories and Methods)* Editor; Rainer Bauböck and Thomas Faist, Amsterdam University Press, Amsterdam, 2010, r.13

<sup>40</sup> Bauböck and Faist, h.b, r.13

entegrasyonê, li ser çandên melez disekinin û diyasporayê wek belavbûna van çandan dibînin.<sup>41</sup>

Wek encam û kurte em dikarin dîroka terîfkirina diyasporayê di sê karakterîstîkan de vebêjin. Karakterîstîka ewil, ji cihûwarêxwebûyîn, ya duduyan, têkiliya welêt û welêtê biyanî û ya sêyem entegrasyona civata nû ye. Ev karakterîstîk jî di bin du beşan de hatine dabeşkirin; watekirinên berê û yên nû yên van karakterîstîkan. Watekirinên berê her çiqas ne zêde kompleks be jî yên nû li gor rewşa dunyayê ya nû van karakterîstîkan mane kirine.

Ji bo ku meneya diyaspora di nav dîrokê de girtiye zelaltir be me tabloyek amade

Tablo 1.2.2. Berawirdkirina Pênaseyên Berê û yên Nû yên Diyasporayê

Karakterîstîk	Nêrînen Berê	Nêrînen Nûjen
1- Sedemên koçê û cihûwarêxwebûyîna	<b>Bi darê zorê ji cihûwarêxwebûyîn</b> M: Tecrûbeyên cihûyan û di van dawiyên de jî tecrûbeyên filîstîniyan.	<b>Hemû cur cihûwarêxwebûyîn.</b> M: Diyasporayên bazirganî wek çîniyan, diyasporayên koçên ji bo xebata derveyê welêt wek tirk û mexîkayîyan
2. Têkiliya di navbera welêt û cihê koçê de	<b>Vegeza malê (mala ku di xeyalan de heye)</b> M: Bi projeyên li ser welêt ve bandorê li ser dahatûya welêt çê kirin	<b>Têkiliyên paralel yên di navbera welatê orîjînal û welêtê koçê de</b>
3. Entegrasyona civata hindike jî bo civata xwedîmal	<b>Tu hindike bi temamî ji hêla civakî ve nikare entegreyê civata nû bibe</b> M: Asîmilasyona etnîkî û dînî tê wateya dawîanîna vê diyasporayê	<b>Çandên melez û belavbûna van çandan</b>

kir. Tablo 1 vê nîşan dide.

### 1.2.3. Taybetiyên Diyasporayê

Civatên diyasporayê xwediyê hin taybetiya nin ku ew taybetî çarçoveya diyasporayê derdixe holê û ji bo terîfa wê jî alîkar dibe. Li ser taybetiyên diyasporayê wek ji bo terîf û dîroka wê gelek nivîskar nivîsin nivîsîne. Li ser vê yekê, kurtasiyek ji

<sup>41</sup> Bauböck and Faist, h.b, r.13-14

kurtasiyên baştirîn ji hêla nivîkar Michel Bruneau ve hatiye kirin. Ew kirîterên diyasporayê yên ku ji hêla Cohen û Sheffer ve hatine diyarkirin di bin şeş beşan de kom kiriye. Em ê pêşî van şeş kirîteran bidin û paşê jî li ser wan kirîteran bisekinin. Bruneau van şeş krîteran wiha rêz dike; yek, bi darê zorê ve ji cihûwarêxwebûyîn; du, hîlbijartina cihê ku tê çûyîn; sê, hişmendiya nasnameyê; çar, meydana têkiliyê; pênc, dewama têkiliyên transnasyonel û şeş, ji civata orîjînal û ya xwedîmal otonomiya dîtbarî.<sup>42</sup>

Taybetiya ewil ya diyasporayê, bi darê zorê ve ji cihûwarêxwebûyîn e. Di vê aliyê diyasporayê de kesên ku koç bûne di encama hin sedemên derveyî yên ku ew zorê koçê kirine henin. Ev dibe ku di encama hin tiştên siyasî de an jî di encama hin bûyerên xwezayî de pêk werê. Lê di eslê xwe de kesên koç dikin di encama hin sedemên derveyî yên ku wan dide zorê ve vê koçê dikin. Bo mînak, dema cûntaya leşkerî ya sala 1980yê pêk hat, gelek aktîvîstên Tirkiyê mecbûr man derketin derveyê welêt. Ew di encama xwestina xwe de vê biryarê nedan lê faktorên derûdor wan da zorê ta ku welêt terk bikin. Vê aliyê xwe ve ev grupa derketiye derveyê welêt taybetiya ewil ya diyasporayê dihewîne.

Taybetiya duyem ya diyasporayê hîlbijartina cihê ku tê çûyîn e. Kesên ji cihûwarê xwe dibin diçine derveyê wê welatê. Lê gelo li gor kêjan kirîterê diçin? Di hîlbijartina welatên ku çûne de çi bibandor bûye? Ev rewş jî rêgezeke bingehîn ya diyasporayê ye. Kesên welêt mecbûr dimînin terk dikin hin riyên diyar bikar tînin. Mesela, ew wan riyên kesên pêşiya wan bikar anîne bi gelemperî bikar tînin. Dîsa diçin cihên guncav yên ku dikare wan bihewîne. Unsureke din ya hîlbijartina cih ew e ku li wê welatê ku diçin kesên wek wan hene an na? Ev hemû di hîlbijartina cihê çûyînê de bibandor dibe. Mesela, eger em bi mînaka xwe ya paragrafa jor ve berdewam bikin ew ê mijar zelaltir bibe. Pey cûntaya heştêyan aktîvîstên kurd Ewropayê ji bo koç hîlbijartin. Ji ber ku welatên Ewropayê ji hêla pêşketîna ve ji bo van kesan ciheke guncav bû. Dîsa pêşiya wan kurd çûbûn Ewropayê û li wan deran kesên ku wan bihewînin hebûn.

Taybetiya sêyem ya diyasporayê hişmendiya nasnameyê ye. Ev taybetî pey ku koç dertê meydanê çê dibe. Pîrî caran kesên koç dibin dema li welêt in ji hêla hişmendiya nasnameyê ve pir hişk nînin. Lê dema koçê derveyê welêt dikin li wê derê pîrî caran ji

---

<sup>42</sup> Michel Bruneau, “Diasporas, Transnational Spaces and Communities”, di nav de, *Diaspora and Transnationalism (Concepts, Theories and Methods)* Editor; Rainer Bauböck and Thomas Faist, Amsterdam University Press, Amsterdam, 2010, r.36

xwe re nasnameyek çê dikin û welateke îdeal di hişê xwe de diafirînin. Ev taybetiyeke bingehîn ya diyasporayê ye. Me li jor terîfa diyasporayê di binê du beşan de rave kirin. Modela ku “welêt” têdixe merkezê û ji bo vegera welêt dixebite wek cihê û ermenan û modela ku pêvajoya koçê romantîze dixe û bi vê yekê ve ji xwe re nasnameyek çêdike wek Afrîkayîyan. Di van herdu beşan de jî diyaspora dixebite da ku xwediyê nasnameyek bibe. Eger em vê ji bo rewşa diyasporaya kurdan bifikirin, di gelek berhemên kurdên diyasporayê de em rastê nasnameyek neteweyî tînin ku em ê di beşa bê de li ser vê mijarê kûrtir bisekinin.

Taybetiya çarem ya diyasporayê *meydana têkiliyê* ye. Yanî meydana têkiliyê hem di nav civata diyasporayê û welêt hem jî di nav civata diyasporayê yê cihê û welatên curbicur de ye. Ji bo vê yekê jî em dikarin ji diyasporaya kurdan mînakên bin. Mesela dema em kovarê û rojnameyên kurdan yê diyasporayê dinêrin em dibînin ku hem bi diyasporayên kurdan yê welatên din re hem jî bi welatê orjînal re têkiliya wan hene. Mesela kovara *Nûdemê* li Swêdê dertê û li welatên mîna Fransa, Danîmarka û Belçîkayê hevkarê wê henin. Em dikarin vê mînakê ji bo têkiliya diyasporaya kurdan ya li derveyê welêt lê di navbera welatên mazûvan de nimûne bidin. Dîsa vê kovarê bi welêt re jî têkiliya wê heye û li wan deran tê firtoran û ji nivsîkarên welêt nivîsan dihewîne. Vê rewşê jî em dikarin ji bo têkiliya diyaspora û welêt wek mînak bidin. Ango cihê têkiliya diyasporayê li welatên din û welatê orjînal belavbûyî ye.

Taybetiya pêncem ya diyasporayê, *dewama têkiliya transnasyonal* e. Ango dema koç pêk tê kesên nû koç kirine bi rûheke aktîf ve dikarin di nav gruba diyasporayê de cih bibîrin. Lê bi demê re, gelo ew ê bikaribin vê rûhê biparêzin û her wext bi wê nasnameya xwe bijî? An jî nifşên nû dê ji asîmîlasyonê bikaribin xilas bibin? Ev rewş jî taybetiyeke diyasporayê ye. Em dîsa ji diyasporaya kurdan mînakek bin. Kurdên ku li diyasporayê nasnameyê netewî dest xistin û çalakiyan ji bo çand û huner an siyaseta welêt pêk hanîn, tu carî ji vê endîşê xilas nebûn ka gelo nivîşên nû bikaribin van tiştan bikin an dê bikaribin xwe ji integrasyon û asîmîlasyonê xilas bikin û vê nasnameyê biparêzin. Berdewamiya diyasporayê jî taybetiyeke diyasporayê ya bingehîn e.

Taybetiya şeşem û ya dawî jî *xwedîbûna otonomîyek dîtbarî di civata orjînal û ya xwedîmal de*. Yanê, civatên ku li derveyê welêt organîze dibin û di nav civata xwedîmal de xwediyê hin taybetiyên cûda dibin, hem di nav vê civata xwedîmal de hem jî di nav

civata orjînal ya welêt de xwediyê ciheke taybet dibin. Di nav civata xwedîmal de ji ber rewşa xwe ji vê civatê daxwaz dikin ku bila hin însîyatîfan ji bo wan bidin. Dîsa ji ber tercubeyên xwe yê derveyê welêt û nasnameya wan ya derveyê welêt çêbûye ew ji civata xwe jî dawaza ciheke taybet dikin. Ew pirî caran ji bo civata welêt, xwe wek rewşenbîr pêşkeş dikin.

Ji bilî Bruneau hin nivîskarên din jî ji bo taybetiyên diyasporayê tasnîfan kirine. Cohen taybetiyên diyasporayê di bin neh qeleman de tasnîf kiriye. Ew wiha dibêje; “

*“Ji welatê xwe bi darê zorê derketin ber bi herî kêma du welatan ve.*

*Ji welatê xwe belavbûna welatên din ji bo kar, bazirganî an armancên koloniyal.*

*Bîr û baweriyê hevpar ya derbarê welêt de, ew bîr û bawerî di nav xwe de cih, dîrok û tevgerên wê grubê jî dihewîne.*

*Îdealîzekirina welêt û qebûleke hevpar ya berdewamkirin, restorasyon, ewlehiya wê welatê, hetta afirandina wê welatê.*

*Pêşxisîna tevgerê vegeerê ku ev tevger qebûleke hevpar dest xistiye.*

*Berdewamiya bîr û baweriyê hişk ya neteweyî ji bo demeke dirêj û hîseke xwecudadîtinê, dîrokeke hevpar û baweriyê qedereke hevpar.*

*Bi civata xwedîmal re têkiliyên xirab, îddîaya ji hêla wê civatê ve neqebûlbûyînê.*

*Hîsa yekîtî û empatiyê bi nûnerên heman grubê yê li welatên din.*

*Bi toleranseke puluralîzmê ve xwediyê îhîmala pêxistinê jiyana xwe di welatê derve de.”<sup>43</sup>*

Taybetiyên me li jor rêz kirin hemû ji bo terîfa diyasporayê zelaltir bibe kêr tê. Wek encam em behsa taybetiyêke bingehîn ya diyasporayê bikin û bi wê ve xilas bikin. Ew taybetiyê jî ev e; tiştê ku diyasporayê ji hemû cur cihguherandinê cuda dike watedayîna “malê” ye, yanê watedayîneke polîtîk ya cih û malê ye.<sup>44</sup>

#### **1.2.4. Cureyên Diyasporayê**

Di dîroka mirovahiyê de, grubên mirvoran ji ber sedemên curbicur ji cih û warê xwe bûne. Ev sedem û şert û şûrtên cihûwarêxwebûyînê bûye sebeb ku van gruban bertekên curbicur bidin vê cihûwarêxwebûyînê. Di encama vê yekê de ji bo terîfa van grubên diyasporayê ji hêla zanyaran ve tasnîfin hatine kirin û ev tasnîf jî curbicur in. Em ê di vê derê de li ser tasnîfîkirina Michel Bruneau bisekinin. Michel Bruneau grubên diyasporayê di çar perçan de dinirxîne.

---

<sup>43</sup> Alinias, h.b, r.101-102

<sup>44</sup> Alinias, h.b, r.113

Cura ewil ya tasnîfa Michel Bruneau *derûdora qutbeke mutesebbîsiyê* şikl digrê. Hemû sedemên din li derûdora vê yekê kom dibin û giringiya wan di rewşeke duyem de ye. Ji bo vê cureya diyasporayê mînakên baştirîn çînî, lubnanî û hînduyî nin. Ne dînên van gruban ne jî netewên van gruban di vê cur diyasporayê de peywireke avakar hîlnade. Ji bo van gruban dibe ku gelek welat hebin wek Taywan, Çîn, Hong Kong, ev cudahiya welatan ji bo vê cur diyasporayê rêgezeke bingehîn nîne. Tiştê esil mutesebbîsî ye. Ev cur diyaspora, di encama armancên kolonîyal, aborî û tîcarî pêk hatinin.<sup>45</sup>

Cureya duyem ya tasnîfa Bruneau *derûdora qutba dînî* şikl digrê. Ev dîn bi gelemperî bi zimaneke taybet ve tê zanîn. Wek mînak, cihû, yewnanî, ermenî û asûrî-keldanî. Di vê cur diyasporayê de dînên wan yekxwedayî ye û kitêbeke pîroz hatiye nivîsîn. Ew kitêb jî bi wê zimanê ve hatiye nivîsîn ku ew dîn bi wê zimanê ve tê nasîn. Yewnanî û ermenî di dibistanên diyasporayê de ber dînên xwe de zimanê xwe jî hîne xwendekaran dikirin. Sînegog û dêr jî ji bo van diyasporayan roleke avakar digirtin.<sup>46</sup> Ango ev diyasporayên dînî yên li ser netewekê hatine avakirin wek cihû û ermenîyan, dîn û netew alîkarê hev bûne da ku xwe biparêzin. Tiştê şikildar jî dîn û netew bûye.

Cura sêyem ya diyasporayê li gor Bruneau li derûdora *qutba polîtîk* şikl digrê. Ev rewş bi taybetî dema welatê grubekê ji hêla grubeke biyanê ve tê kontrolkirin ew çax dertê holê û ev jî dibe sedem ku kesên di nava vê diyasporayê de li derûdora fikra avakirina netew-dewletekê kom bibin. Ji bo vê yekê mînakeke baş filîstînî nin. Filîstînî li diyasporayê rêkxisineke bi navê *Rêkxistina Azadiya Filîstînê* avakirin da ku li ber netew-dewleta Îsraîlê dewteteke neteweyî ya filîstînîyan ava bike. Hişmendîya filîstînî û şikilgirtina diyasporaya filîstînî bi bûyerên salên 1948an ve dest pê kiribû. Ev hişmendî jî encama dewleta alternatîf ya ji bo Îsraîlê li diyasporayê derxist holê.<sup>47</sup> Ev cur diyaspora derûdora netewek an jî dînek wêdetir di encama bertekeke polîtîk derketiye holê.

Cura çarem ango ya dawî ya diyasporayê li gor Bruneau li derûdora *qutbeke nijadî û çandî* şikil girtiye. Ji bo vê curê mînakeke baş diyasporaya reşikan e. Ev diyaspora li ser “*nijada reşikan*” hatiye avakirin û tiştê ku vê cur diyasporayê ji yên din

---

<sup>45</sup> Bruneau, h.b, r.40

<sup>46</sup> Bruneau, h.g, r.41

<sup>47</sup> Bruneau, h.g, r.41

cuda dike; welatekî jêderk ango yê ku dixwazin vegerin li wir tune ye. Ji ber ku ev cur diyaspora ji aliyê “*nijad*” ve hatiye avakirin, tenê bi kulturê ve hatiye terîfkirin. Mesela afro-amerîkî tiştê ku wan tîne ber hev an jî bîrewariya wan ya hevpar, tramvayên bazirganiya koleyan û ekonomiya li ser koleyan çêbiye. Gelek kêma afro-amerîkiyên nûjen xwe li ser welatê xwe digrên û xwe bi welatê xwe ve terîf dikin. Em dikarin mirtibên Ewropayê jî têxin nava vê curê. Aliyeke hevpar ya mirtibên Ewropayê û afro-amerîkiyan ev e ku ew jî xwediyê *nasnameyek bêmerkez* in û xwediyê kevneşopiyeye polîtîk nînin. Ev *nasnameyên melez* hem ji hêla welatê xwedîmal hem jî ji hêla wan bi xwe ve hatiye afirandin. Mesela, ev grubên melez di nav xwe de dizewicin ev jî dibe sedem ku xwe biparêzin.<sup>48</sup> Taybetiya bingehîn ya vê cur diyasporayê tunebûna welatekî vegeerê ye.

Dema em diyasporaya kurdan dinêrin, di nav vê tasnîfê de kurd xwediyê taybetiyên cureya duyem in. Ji ber ku kurdên diyasporayê ji ber dewletên netewî welatê xwe terk kirine ew dewletên welatê wan dagir kirine. Dîsa ew pirtir dixwazin ji bo van dewletên netewî dewleteke neteweyî ya alternatîf ava bikin.

---

<sup>48</sup> Bruneau, h.b, r.41

## BEŞA DUYEM

### ÇAPEMENIYA KURDÎ Û DIYASPORAYA KURDÎ YA EWRUPAYÊ

#### 2.1. BI KURTASÎ DÎROKA ÇAPEMENIYA KURDÎ

##### 2.1.1. Di Dema Osmaniyan de Çapemeniya Kurdî

Dema em destpêka çapemeniya kurdî dinêrin dîroka 1898an dertê pêşiya me ku ew dîrok, dîroka derketina rojnameya pêşîn a kurdan *Kurdistan* e. Ev rojname li Qahîreyê hat çapkirin ku ev bajar nuha paytexta Dewleta Misrê ye û wê demê vilayeteke Osmaniyan bû. Vê rojnameyê li derveyê Kurdistanê hate çapkirin, yanê rojnameyeke surgunê ye. *Kurdistan* heta sala 1902yan bi hin navberan be jî çî li Qahîreyê, çî li Parîsê, çî li Folkstonê û çî li Cenewreyê hat derxistin. Ji ber ku rojnameya yekemîn a kurdan “Kurdistan” e û di 22yê Avrêlê de hatiye derxistin, ev roj di nav kurdan de wek roja rojnamegeriya kurdî tê pîrozkirin.

Di hejmara yekemîn ya Kurdistanê de di nivîsekê de ew wiha tê rawekirin:

*“Heyfa min tê ji kurdan re, Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne, camêr in dînêr xwe de rast û qewî ne, xurt in û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in; dinyayê de çî dibe, cîranê wan Mosqof çawa ye, wê çî bike, nizanin. Loma riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî. Bi îzna Xwedê Teala paş nuho, her pazde roja de carekê ez ê cerîdekê binivîsim. Navê vê min kiriye “Kurdistan”. Vê cerîdeyê de ez ê behsa qenciya îlm û merfeta bikin; li ku derê mirov dielime, li ku derê midrese û mektebê qenc hene, ez ê nîşa kurda bikim, li ku derê çî şer dibe, dewletên mezin çî dikin, çawa şer dikin, tîcaret çawa dibe; ez ê hemiya hikarî bikim.”<sup>49</sup>*

Piştî vê rojnameyê hin rojname û kovarên din hatin çapkirin. Bi taybetî li Stenbolê û pey sala 1908an ku dîroka îlankirina Meşrûtiyeta Duyem e. Ji ber ku pey Meşrûtiyeta Duyemîn li Stenbolê ango di Dewleta Osmaniyan de azadiyeke qismî derket holê, hin malmezînan kurdan wek malbata Bedîrxaniyan û Cemîlpaşazadeyan û hin xwendekarên ku li Stenbolê di mektebên bilind de perwerdehî hildidan, dest bi derxistina van rojname û kovaran kirin. Bo nimûne em dikarin *Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurd* mînak bidin. Celîlê Celîl di pirtûka xwe de dibêje; “Di payîza sala 1908an de, Seyîd Evdîlqadir û Emîn Bedîrxan li Stenbolê komeleke bi navê “*Komela Hevkarî û Pêşketin a Kurd*” (*Kürt Teaviün ve Terakki Cemiyet*) komelekê damezirandin. Ev komele bi kêmasî nûnerê sê binemalê kurdan ên mezin Bedîrxanî, Şemzînanî,

<sup>49</sup> Felat Dilgeş, *Rojnameya Kurdî ya Pêşîn Kurdistan*, Stenbol: Weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 1992, r.84-85

Babanî bû.”<sup>50</sup> Ev komele wek çalakî hin rojname û kovaran derdixistin. Mesela *Komela Hevkarî û Pêşketin a Kurd* di rêznameya xwe de ji bo rojnameyekê derxîne biryar girtiye. Ev biryar di pirtûka Malmîsanij de wiha hatiye zimên; “Di rêznameya “*Komela Hevkarî û Pêşketin a Kurd*” de, hatiye nîşandan ku vê komelê dê di heftê carê rojnameyeke Kurdî û Tirkî derxe. Li gor vê biryarê rojnameya vê komelê “*Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurd*” derket.”<sup>51</sup> Wekê vê hin komele û kovarên din jî di vê demê de derketin. Hin ji van rojname û kovaran ev bûn; *Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurd, Rohilat û Kurdistan, Kurdistan, Peyman, Amîdî Sewda, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Yekbûn*, û hwd. Di van rojname û kovaran de behsa başiyên meşrûtiyetê, hamiyeta millî, pirsgerêkên ziman û alfabeya Kurdî û mijarên vî rengî dihat kirin. Hin çîrok û nivîsên pexşan jî di nav van rojname û kovaran de hebûn.

Pey pêvajoya ewil ku me jor behsa wê kir, ji bo çapemeniya dema Osmaniyan pêvajoya duyem dest pê kir. Ev pêvajo jî pey herba cihanê ya yekem bû û heta damezirîna Komara Tirkiyê berdewam kir. Di vê pêvajoyê de rojname û kovarên ku herî pir bal dikşand rojname û kovara ‘*Jîn*’ê bû. Ev kovar û rojname, ji hêla *Komeleya Pêşketina Kurdistanê* ve dihat derxistin û ji hêla naverokê ve ji dema yekemîn cûdatir bû ku me jor behsa wê kir. Ev cûdahî jî ev bû; dema pêşî de ji hêla siyasî ve kurd wek unsureke girêdayê Dewleta Osmanî dihat rawekirin, lê ji ber rewşa siyasî ya ku li pey herba cihanê ya yekemîn, xwestekên Kurdan û bergeha wan a siyasî guherîbû û êdî di van rojname û kovaran de ji bo azadî yan muxtariyeta kurdan xwestek derdiketin pêş. Ji bo rewşa wê demê ya çapemeniya kurdî werê fêmkirin eger em armanca kovara *Jînê* û nivîsek di derbarê prensîbên Wîlson de binêrin dê mijar zelaltir bibe. Armanca *Jînê* wiha hatiye ziman,

“*Jîn ne ji bo destxistina lişteka (menfeet) maddî derdikeve. Armanca wê, belavkirina zanîne ye li ser jiyana kurd a dîrokî, heqên wî yên neteweyî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî, ku ji sedsalên dirêj vir da hatine îhmalkirin. Li gora bawerîya me, amadekirina ciyekî layiq ji bo neteweyê kurd di civîngeha neteweyan da, bi xebateke wesa mimkun e ku awayê wê xebatê li gora fama vê demê be. Em têdigihîn ku ev teşebbûsa me, xebateke pîrr dijwar dixwaze. Belam, dema ku me ev wazîfa giran da ser milê xwe, me bi rastî hêvî kir ku em dikarin xwe bispêrin hevkarî û hesaniyên maddî û manewî yên neteweyê kurd.*”<sup>52</sup>

<sup>50</sup> Celil, Celilê, **Jiyana Rewşenbîrî û Siyasiyan Kurdan (Di Dawiya Sedsala 19a û Destpêka Sedsala 20a de)**, Uppsala: Jîna Nû, 1985. r.73-74

<sup>51</sup> Malmîsanij, **Kürt Teaviin ve Terakki Cemiyet ve Gazetesi**, İstanbul: Çapxaneyê Avesta, 1999, r.55

<sup>52</sup> M. Emîn Bozarslan, **Jîn (Kovara Tirkî-Kurdî, Türkçe-Kürtçe Dergi) (1918-1919)**, cîlt 1, Uppsala: Weşanxana Deng, Sweden, r.5

Her wekî li vir tê xwiyakirin, ew dixwazin ji bo heqên kurdan yên neteweyî, edebiyata wî, rewşa wî ya civakî bixebitin. Ango em di vê derê de rast li lêgerîneke netewî tîne. Ev lêgerîna neteweyî di nivîsên derbarê Prensîbên Wîlson de zelaltir dibe. Wek tê zanîn Prensîbên Wîlson ew prensîb bûn ku pey herba cihanê ya yekemîn ji bo hemû netewan heqê xwedîdewletbûyîne dida. Di nivîsa Evdirrehîm Rehmî ya bi navê ‘Halê Me yê Hazîr’ de ev mijar wiha derbas dibe,

*“Belê, em kurd heta nuha me hîs nekîr ji ber destê hukumeta tirk derkevin, yanî ji menzûma Osmaniyê derkevin. Nuha em temaşe dikin, Wîlson dibêjit çî Tirk nebit nadine Osmaniyê. Ha ew e ku ciyê me dibêjinê Kurdistan; xeyrê du-sê memûran, ew jî ji ber memûriyetê hatine cî bûne, bil ji wana çu tirk çunînin. Wekî tirk çunînin, ma fille, mixeyn? Hindî fille ne, mîqdarê sedan pêncê me nînin. Mixeyn jî sedan du bi zor teşkîl diket. Paşê hingê, ji xeyrê kurdan çu mîletê di çunînin. Wekî wê ye Kurdistan heqê kurdan e, ji xeyrê kurdan heqê kesê nîne.”<sup>53</sup>*

Lê vê pevajo yê bi damezirîna netew-dewletên nû wek Komara Tirkiyê, Iraq, Sûriyê ve hate qutkirin. Bi damezirandina netew-dewletên nû ve hem ji bo Rojhilata Navîn û hem jî ji bo gelên di vê heremê de dijîn û bi taybetî jî ji bo gelê kurd dewreke nû dest pê kir.

### **2.1.2. Di Dema Komara Turkiyeyê de Çapemeniya Kurdî**

Pey damezirîna netew-dewleta Komara Turkiyeyê rewşa kurdên perça Turkiyeyê gelek dijwar bû. Ji ber ku vê dewleta nû li ser nîrxên nijadperestiya tirk hatibû avakirin, ne tenê kurdan lê hemû neteweyên din ên ku di vê erdnigariyê de dijyan, vê dewleta nû ji bo xwe wek tehdîdek didît. Ji bo ku nîrxên xwe yên netew-dewletê biparêzin; berde kurdî û edebiyata kurdî, ev dewlet peyva ‘kurd û kurdî’ qedexa kir û hetta sala 1991ê, kurd, kurdî, Kurdistan û her tiştê bi vê yekê re tîkildar in bi tûndî dihatin pêpeskirin û yên ku li ser vê mijarê biaxivîyan an kurdî binivîsiyan ji hêla dewletê ve dihatin binçavkirin. Ango heta sala 1991ê tiştê rîkûpêk li Turkiyê ji bo çapemeniya kurdî çênebû. Lê hin pêngav di navbera avabûna Komara Turkiyê û 1991ê de çêbû. Hin xwendekarên kurd ji Kurdistanê ji bo perwerdehiya bilind bistînin hatin bajarên mezînan ên Turkiyê wek Stenbol û Enqerê. Van ciwanan bi alîkariya şaredariyên herema Kurdistanê ve ji bo xwendekaran ‘Dicle Talebe Yurdu’ damezirandin. Vê derdorê hin rojname û kovarên ku behsa Kurdan dikirin derxistin. Wek mînak ‘Dicle Kaynağı’ (1949), ‘Şark Mecmuası’ (1950), ‘İleri Yurt’ (1958) ‘Dicle-Fırat’ (1962), ‘Deng’ (1963) û ‘Roja Newe’ (1966). Lê emrê van rojnameyan ji ber pisgirîkên aborî û siyasî zêde

<sup>53</sup> Bozarslan, h.b, r.25

dirêj nedikişand. Hin saziyên Marksîst-Lenînîst jî bi nivî kurdî û nivî tirkî hate çapkirin. Wek mînak ‘Özgürlük Yolu’ (1975), ‘Xebat’ (1976), ‘Roja Welat’ (1977), Kawa (1978), ‘Ala Rizgarî’ (1979), ‘Serxwebûn’ (1980). Tenê kovarekê bi xwerû Kurdî derket, ew jî ‘Tîrêj’ (1977) bû. Vê kovarê ji hêla Komeleya Çandî ya Şoreşger û Demokrat ve hate derxistin ku di sala 1977an de li Amedê hatibû damezirandin û tenê çar jimarên vê kovarê derketin. Di sala 1991ê de Dewleta Turkiyê qedexa li ser zimanê Kurdî rakir û pey vê dîrokê dest bi weşana gelek kovar û rojnameyan hate kirin.

### 2.1.3. Li Sûriyê Çapemeniya Kurdî

Pey herba cihanê ya yekemîn ji ber ku perça Kurdistanê ya di bin desthilatdariya Dewleta Osmanîyan de bû ji hêla sê dewletên nû ve dabeş bû, ev rewş bû sebeb ku tevgerên çand û çapemeniya kurdî yê parçeyên welêt ji hevdu bê xeber pêş diketin. Lê dema em li perça Sûrî dinêrin, em dibînin ku li wê derê şoreşek ji bo edebiyat û çanda kurdî pêk dihat û serê vê şoreşê ji hêla Mîr Celadet Elî Bedir-Xan û hevalên wî ve dihat kişandin. Ev şoreş bi derxistina kovara *Hawarê* û tevger û faalîyetên li derdora vê kovarê û ekîba wî ve pêk dihat.

*Hawar* kovara ziman û çanda kurdî bû. Xwedî û berpirsiyarê wê, rewşenbîr û zimanzan Mîr Celadet Alî Bedir-Xan bû. *Hawar* li Şamê derdiket, lê li gelek deverên Kurdistanê dihate belavkirin û ronakbîrên kurd ji gelek aliyên Kurdistanê nivîsan jê re dişandin. Hejmara pêşîn di 15ê Gulana 1932an de derket. Hejmara dawîn, a 57an di 15yê Tebaxa 1943yan da hate belavkirin. Lê umrê *Hawarê* yê rastîn, ne 11 sal, belku kêmtirî 5 salan bû. Ji ber ku hin caran ji ber sedemên aborî navber dihat dayîn ji bo derketina vê kovarê. Dema em armanca kovara *Hawarê* ji devê Mîr Celadet Bedîrxan dibihîsin ku di hejmara yekemîn a vê kovarê de hatiye gotin, em bêhtir fonksiyona vê kovarê û cihê wê yê di edebiyata Kurdî de fêm dikin. Di hejmara yekem de Mîr Celadet dibêje,

*„Hawar dengê zanîne ye. Zanîna xwe nasîna e. Xwe nasîna ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin. Lewma ko zman şerta heyîne a pêşîn e. Hawar ji pê ve bi her tiştê ko Kurdanî û Kurdîtî pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tenê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê.”*<sup>54</sup>

Tiştê ku di vê derê de balkeş ew e ku *Hawar* ji siyasetê dûr e. Karê siyasetê ji siyasetvanan re hîştîye û dest bi karên kulturî kiriye. Ekîba *Hawarê* bi piranî ji wan

<sup>54</sup> Hawar, “Armanca, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, Hawar, j.1, (Gulan 1932), r.1

kesan pêk dihat ku ji bakûrê Kurdistanê hatibûn rojavayê Kurdistanê. “Mala Haco ji Torê daketibûn, mala paşê ji Diyarbekirê, Qedrî Can û Reşîdê kurd ji Dêrika Çiya Mazî, Doktor Nafiz û birayê xwe Nûredîn Zaza ji Madena Xarpêtê, Osman Sebrî ji Semsûrê...”<sup>55</sup>

Kovara *Hawarê* ne tenê ew fonksiyona wê ya ku li ser ziman û çanda kurdî sekanê ve navdar e, lê ji hêla afirîneriya alfabeya kurdî ya latînî ve jî meşhûr e. Vê kovarê dema dihat derxistin bi alfabeya kurdî a latînî, ku ji hêla Celadet Elî Bedîr-Xan ve hatiye çêkirin, nivîsên xwe diweşand û ev jî bû sedem ku ev alfabeya nû di nav kurdan de belav bibe. Di vê derbarê de Firat Cewerî di hevpeyvîneke xwe de wiha dibêje, “*Hawar* di şert û merceke welê de derket ku kurd ji aliyê siyasî û moral ve şikestibûn û di hundirê bêhêvîtiyeke mezin de vedigevizîn. *Hawar* bi armanca ku bibe hêviya bêhêviyan dest bi weşana xwe kir.”

Îro vê alfabeya ku ji hêla Celadet Bedir-Xan ve hatiye çêkirin di du perçên Kurdistanê de ku Turkiye û Sûrî û di diasporaya Kurdan de û bi taybetî ji bo nivîsa zaravayê Kurmancî tê bikaranîn. Dema kovara *Hawarê* dihat derxistin wê demê hin kovarên din ên kurdî li Suriyê dihatin derxistin, wek *Ronahî* û *Roja Nwe*. Pey sala 1947an heta sala 1960î li Sûrî tevgerên çapemeniyê nehatine xwiyane. Lê pey sal 1960î hin kovarên kurdî dîsa hatine derxistin û ji ber qedexeya li ser zimanê kurdî van kovaran di bin dest de dihatin belav kirin. Taybetiya herî balkêş ya edebiyata kurdî ya Sûrî ew e ku kurdên Sûrî her çî qas dewleta Sûrî alfabeya erebî bikar bîne jî, ew ji bo nivîsa kurdî alfabeya kurdî a latînî bikar tînin. Sedemê vê yekê jî dibe ew be ku kurdên li vê perçê dijîn kurmanc in û ji ber ku kurdên ku li perça Turkiyê dijîn jî kurmanc in û alfabeya kurdî a latînî bikar tînin, ev bandora xwe li ser vê perçê kiriye û dîsa derketina alfabeya kurdî ya latînî li Sûrî jî sedemeke bingehîn a din e.

#### **2.1.4. Li Iraqê Çapemeniya Kurdî**

Em dikarin bêjin ku çî ji hêla çapên pirtûkan ve û çî jî ji hêla çapemeniyê ve kurdên perça Iraqê herî pêşketî nin. Di salên 1920an de Iraq di bin hukmê Birîtanya Mezin de bû. Di sala 1918an de ji hêla vê rêveberiyê ve li Bexdayê kovara *Têgihîştinî Rastî* hate derxistin. Çend sal şûnda kovara *Pêşkewtinê* li Sulêmaniyê hate derxistin. Di

---

<sup>55</sup> Yusiv Biyanî, “Firat Cewerî: Hawar Dengê Bêhêviyan Bû”, Yazınca, j.10, (Kovara Werger, Lêkolîn û Edebiyatê) (Bihar 2009), r.17

vê demê de hin çapxaneyên ji hêla Huznî Mukrîyanî û Pîremêrd, ku rewşenbîrên Kurdan in, hatin damezirandin û tevgerên çapemeniyê hate domandin. Rewşa siyasî ya kurdên Iraqê, dema em bi rewşa siyasî ya perçên din ên Kurdistanê ve berawid dikin, her wext ji hêla pêşketina netewbûn û çêbûn û çapbûna berhemên edebiyata Kurdî ve gelek pêşda bûye. Ji ber vê yekê di hin heyaman de ji ber rewşa siyasî ya Kurdistana Iraqê çapemenî û edebiyata kurdî demên zêrîn jiyaye. Wek mînak salên 1970yî ji bo çapemeniya kurdî a kurdên Iraqê salên zêrîn in. Demeke zêrîn a vê perçê jî pey herba Korfezê di sala 1991an de damezirîna heremeke de-facto li Kurdistana Iraqê ye. Her çiqas di navbera du partiyên mezin ên kurdên vê perçê de mucadeleyeke mezin hebû, lê dîsa jî di vê demê de gelek kovar, rojname û pirtûk li Sulêmaniyê û Hewlêrê hatine çapkirin.

### **2.1.5. Li Îranê Çapemeniya Kurdî**

Kurdên Îranê alfabeya erebî bikar tînin û ew bi giranî bi zaravayê soranî ve dinivîsin. Ji ber ku di nava kurdên Iraqê de jî soranî berbelav e û kurdên Iraqê alfabeya kurdî ya erebî bikar tînin, têkiliyên di navbera van herdu parçeyan de zexm in. Dema em dîroka çapemeniya kurdî ya li perça Îranê dinêrin, em dibînin ku rojmaneya pêşîn li Urmîyê ji hêla Ebdurrezaq Bedirxan ve di sala 1908an de hatiye derxistin. Ji pey herba cihanê ya yekemîn heta sala 1926an em li rastê serhildanekê li nav van kurdan tîn ku ev jî serhildana Simko Axa ye. Di dema wî de bi navê *Rojî Kurd*, bi edîtoriya Mela Mihemmed Turcanî ve kovarekê hatiye derxistin. Dîsa pey herba cihanê ya duyemîn bi navê *Niştîman* kovarekê hatiye derxistin û ev kovar ji hêla Komeley Jiyanebey Kurd (Komela Jixewrabûna Kurd) çap bûye. Wek ku em dizanin pey herba cihanê ya duyemîn heta şoreşa sala 1979an li Îranê malbata Pehlewî hukum dikir. Di vê demê de wek hemû ûnsûrên ku li Îranê dijîyan, ji para kurdan re jî jiyaneke gelek zehmet ketibû. Ziman û çanada kurdan hatibû qedexekirin. Hetta ev rewş di romanên kurdî de jî tê dîtin, ew romanên ku li Kurdistana Îranê hatibû nivîsîn. Wek mînak em dikarin bêjin; xwekirina şalwar ku parçekî ji cil û bergên kurdan ên bingehîn e, ji hêla hukumeta Îranê ve hatibû qedexekirin û gava memûrên hukumatê yek bi şalwar bidîta di nav sûkê de wî bo ceza bike digirt doxîna şalwarê wî diqetan. Qetandina doxîna şalwarê yekî, di nav kurdan de gelek tişteke xerab e. Kurd ji bo ku memûrê dewleta Îranê doxîna şalwarê wan neqetînin pirî caran dervediketînin sûkan û dema ji hêla memûrekê ve bi şalwar

bihatana girtin jî lava ricayê wê memûrê dikirin da ku bi qetandina doxîna şalwarê wî ve, wî di nav millet de bêrûmet nexin.

Pey dewra malbata Pehlewî, ku bi şoreşa 1979an a melleyan ve hate dawî kirin, dîsa tevgerên çapemeniya kurdî dest pê kirin. Di nav van tevgeran de ya ku herî pir bala mirov dikişîne çapxaneya Întîşarî Selahaddînî Eyyûbî ye ku ev çapxane li Urmîyê gelek pirtûk çapkirin. Dîsa ev çapxane bi navê *Siwreyê* ve ji sala 1984an vir ve kovarake mehane derdixe.

### 2.1.6. Li Qafqasyayê Çapemeniya Kurdî

Kurdîstana Qafqasyê ya ku di bin hukmê Sovyetistanê de bû û pey belavbûna Sovyetistanê ji hêla dewletên nû yên piçûk ve hat rêvebirin jî xwediyê tarîxeke cûda ya çapemeniyê ye. Di vê parçeyê de hin caran tevgerên çapemenî, çand û edebiyata kurdî wisan çêbûne, van tevgeran gelek li pêşiya parçeyên din ketine. Lê hin caran jî bobelatên wisan hatine serê kurdên vê perçê ku pir zehmetî bi wan daye kişandin.

Rojnameya *Riya Teze* di nav çapemeniya kurdî ya Kafkasyayê de ciheke girîng digrê. *Riya Teze* (carina wek *Rya Teze* tê nivîsandin) yekemîn rojnameya Kurdî ye ku bi tîpên latînî hatiye çapkirin. *Riya Teze* di 1ê Avrêla sala 1930î de li Sovyetistanê bi alfabeya Kurdî ya Şemo-Marogûlov, ku di sala 1928an de bi biryara dewleta Sovyeta berê hatibû amadekirin, dest bi weşana xwe kir. Ev rojname di destpêkê de heftê du caran bi qasî çar rûpelan derdiket. Bi vî awayî *Riya Teze* beriya kovara *Hawarê* dest bi weşana kurdî bi tîpên latînî kir. Taybetiyeke din ya vê rojnameyê ew e ku rojnameya kurdî ya herî jîyandirêj e li cihanê. “*Riya Teze* bi tevayî ji 50 salan zêdetir ji aliyê dewletê, weke organa Komîtêya Navendî ya Partiya Komûnîst ya Ermenîstanê, parlamênê û hukumeta komarê bi fermî hate weşandin û nuha jî bi awayekî serbixwe weşana xwe didomîne. Ango 7 sal bi latînî û 40 salan zêdetir jî bi tîpên kirîlî hate çapkirin.”<sup>56</sup>

Di demên pêşîn de alîkariya ermenîyan ji bo rojnameya *Riya Teze* gelek bûye. Mesela, berpirsiyarên pêşîn Haraçya Koçar û Harûtyûn Mikrtaçyan ermenî bûn. Herduyan jî kurdî xweş zanîbûn, ji ber ku yek ji Eleşgirê bû, yê dinê jî ji Wanê. Dûra jî Cerdoyê Gêncoyê kurd bûye berpirsiyar. Di salên serî de kesên bi nivîsarên xwe ve beşdarî weşandina wê bûne; Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ahmedê Mirazî,

<sup>56</sup> Wezîrê Eşo, “‘Riya Teze’ di nav dîroka Rojnamegeriya kurdî de pşpelekî geş e”, *Nûdem*, j.26, (Havîn 1998), r.7

Casimê Cefîl, Qaçacê Mirad, Wezîrê Nadîrî, Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayêv, Aramê Çaçan, Etarê Şero û Gelekên mayîn.<sup>57</sup> Di vê derbarî de Wezîrê Eşo ku di rola derxistina Riya Teze de ciheke mezin digrê, dibêje;

*“Û xût “Riya Teze” bû bingeh, ku salên 30î ronakbîriya me saz bû, şax veda û ew dewran bû dewrana çanda kurdî ya zêrîn. Ji ber ku wan salan hemû dergên xêrê li ber me vebûbûn. Wî alîda wan ermeniya, ku em bi hev re ji qira sala 1915an ya tirkan xilas bûbûn û derbazî Ermenîstana îroyîn bûbûn, û baş kurmancî zanibûn, gelekî alîkariya “Riya Teze” û bi tevayî me kirin di hêla sazkirina bingeha mehkem bona pêşketina me.”<sup>58</sup>*

Bi biryara Stalîn weşana rojnameyê ji sala 1937an heta 1955an hate rawestandî. Piştî mirina Stalîn di sala 1955an Riya Teze dîsa dest bi weşana xwe kir, lê vê carê li tîpên kîrîlî ve ku ji aliyê Heciyê Cindî ve hatibûn amadekirin û wek organa Komîteya Navbendî ya Partiya Komûnîstiyê ya Ermenîstanê, hukûmet û parlamentoya wê. Ji ber ku pêşiya Stalîn bimire biryar hatibû dayîn ku herfên alfabe yên hemû mileta ji erebî û latînî bikin kirîlî. Ev rewş heta sovyet, komûnîst çûn û hukûmeta ermeniyê ya nuh hat dewam kir. Ermenî alîkariya vê rojnameyê nekirin û êdî rojname serbixwe bû. Avantaja serbixwebûyîna ew bû ku êdî derbarê kurd û Kurdistanê de dê pirtir tiştan binivîsandan û ji îdeolojî û sînorê partiyekê derketana, lê dezavantaja wê jî ev bû ku dê êdî ev rojname li ser lingên xwe bisekîniya ji ber ku piştgiriya hukûmeta Sovyet dida, hukûmeta nuh ya ermeniyê nedida.

Di vê pêvajoyê de ku rojnameya *Riya Teze* jiyaye, em dikarin rewşa kurdên Sovyetistanê bi kurtasî be jî fêhm bikin. Çawa di sala 1937an de weşana vê rojnameyê ji hêla Stalîn ve hatiye sekinandin her wisa di wê salê de Kurd ji cihên xwe hatine koçberkirin. Dîsa di vê pêvajoya *Riya Teze* de ji hêla çapemenî û çapa kitêban de jî gelek xebatên baş hatine kirin.

## **2.2. DIYASPORAYA KURDÎ YA EWRUPAYÊ**

Hê di dema Osmaniyan de Kurd dest bi koçê Ewropayê kirine û li wê derê diyasporayekê çêkirine. Rojnameya kurdî ya pêşîn ku li Qahîrê derketibû û çapên xwe yên paşê li Cenewre û London û hin bajarên din ên Ewropayê derxistibû, tevgerên ewil

<sup>57</sup> Eşo, h.g, r.7

<sup>58</sup> Eşo, h.g, r.8

yên li Ewropayê organîze kiribûn. Paşê hê dema Osmaniyan de hin kurd ji bo xwendinê diçûne Ewropayê ku em minaka wê ya baştirîn di kovara *Rojî Kurd* de dibînin ku ji hêla Komeleya Hêvî ya li Stenbolê di sala 1913an de hatibû derxistin. Di vê kovarê de, behsa ew xwendekarên kurd dikir ku diçûn Ewropayê û qala şert û mercên li wê derê û yekitiya xwendekarên kurd û alîkariya wan ji bo hevdu dikir. Kurdên ku li Ewropayê civateke ku taybetiyên diyasporayê dihewîne pey salên 1950yê dest bi avabûnê kir. Mirov dikare di bin sê beşan de koça kurdan ya ji bo Ewropayê binirxîne; ekonomîk, polîtîk û yêncama rewşa derûdora welat de pêk hatinin. Her çiqas rewşenbîr û xwendekarên kurdan beriya 1960î çûbin Ewropayê jî, koça girseyî ya kurdan pey vê dehsalê dest pê kir.<sup>59</sup> Ji ber ku di navbera dewletên Ewropayê û Turkiyeyê de hin peyman hatin meydanê û ev peyman ji bo koçeke girseyî ya karkeran derûdoreke musaft derxiste meydanê. Ligel tirkan kurd jî ji ber vê sedema aborî koçê Ewropa kirin. Dîsa hin erdhejên ku li bajarên kurdan yêncama Tiriyê jî bûn sebep ku kurd koçê Ewropayê bikin. Koça ku herf zêde bi mijara me re têkildar jî ew koç e ku di encama pirsgerêkên polîtîk de derketinin meydanê. Ev koç ji bo krîz û bûyerên polîtîk bersiv bû yêncama ku wek zordariya dîni û netewî ya devletê li ser kêmaryan (wek mînak kurdên elewî), darbeyên 1971 û 1980yan, pevçûnên di navbera dewlet û PKK de.<sup>60</sup>

Ev girseya dawî ji hêla perwerdehî ve gelek pêş bûn û dema çûne Ewropayê ji bo tevgerên siyasî, çandî û perwerdehî şert û şûrtên gelek rehet dîtin, ev rehetiya han bû sedem ku ew tevgerên xwe bi hêzeke mezin ve pêş bixin. Jixwe dema em pêvajoya standardizasyona alfabeya kurdî a latînî dinêrin ku ji hêla Mîr Celadet Elî Bedir-Xan ve bi navgîna kovara *Hawarê* ve hate amadekirin, em dibînin ku vê alfabeê dema Celadet Bedir-Xan de berbelav nebûye lê ew di dema diyasporaya kurdî a Ewropayê de belavê gel bûye.

Di navbera salên 1980yê û 1990î de tevgerên edebî û çapemeniyê bi taybetî yêncama Kurmancî li Ewropayê pêk hatine. Gelek çapxane hatine damezirandin û gelek kovar hatine çapkirin. Roman û çîrokên ku li diyasporayê hatine nivîsîn û wergerên ku hatine kirin jî ji bo edebiyata nûjen a kurdî bîngeheke saxlem çêkirine. Enstîtuyên ku di bajarên sereke yêncama Ewropayê wek Parîs û Brukselê, ji bo standardizasyon û pêşketina ziman û edebiyata Kurdî ji bo edebiyat û çanda kurdî ciheke girîng digrin. Pey salên

<sup>59</sup> Dr. Bahar Baser, *The Kurdish Diaspora in Europe; Identity Formation and Political Activizm*, Boğaziçi University-TÜSİAD Foreign Policy Forum Research Report, r.7

<sup>60</sup> Baser, h.b, r.7

2000î ji ber ku li perçên Kurdistanê rewşa kurdan a siyasî û çandî li gor berê baştir bû, ew tevgerên ku li Ewropayê yê pey salên 2000î nispî be jî kêr hatiye xwiyane. Lê disa jî bi taybetî ji bo pêşketina kurmançî diyasporaya Ewropayê ciheke gelek girîng girtiye û îro jî hê wê rewşa xwe ya girîng berdeham dike.

Derbarê hejmara kurdên Ewropayê de agahiyên teqes tunene. Ji ber ku kurdên ku diçin Ewropayê dema qeydê nufûsa wan welatên Ewropayê dibin ne wek kurd lê wek netewên ku ji wê dewleta ku hatine yanê an tirk an ereb an jî faris têne qeydkirin. Ev jî ji bo jimartina kurdan astengeke mezin e. Her çiqas di derbarê hejmara kurdên Ewropayê de jimartineke lêbawer tûnebe jî, texmîna ku herî zêde tê qebûlkirin ya ji bo Ewropaya rojava 850.000 kesin û nêjîkê 500.000-600.000 li Almanyayê dijîn.<sup>61</sup> Lê ev hejmar hem ji hêla Konsîla Ewropayê hem jî ji hêla rêxistinên kurdan yê Ewropayê gelek kêr tê dîtin. Li gor çavkaniyeke 2006an Kurdên li Ewropayê milyonekê zêdetir in û hin rêxistinên kurdan yê li Swêd û Almanyayê ji vê hemarê pir pir zêdetir texmîn dikin hejmara kurdan (Ew dibên herê kêr du mîlyon kurd li Ewropayê henin)<sup>62</sup>

Diyasporaya kurdî ya li Ewropayê xwe bi serê xwe mijareke mezin e ku divê li ser we lêkolînên mezin bêne kirin. Em ê di vê derê de bi kurtasî behsa rewşa kurdên Ewropayê bikin û bi taybetî jî kovarên ku li Ewropayê derketine û paşê jî li ser rewşa kurdên Swêdê (bi taybetî), Almanyayê û Fransayê bisekinin û tevgerên li wan deran bînin ziman. Sedemê bi taybetî li ser Swêdê sekînin jî ev e ku kovara *Nûdemê* li wê derê hatiye derxistin.

Dema em tevgerên kurdên Ewropayê dinêrin gelek hîzb û partiyên kurdan dertên pêşiya me. Van partî û hîzban gelek weşanan derxistin. Bi kurtasî, eger em van weşanan ji hêla dîroka weşana wan ve binêrin dê tasnîfeke wiha derê pêşiya me. Ew tasnîf jî ev e; pêşiya salên 1960î, pey 60î, pey 70yî, pey 80yî û vir ve. Li gor Nurettîn Zaza me agahtar dike, kovara *Dengê Kurdistanê* bi tîpên latînî, kovara kurdî ya pêşîn e ku li Ewropayê derketiye. Ev kovar kovareke mehane bû. Ji sala 1949 heya 1950 dom kiriye û 12 hejmar derketiye. Ji bilî vê kovarê kovarek di sala 1956an de ji hêla civata xwendevanên kurd li Ewropayê ve kovara *Kurdistanê* hatiye derxistin.<sup>63</sup>

---

<sup>61</sup> Baser, h.b, r.8

<sup>62</sup> Baser, h.b, r.8

<sup>63</sup> Lokman Polat, "Kovarên Kurdî li Ewropa", *Nûdem*, j.5, (Bihar 1993), r.119-120

Pey salên 1960î êdî hejmara kovarên kurdî li Ewropayê zêde bûne. Ji bo kovarên navbera salên 1960-70yî em dikarin kovara *Hêviya Welêt* (1963) û *Çiya* (1965) wek mînak bidin. Di navbera salên 1970-80yî de hejmara kovaran hê zêdetir bûye. Hin ji wan ev in; *Ronahî* (1971), *Brûsk* (1977-78), *Stêrka Sor* (1977-79), *Azadî* (1978-79), *Şoreşger* (1978), *Rizgariya Kurdistan* (1979-82), *Dengê Komele* (1978), *Roja Kurdistan* (1979) û hwd. Hin ji van weşanan xwerû bi kurdî hin ji wan kurdî-tirkî û kurdî-erebî hatine derxistin.<sup>64</sup> Piştî salên 1980yî pêşdeçûyîna mezintirîn ji bo weşangeriya kurdî ya li Ewropayê pêk hatiye. Kovarên ku di wê demê de derketine hinekên wan jiyana weşana xwe rawestandine lê hinek ji wan jiyana xwe ji bo wexteke dirêj domandine. Hin ji wan kovaran ev in: *Dengê Yekîtiyê* (1983), *Têkoşer*, *Çarçira* (1986), *Newroz* (1986), *Rewşen* (1988), *Çi Bikin?* (1981) û hwd.<sup>65</sup>

Çapemeniya kurdî çawa kêr tê ji bo ku em rewşa diyasporaya kurdan ya li Ewropayê fêm bikin, her wisa rewşa enstîtuyên kurdan yên li Ewropayê jî parçeyeke din e ji bo em rewşa diyasporayê fêm bikin. Li Ewropayê du enstîtuyên kudan yên bi navûdeng hene. Yek ji wan *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* û ya duyan jî *Enstîtuya Kurdî ya Brukselê* ye. Ji bo em rewşa van enstîtuya fêm bikin nivîseke di kovara *Nûdemê* de, dê gelek kêrî me werê. Di vê nivîsê de serokê *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* Kendan Nezan dibêje,

“Di nav kurdên Ewropa bi deh hezaran kes hebû ku dikaribûn bimeşin, afixan li dîwara xîr govend û dîlan bigirin, bi sedan kes bi karên komelefî dizanin, lê ên ku bikaribin baş bi kurdî binivîsin an zimanekî ewropî yê sereke baş bipeyivin û binivîsin gelek kêr bûn û ji me re jî kesên wilo pêwîst bûn, ji ber ku karê bingehîn yê ku me dabû ber xwe parastin û pêşvebirina çanda kurdî û nasandina doza kurdî bi raya giştî ya Ewropa bû. Gihandina kadrên karê salên dirêj e; loma em bi kadrên hebûyî bi rê ketin, bi hêviya ku di salên pêşiya me de em ê bikaribin keç û xortên kurd ên jêhatî bidin xwendin û ku ji nav wan kesên bikêrhatî derkevin.”<sup>66</sup>

Ango yek armancek ji armancên vê enstîtuyê, kadroyên bihêz bigihînin yên ku dikarin kurdan ji Ewropayîyan re bi zimanê wan û bi tarzeke îlmî bidin nasîn. Ji bo vê yekê jî *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* bûrsan dide xwendekarên kurd da ku kesên ku ji bo vê mîsyonê bigihînin. Ev enstîtu ji hukümetên ku li wir in piştgiriyê digrên. *Enstîtuya Kurdî ya Brukselê* jî hin mîsyonan ve hatiye damezirandin û xwestiye ji hîzb û partiyên dîr bi mîsyoneke serbixwe ve ji kurdî û çanda kurdan re xizmetê bike. Di vê derbarê de

<sup>64</sup> Polat, h.g.120

<sup>65</sup> Polat, h.g. 121

<sup>66</sup> Nûdem, “Enstîtuyên Kurdî”, Nûdem, j.6, (Bihar 1993), r.7

serokê enstîtuyê Derwêş M. Ferho wiha dibêje; “Jîndarkirin, pêşvebirin û nasandina xebata çandî li ser ziman, dîrok, edebiyat û hunera kurdî. Alîkirina Kurdan ji aliyê civakî û çandî ji bo hêsankirina entegrasyona wan di civata Beljîkî (Belçikî) û Ewropî de, bê ku ew şexsiyeta xwe ya kurdî hunda bikin.”<sup>67</sup> Di vê derê de tişteke balkêş ev e ku behsa entegrasyona kurdan jî hatiye kirin.

### 2.2.1. Kurdên Swêdê

Kurdên Swêdê hem di nav kurdên diyasporayê de hem jî di nav hemû kurdan de xwediyê ciheke girîng in. Dîsa ji ber ku kovara *Nûdemê* ku em li ser dixebitin, li Swêdê ji hêla van kurdan ve hatiye derxistin di bin beşeke cûda de hinek li ser vê mijarê sekinîn ji bo naskirin *Nûdemê* û ji bo rewşa diyasporaya kurdî dê gelek kêr bê. Di nivîseke hejmareke kovara *Nûdemê* de ya ku di sala 2001ê de hatiye derxistin, Firat Cewerî dibêje li gora texmînan hejmara kurdên li Swêdê gihîştine çil hezarî.<sup>68</sup> Lê di xebatekê de ku pey sala 2006an hatiye kirin, ev hejmar wiha hatiye ziman; “Ji ber ku welatên ku kurdan dihewînin, kurdan wek hevvelatîyê Îraniyan, Tirkan, Sûriyan an Iraqîyan nîşan dide, em nikarin hejmara kurdan ya rastîn yê li Swêdê derxin meydanê. Lêbelê, li gor texmîna populer, hejmara kurdan di navbera 60,000 û 70,000ê de ye.”<sup>69</sup> Hejmara kurdan ya mîsoger li Ewropayê her çiqas em nikaribin derxin meydanê jî em dizanin ku kurdên Swêdê li gor kurdên welatên din yê Ewropayê di warê tevgerên ziman û çandê de bi taybetî tevgerên çapemeniyê de pêşdatir in.

Koça kurdan ji bo Swêdê di dîrokên cuda de hatine meydanê. Cara pêşî, pey salên 1965an, kurdên Turkiyê yê ji bo kar bi taybetî ji Anatoliya Navîn hatibûn, li Swêdê cih bûn. Paşê jin û zarokên wan yê welêt hatin û li vir cih bûn. Ev koç ne siyasî bû. Koçên siyasî bi derba eskerî ya di sala 1971ê de li Turkiyê ve dest pê kir û girseya mezintirîn pey cûntaya leşkerî ya sala 1980yê ve dewam kir. Ji perça Iraqê jî pey herba Korfezê koçeke mezin pêk hat. Herba Îran-Iraqê ya di salên 1980-88an û şoreşa Îslamî ya Îranê ya di sala 1979an dîsa sedemine din bûn ji bo koçên mezin. Kurdên Suriyê li gor yê din kêmtir in û ew jî ji sala 1980yê vir ve koçê Swêdê dikan.<sup>70</sup>

<sup>67</sup> Nûdem, h.g, r.17-18

<sup>68</sup> Firat Cewerî, “Kurdên Swêdê”, Nûdem, j.37, (Bihar 2001), r.4

<sup>69</sup> Khalid Khayati, “Sweden As A Gravitation Center For The Kurds - Diaspora Formation And Transnational Relations”, r.6

<sup>70</sup> Khayati, r.5-6

Kurdên Swêdê ji hêla çalakîyan ve ji kurdên din dihatin qetandin. Ew pirtir girîngî didan zimanê xwe û çanda xwe û bi gotina Firat Cewerî ve kurdên Swêdê li Swêdê di hişê xwe de Kurdîstaneke xeyalî avakiribûn û zimanê wî welatî jî kurdî bû. Ji bo sedemên vê nivîskar Umer Şêxmûs di hevpeyvîneke Cafê Nûdemê de wiha dibêje,

*“Çend faktorên serekî û bingehîn hene ku di vê yekê de rolê dilîzin. Yek jê ji salên sihî û hata niha partiya Sosyaldemokrat li Swêdê hakim bûye. Dudo, di dema ku kurd hatine Swêdê de sosyaldemokratên Swêdê politikayek ji sosyaldemokratên din çepîr dimeşand û di vê politikayê de jî piştgirî û dostaniya gelên bindest hebû. Hem pozîsyona sosyaldemokrasiya Swêdê ji ya partiyên sosyaldemokrat yê Ewropa cihê bûn, hem jî raya giştî ya Swêdê bêtir humanîter bû. Ji ber vê yekê gelek kurd hatin Swêdê û ev kurdên ku hatin Swêdê jî bi piranî çepên kurd bûn. Loma mobîlîzekirina wan hêsantir bû.”<sup>71</sup>*

Van şert û mercên xwezayî ji bo kurdên li Swêdê cih bûbûn wê îmkanê çê kir ku ew li ser kurdîyê hûr bibin. Ji ber ku van kurdên li vir cih bibûn bi piranî siyasî bûn û ji bo demeke dirêj dê li wir nemana, ew digotin ji xwe em ê ji bo wexteke dirêj li vir nemînin û vegehin Kurdîstanê û madem em vedigerin em destvala venegerin. Ji bo vê yekê gava ew têne Swêdê, li her bajarê ku ew lê bi cih dibin komeleyan ava dikin û di wan komeleyan de dest bi xebata demokratîk û kulturî dikin.<sup>72</sup> Kurdên ku li Swêdê cih bibûn bi piranî kurdên Turkiyê bûn û ew pêşîya ku werên Swêdê jixwe di nav tevgerên siyasî yê demokrat de cih girtibûn, ji ber vê yekê jî ew di hêla demokrasiyê de pêşketî bûn. Ew jî alîkarê wan bû ku ew zû têkevin nav tevgerên demokratîk.

Zimanê kurdî xalek ji xalên girîngtirîn bû ji bo kurdên Swêdê. Ew di civînên xwe de kovar û rojnameyên xwe de her wext zimanê kurdî bikar dihanîn. Lê, dema van kurdan li welêt bûn bi piranî Tirkî bikar dihanîn û kurdên welatên din yê Ewropayê jî bi piranî di civînên xwe û weşanên xwe de zimanê Tirkî bikar dihanîn. Gelo çî bû sebeb ku kurdên Swêdê giranî bidin zimanê kurdî? Sebebek vê ji hêla Firat Cewerî ve wiha hatiye ziman,

*“Gava kurdên bakûr hatin Swêdê, bi kurdên parçeyên din re ketin têkiliyê, bi hev re komele û federasyon ava kirin, hingî dîtî ku heger ew di axaftina tirkî de serhişkiyê bikin, ew û kurdên parçeyên din wê ji hev têngihîjin. Loma ew mecbûr man û hêdî hêdî li zimanê kurdî vegehiyan. Gava li zimanê kurdî vegehiyan û zimanê xwe bi dest xistin, êdî şexsiyet û nasnava xwe di zimanê xwe de dîtî. Loma heta ji wan hat xwe li zimên pêçan...”<sup>73</sup>*

<sup>71</sup> Firat Cewerî, “Cafê Nûdem”, Nûdem, j.37, (Bihar 2001), r.6

<sup>72</sup> Cewerî, h.g, r.9

<sup>73</sup> Cewerî, h.g, r.11

Kurdên Swêdê her wekî me got bi niyeta salek an du salan ve hatibûn Swêdê lê ev bû bîst û sih sal û zêdetir. Nivşên nû gihîştin, ew hêviyên mezin nehatin cih û astengên din bûn sebebê ketina aktîvbûna vê civatê. Lê dîsa jî civata kurdan ya Swêdê hem di dîroka nivîs û edebiyata kurdî de ciheke baş girtiye hem jî tevgerên xwe bi saya înternet û navgînên ragihandinên din ve têkiliyên xwe bi hemû kurdan re danîne û aktîvîteyên xwe berdewam dikin. Ew aktîvîteyên wê demê de pêk hatine, ew pirtûk û kovarên wê demê de hatine derxistin nuha li welêt careke din ji hêla weşanxaneyên welat ve têne çapkirin û ji bo xwendevanên kurdan dibine çavkarinên gelek baş. Nivîskarên wê derê gihîştîne nuha jî gelek berhemên biqîmet diafirînin.

### 2.2.2. Kurdên Almanyayê

Her wekî me got ji bo mijara diyasporaya kurdan ya li Ewropayê zelaltir bibe em ê behsa kurdên koçê hin welatên Ewropa kirine bikin. Ji ber ku kurd herî zêde koçê Almaniya, Fransa û Swêdê kirine em ê behsa rewşa wan kurdan bi kurtasî bikin. Dewletên welatê kurdan bi rê ve dibin ne tê de, Almaniya ew dewlet e ku herî zêde kurdan di nav xwe de dihevine. Koça kurdan ya ji bo Ewropa û bi taybetî jî ya ji bo Almaniya ne nû ye û pêvajoyeke dirêj de derbas bûye. Hê di sedsala 18an de, zarokên halxweşên kurdan û yên di xizmeta Împaratoriya Osmaniyan û farisan de an ji bo xwendinê yan jî ji ber karên dîplomatîk berê xwe didin bajarên cure yên Almaniya û welatên din ên Ewropayê.<sup>74</sup> Ji bilê van koçberan koça herî bi nav û deng ya di encama wê peymanê de pêk hat ku di navbera dewleta Turkiyê û Almanyayê de di sala 1961ê de hat îmzekirin. Gelek kurdên Turkiyê wek “karkerên mêvan” çûn Almanyayê. Vê koça pey vê peymanê, koçên encama tevgerên siyasî şopandin. Darbeyên 1971 û 1980 û pevçûn di navbera dewleta Turkiyê û hêzên kurdî de jî bûn sebeb ku ev koç berdewam bike. Faktoreke din ya bingehîn ya ji bo koçê jî ev e ku hatina keç û xortên kurdan a Almanyayê ya ji bo zewaca bi kes û nasên xwe yên li Almanyayê re ye.<sup>75</sup>

Hejmara kurdên li Almanyayê ne tam bellî ye. Ji ber ku dema ev kurd koçê Almanyayê dikirin ne bi nasnameya kurdî lê bi nasnameya dewletên ku ew bi rê ve dibirin ve dihatin nasîn. Yanî dema kurdek ji Turkiyê biçê Almaniya an jî dewletên din yên Ewropayê ew wek tirk tê nasîn. Ev rewş jî ji bo gihîştina hejmara teqes ya kurdên Almaniya û welatên din astenga herî mezin e. Li ser kurdên Almanyayê lêkolîner Zekî

<sup>74</sup> Zekî Ozmen, **Kurdên Almanyayê**, Çapa Yekemîn, Amed: Weşanên Ronahî, Berfenbar, 2010, r.12-13

<sup>75</sup> Ozmen, h.b, r.13

Ozmen di xebata xwe de li ser hejmara kurdên Almanayê gelek agahî dide û di encamê de digihêje vê yekê;

*“Ne mumkun e ku mirov bigihêje encameke sedî sed a di derbarê hejmara kurdên li Almanayê de. Lê belê di nava raya giştî de bi texmînî hejmara kurdan wekî li derdora 700 hezar heta 800 hezarî tê nîşandan. Dema ez hejmara serîlêdanên penaberiyê bidim ber çavan û heta astekî li gor texmînên xwe nêzikî teoriya Kizilhan bibim, ez digihim wê qenaetê ku hejmara kurdên Almanayê bi awayekî giştî bi kêmasî ve milyonek e. Ev hejmar hejmara herî bi mantiq e û çavkanî jî vê yekî realist dikin.”<sup>76</sup>*

Rewşa perwerdehiya bi zimanê kurdî li Almanayê li gor rewşa Swêdê gelek xirab bû. Her çiqas kurdên li Almanayê ji yên Swêdê gelek zêdetir jî bûn mafên bi zimanê zikmakî li Almanayê gelek sînorkirî bû. Di qanûna Almanayê de ji bo bi zimanê zikmakî perwerdehiyê qanûn hebûn lê divê hê di destpêkê de were gotin ku zimanê zikmakî ne mîna zimanê ku dayika zarokan diaxive hatiye bilêvkirin, zimanê fermî yên dewletên ku zarok ango dê û bavên zarokan jê hatine hatiye qebûlkirin.<sup>77</sup> Ev jî dibû sebeb ku kurd ne bi zimanê xwe lê bi zimanê tirkî, farisî û erebî perwerdehî hildin. Li hemberê vê biryara hukumeta Almanan hê di serî de eyaleta Nidersachsenê bertek da û zimanê kurdî qebûl kir û di nav pêvajoyê de eyaletên din jî li hember vê çewtiyê derketin. Dema dersên kurdî li Alman hate dayîn vê carê jî pirsgirêka kêmasiya xwendekaran derket. Ji ber vê yekê bi zimanê zikmakî perwerdehî û giringiya ji bo zimanê kurdî tu carî li Almanayê cihê ku heq dike negirt. Ne tenê di hilbijartina dersên bi zimanê kurdî de lê kurdên Almanya di jiyana rojane de jî qeymeta ku kurdên Swêdê didan kurdî nedane ji bo zimanê xwe.

Gelek rojname û kovar ji hêla kurdên Almanayê ve derdiketin û ev rojname û kovar ji hêla kes û rêxistinên curbicur ve dihatin derxistin. Em ê di vir de behsa çend rojnameyên bingeşîn bikin. Rojnameya *Berxwedan* di sala 1985an de li Almanayê dest bi weşana xwe kir û di sala 1995an de dawî li weşana xwe anî. Her çiqas Rojnameya *Yenî Ulke* li Stenbolê derdiket jî, ev rojname li Almanayê dihate peydakirin. Xên ji *Yenî Ulke* rojnameyên heman xetî de wek *Ozgur Gundem* û *Ozgur Ulke* jî li Alman berbelav bûn. Piştî ku *Ozgur Polîtîka* di sala 2005an de ji hêla Wezaretê Karên Hundir a Almanayê ve hate qedexekirin, ji sala 2006an û pê de rojnameya *Yenî Ozgur Polîtîkayê* bi zimanê kurdî û Tirkî dest bi weşana xwe ya rojane kir. Rojnameya *Peyama Kurd* ku

---

<sup>76</sup> Ozmen, h.b, r.44

<sup>77</sup> Ozmen, h.b, r.96

navenda wê Bonn bû û ji hêla PDK-Bakur ve dikat derxistin 2004an de dest bi weşana xwe kir.<sup>78</sup>

### 2.2.3. Kurdên Fransayê

Qedera kurdên Fransayê ji qedera kurdên din yê ku koçê Ewropayê kirine ne zêde cudatir e. Çawa pey peyman di navbera hukumeta Tirkîyê û Almaniyayê de kurd wek “karkerên mêvan” dest bi koça ber bi Almaniyayê kirin, pey wê wek karker li welatên Benelûks, Awistîrya, Swîsre û Fransayê belav bûn. Ev koç ne pêlek lê bi berdewamî domand.

Sebebên van koçan çawa me di paragrafa jor de jî got yek ji wan aboriye. Ango kurd ji ber tengasiyên aborî koçê Ewropa kirin. Paşê sebebê din ya bingehîn jî gengeşiyên siyasî û zordestiya welatên mazûvan yê welatê eslî bûn, ku ev Turkiye, Surî, Iraq û Îran in. Bûyerên siyasî yê ku seba koçê nin mirov wiha dikare bijmire, rejîma Îslamî li Îranê (1979), darbeya eskerî li Tirkîyê (1980) û operasyon û komkujiya Enfalê li Iraqê (1988). “Kampanyaya valakirin û xirakirina gund û bajarokên Kurdên Tirkîyê di destpêka 1990 de û siyaseta qetilkirinê ronakbîrên kurd li aliyê hêzên tirk ên paramilîter ve koçberiya kurdan gurtir kir.”<sup>79</sup>

Hejmara kurdên li Fransayê dijîn jî bi teqez nayê zanîn. Me sebebê vê yekê di binbeşa kurdên Almaniyayê de hanî ziman. Kurd dema dikevin qeydên welatên Ewropayê ne wek kurd lê wek unsureke dewleta ku hatine tîn qebûl kirin. “Kurd ji demeke nêz ve li Fransayê bi cih bûne û jimara wan bi texmînî li derdora 160 hezarî ye. Ew piranî li bajarên mezin û li paytextên navçeyan dijîn. Ji derveyî Parîsê û navçeya Parîsê, ew li bajarên mezin ên weke Marsîlya, Lyon, Strasbourg dimînin (dijîn).”<sup>80</sup>

Tevgerên kurdên Fransayê yê siyasî û çandî ji tevgerên Swêdê zêdetir nebe jî ji tevgerên kurdên Almaniyayê jî kêmtir nîne. Dema em behsa kurdên Fransayê dikin tiştê ku herî pêşî tete hişê mirovî *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* ye. Serokê enstîtuyê Kendal Nezan di daxwiyaniyeke xwe ya ji bo abora enstîtuyê de ku di sala 2015an de weşand de wuha enstîtuyê dide nasîn, “Bi piştgiriya hukumeta serok Mitterrand ve di sibata 1983an de ev enstîtu hate damezirandin da ku koça kurdan kontrol bike û bi rê ve bibe a a ku di encama herba Îran û Iraqê û cuntayên li Tirkîyê dest pê kir. Ev enstîtu kurdan

<sup>78</sup> Ozmen, h.b, r.132-133

<sup>79</sup> Salih Akin, *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*, Stanbol: Çapxaneyê Avestayê, 2013, r. 164

<sup>80</sup> Akin, h.b, r.164

hanî rojeva gel. Ev jî bû sebep ku kurd û çand û dîroka wan di nav millet de were nasîn. Di demeke kin de ev enstîtu bû referans ji bo Ewropayî û kesên ku kurd bala wan dikişînin.”<sup>8182</sup> Ango enstîtu ji bo xebatên kurdan û ji bo ku kurdan ji dunyayê bide nasîn ciheke girîng girtiye.

Ji bilî enstîtuyê gelek tevgerên siyasî yên kurdan wek hemû welatên Ewropayê li Fransayê jî pêk dikatin. Kurdên li wê derê nasnameya xwe ya neteweyî xwedî derdikevin û “weke seferberbûna wan a di meş û mîtîngên ji bo mafên xwe yên çandî û zimanî jî nîşan dide, Kurdan li Ewropayê toreke komeleyî û civakî saz kirine. Bêguman, pîrozkirina cejna Newrozê (21ê Adarê) yek ji van seferbûn a herî girîng e.”<sup>83</sup>

---

<sup>81</sup> Kendal Nezan, “*France’s injustice to the Kurds*”, 10 February 2015, r.1  
[http://www.lemonde.fr/idees/article/2015/02/10/injustice-francaise-envers-les-kurdes\\_4573389\\_3232.html?xtmc=kendal\\_nezan&xtcr=1](http://www.lemonde.fr/idees/article/2015/02/10/injustice-francaise-envers-les-kurdes_4573389_3232.html?xtmc=kendal_nezan&xtcr=1) (15.06.2015)

<sup>82</sup> Min ev nivîsê ji versiyona vê daxwiyaniya Kendal Nezan a ji zimanê inglîzî wergeran.

<sup>83</sup> Akin, h.b, r.165

## BEŞA SÊYEM

### NASÎNA KOVARA NÛDEMÊ

#### 3.1. ARMANCA NÛDEMÊ

Di nîveka duyem a sedsala 20î de, ji hemû parçeyên Kurdistanê, kurd li ser rêyan ketin û ber bi Ewropayê, dest bi koçeke berdewam kirin. Ev koç hin caran ji ber astengiyên aborî yên li welêt derdiket meydanê û carinan jî sedemine siyasî rê li vê koçê vedikir. Di encama van koçên berdewam ên li Ewropayê, nifûseke xurt a kurdan li Ewropayê civiya. Bi taybetî pêla koça piştî cûntaya sala 1980yî ya li Tirkîyê, komeke mezin a rewşenbîrên kurdan jî di nav vê nifûsê de cihê xwe girt. Siyasetmedar û rewşenbîrên kurd ên li Ewropayê li vê derê bi cih bûn û li dinyayeke azad rast hatin. Ev azadî ji bo aktîvîteyên wan ên siyasî û çandî firsendeke zêrîn xiste destê wan. Hin dewletine Ewropayê piştgiriye didan xebatên çandî û hunerî û ev jî ew xwesteka rewşenbîrên kurdan a ji bo xebatên çanda kurdî gurtir kir û di encamê de gelek xebatên hêja yên çand û zimanê kurdî derketin holê.

Kovara *Nûdemê* di vê atmosferê de hate derxistin. Ev atmosfer û şert û mercên li welêt di şikilgirtina kovara *Nûdemê* de bûn diyardeyên bingehîn. Li welêt bi taybetî li bakurê Kurdistanê dewleta Tirkîyê zimanê kurdî înkâr dikir û axaftin, nivîsîn, perwerdehî û her cureyên din ên aktîvîteyên bi zimanê kurdî qedexa kiribû. Ev jî bibû sebep ji bo paşdemayîna zimanê kurdî di qada zanist û edebiyatê de, bi taybetî jî di qada edebiyata nûjen de. Wek gelek rewşenbîrên kurdan, xwedî û berpirsiyarê kovara *Nûdemê* Firat Cewerî valahiya kovareke hunerî, edebî û kulturî<sup>84</sup> ji bo zimanê kurdî her wext di civînên curbecur de dihanî ziman û vê projeya xwe ya kovara *Nûdemê* li ser vê xîmê ava kir. Ango armanca vê kovarê çawa di hejmarê yekem a vê kovarê de tê gotin ev bû: “Armanca wê ya sereke ew e ku di rêya gel de be, ji bo vejandina zimanê kurdî û ji bo pêkanîna edebiyata kurdî ya nûjen bibe bingeh”<sup>85</sup>

Welatê kurdan ji hêla çar dewletan ve tê birêvebirin. Ev dewlet, Tirkîye, Îran, Irak û Suriye ne. Ev parçebûyîn kurdên van parçeyan ji hêla çand û jiyanê ve ji hev dûr xistiye û bûye sedem ku kurd ji hev bê hay bimînin. Ev bêhaybûn jî bi xwezayî bûye sebep ku kurdên parçeyek ji aktîvîteyên edebiyat, hûner û çandî yên parçeyên din bê

<sup>84</sup> Firat Cewerî, “Çend Gotin”, *Nûdem*, j.1, (Bihar 1992), r.3

<sup>85</sup> Cewerî, h.b, r.3

xeber bimînin û edebiyata her parçeyêke welêt serbixwe û ji parçeyên din qetiyayî geş bibe. Di vê rewşê de ji bo avakirina edebiyateke hevpar, diyaspora îmkanake baş e. Ji bo ku van cudahiyan ji holê rakin û edebiyateke hevpar pêk bînin, rewşenbîrên kurdan li gor xwe rê û rêbaz afirandine. Yek ji van rewşenbîran jî nivîskar Firat Cewerî ye ku projeya wî jî *Nûdem* bû ku bi salan bû li ser difikirî. Ji bo vê mijarê di rûpelên kovara *Nûdemê* de ev dertên pêşiya me:

*“...lê hevkarên kovarê ji hemû parçeyên Kurdistanê ne û bi vî awayî em ê bi hêsanî bikaribin di derheqa edebiyata kurdên Iraqê, Îranê, Sûriyê, Sovyetê û Ewropayê de nûçeyên nû bibihîzin û kovar wê bixwaze bi vî awayî di navbera kurdên parçekirî de bibe pireya hevdunasînê û hevdubihîstinê.”<sup>86</sup>*

Ekîba kovara *Nûdemê* bi projeya *Nûdemê* dixwast zimanê kurdî aktuel bike, edebiyata kurdî bi taybetî ya nûjen geş bike, zimanê kurdî pêş bixe ku ev salan e di bin pişaftinê de ye û nikare pêş bikeve, nivîskarên di asta dunyayê de bigihîne ango bi ekoleke nû ve derê meydana nivîsînê. Di vê babetê de, di *Nûdemê* de wiha derbas dibe: “Ger wek em fikirîne em bi ser kevin, wê kovara me bi xwe re ekolekê bigihîne. Ev ekola ku bi kovara me re bigihê, hêviya me ew e ku di pêşerojê de navên wan di rex navên nivîskarên dinyayê yên navdar de bêne dîtin.”<sup>87</sup> Naveroka kovara *Nûdemê* li gor naveroka kovarên edebî, hunerî û çandî xerîb nebû. Di navroka wê de,

*“Çîrok, helbest, parçeroman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, werger, edebiyata dinyayê ya modern û klasîk, klasîkên kurdî, xelatên navneteweyî, sînema, tiyatro, nivîsên li ser edebiyat, huner û kulturê, wêne, karîkator û hwd. Ji bilî van jî bêyî ku em ji çarçova kovarê bi dûr kevin, em ê di pêşerojê de bikaribin hin nivîsan lê kêr, an jî lê zêde bikin.”<sup>88</sup>*

Em dikarin ji reklamên kovara *Nûdemê* jî armanc û awayê xebata vê kovarê fêm bikin. Di reklamekê de wiha derbas dibe:

*“Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyariyeke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ! Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar parçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsa bibe aboneyê NÛDEMÊ! Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bikî, bibe abone!”<sup>89</sup>*

Me li jorê jî behs kir ku welatê kurdan ji hêla pênc dewletên cuda ve tê birêvebirin û kurd ji ber rewşa xwe ya sosyo-polîtîk li dinyayê belav bûne. Her dewleta ku kurdan bi rê ve dibe xwediyê qanûnên birêvebiriyê yên curbicur in, bûyer û tevgerên wan

<sup>86</sup> Cewerî, h.g, r.3

<sup>87</sup> Cewerî, h.g, r.3

<sup>88</sup> Cewerî, h.g, r.4

<sup>89</sup> Nûdem, “Bibe Aboneyê Nûdemê”, *Nûdem* j.11, (Payîz 1994), r.113

welatan, xwediyê karekterên curbicur in, miletên wan dewletan, zimanên wan dewletan cuda ne. Ji ber ku piraniya van dewletan di erdnîgariya rojhilata navîn de cih digirin, di van dewletan de gengeşiyên nûjeniyê, muhafazakariyê, sekuleriyê, komînîzm û kapîtalîzmê pir aktuel in. Di nav tevgerên kurdan de ev rewş dubendiyên gelek kûr pêk anîne. Dema ku em li kurdên Ewropayê dinêrin, her wekî ku di gelek cihên *Nûdemê* de jî tê vegotin, van dubendiyên li welêt bi tundûtûjtir li Ewropayê dewam kirine. Em ê di beşa pêş a vê tezê de jî bînin ziman, taybetiyeke bingehîn a diyasporayê gengeşiya di navbera grûb û rêkxistinên van miletan de ne. Ev gengeşî hin çarçoveyê wê merheleyê ku ev grûb û rêkxistin êdfî dibin dijminên hevdu. Di vê çarçoveyê de dema em atmosfera dema destpêka kovara *Nûdemê* dinêrin, em dibînin ku ev rewş pir berçav e. Ev rewş tesîra xwe li vîzyona *Nûdemê* jî kiriye û ew biryar dane ku ji hemû fikr û îdeolojiyên kurdan, hemû rêkxisin û grûbên kurdan re rûpelên xwe vekin. Di *Nûdemê* de, gelek çarçoveyê de dîtî ku binê vê mijarê hatiye xêzkirin. Wek mînak di hejmara kovara *Nûdemê* ya 11an de nivîseke wiha derbas dibe:

*“Nûdem Kurdistanîbûna xwe didomîne. Ev jî tê wê maneyê ku rûpelên Nûdemê ji her kurdî re vekirî ne. Nûdem li îdeolojî, li herêm, li temen û navan nanihêre, ew tenê nivîsan hildibijêre; nivîsên edebî, humerî, çandî û ji her celeb dijminatîya kes û rêkxistinên dîn...”<sup>90</sup>*

Di vîzyona *Nûdemê* de hatiye diyarkirin ku ew her çar dijminatîya kes û rêkxistinên dîn e. Lê di encama vê rewşê de hin teşqeke derdiketin meydanê, ji ber ku di *Nûdemê* de reklamên weşanên rêkxistin û grûbên kurdan ên dijberî hevdu û nivîsên kesên dijberê hevdu derdiketin. Ev jî dibû sedem ku ew grup û rêkxistin kovara *Nûdemê* wek weşaneke wan grup û rêkxistinên dijber bibînin. Mesela, ji bo vê rewşê bûyera Mahmûd Baksî baş terîf dike. Ev bûyer li bajarê Uppsalayê yê Swêdê, li mala Reşo Zîlan, piştî derketina hejmara ewil a *Nûdemê* pêk hatiye. Bi munesebeta civîna *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* ya li Swêdê çê bûye, hin rewşenbîrên kurd li Swêdê civîyane. Firat Cewerî jî xwestiyê *Nûdemê* bi wan bide nasîn. Dema Firat Cewerî *Nûdemê* pêşkeşê wan dike, bertekeke tund ji hêla Mahmûd Baksî ve tê û ev bûyer jî di rûpelên *Nûdemê* de wiha derbas dibe, “Demekê bêdengiyek çêbû, dû re rehmetyê Mahmûd Baksî tiliya xwe danî ser reklama rojnameya *Welat* û got: ‘Ev çi ye? Yê min ez vê kovarê naxwînim. Apocî vê kovarê derdixin û her kes zane ku rişma apociyan di destê

<sup>90</sup> Nûdem, “Agahdariyek Ji Bo Xwendevan û Nivîskarên Nûdemê”, Nûdem, j.11, (Payîz 1994), r.79

kê de ye.”<sup>91</sup> Çawa ku Mahmûd Baksî vê rexneyê li vê kovarê kiriye, dema hevpeyvîneke bi Mahmûd Baksî re di *Nûdemê* de tê weşandin vê carê bertekên cuda derketine. Meseleya vê jî wiha derbas dibe:

*“Min bang Mahmûd Baksî kir, ew û Mahmed Uzun hatin mêvandariya min û min ji bo hejmara 2an bi Baksî re sohbetek kir. Vêca piştî derketina hejmara dudan hin xwendevanên bi ser PKKê ve jî gotin; ‘Nûdem kovareke baş e lê mirovên wek Baksî .... tê de tunebin dê baştir be.’”<sup>92</sup>*

## 3.2. NÛDEM, ZIMAN Û EDEBIYAT

### 3.2.1. Zimanê *Nûdemê* û Standardîzasyona Zimên

Rewşa zimanê kurdî jî di salên weşana *Nûdemê* de li ber çavan bû. Ji ber rewşa sosyo-polîtîk a kurdan di zimanê kurdî de standartek tunebû û kesên ku bi zimanê kurdî dinivîsîn jî, bi taybetî jî zaravayê kurmançî, di encama xebata xwe ya şexsî de hînê nivîsîna zimanê kurdî bibûn. Ango di dawîya perwerdeyêke fermî de zimanê xwe hîn nebibûn. Ev rewş jî ji bo nivîs û standardîzasyona kurdî bi xwe re gelek kelem û arîşeyan anîbû. Der barê standarda ziman a di *Nûdemê* de Firat Cewerî wiha dibêje:

*“Nûdemê di dema xwe de standarteke zimanê kurdî ava kiribû. Piraniya nivîskarên Nûdemê hewl didan ku wek hev binivîsin. Min bi xwe jî, bêyî ku ez dilê nivîskaran bihêlim, gelek caran midaxeleyî nivîsan dikir, zimanê wan sererast dikir û dikir ku hewayeke wekhev ji nivîsan bê.”*

Pirsgirêkên zimanê kurdî dema dibe mevzûbehs, pirsgirêka ewil dertê pêşberî me, pirsgirêka zaravayan e. Her wekî em dizanin di zimanê kurdî de çar zaravayên sereke hene; kurmançî, soranî, zazakî, goranî. Ji van çar zaravayan du zarava hene ku di qada nivîsîn û xwendinê de pêş ketine, zaravayê kurmançî û yê soranî. Bi piranî kurmançîxêver bi soranî fêhm nakin û soranîxêver jî bi kurmançî. Dema em *Nûdemê* dinêrin em dibînin ku di vê barê de tiştin hene. Di hejmarên serî yê *Nûdemê* de em rast li nivîsên soranî û zazakî tînin lê em nizanin ka bi vê yekê hatiye xwestin ku kesên bi zaravayên cuda dixwînin bila bikaribin bi her zaravayî bixwînin? An gelo xwestine pireyek di navbera zaravayan de çê bikin? Em nikarin vê yekê fêhm bikin lê em ji tişteke din dikarin fêhm bikin ku wan xwestine pirek di navbera zaravayan de çê bikin. Ew tevger jî ev e ku di hin nivîsên *Nûdemê* de dema ji çavkaniyêke ji zaravayê soranî jêgirtin hatiye kirin, wê bi zaravayê kurmançî na lê bi zaravayê soranî rasterast nivîsîne.

<sup>91</sup> Firat Cewerî, “Çîroka Min û Nûdemê”, *Nûdem*, j.39-40, (Payîz-Zivistan), r.13

<sup>92</sup> Cewerî, h.b, r.14

Em dikarin nimûneyek ji hejmara 4an ya *Nûdemê* ji nivîsa Hazim Kiliç a bi navê *'Riya Hêviyê'* ji bo vê mijarê bînin. Di vê nivîsê de, ji nivîseke soranî ya ji kovara *Jînê* jêgirtin hatiye kirin û pey vê jêgirtinê bêyî ku kurmanciya wê were nivîsîn ev nivîs bi soranî hatiye nivîsîn.

Pirsgirêkeke din a zimanê kurdî jî cudahiya di navbera devokan de ye. Bi taybetî ji bo kurmacî û nesitandartbûyîna hin tiştan. Di nivîsên *Nûdemê* de em rast li gelek devokên kurmacî tîn û ev rewş hin caran dibe pirsgirêk ji bo fêhmkirinê, lê pirî caran jî ji bo kurdiyeke dewlemendtir bi kêr tê. Dîsa standarta ji hêla Celadet Alî Bedir-Xan ve hatiye çêkirin hin caran ji bo xatirê devokan hatiye binpêkirin. Bo nimûne, di hin nivîsên *Nûdemê* de daçekên 'di...de' 'bi...ve' wek 'di...da' û 'bi...va' û hwd. hatiye nivîsîn û ev li gor standardê nehatiye sererastkirin.

Yek ji pirsgirêkên mezintirîn ên zimanê kurdî û ji bo zimanên din ên bindest jî ku ew di bin bandora zimanên din de mane. Di vê barê de ji bo kurmacî xebateke baş a Engîn Opengîn heye. Di wê xebatê de li ser vê pirsgirêkê hatiye sekinîn. Em ê di vir de bi kurtasî behsa vê rewşê bikin. Opengîn dibêje;

*“Li ser vê paşxaneyê danûstandina zimannasî û rexneya edebî, em dê xwe bispêrin têgehên meydana “kontakta zimanî” an jî temasa zimanan (language contact). Fikra berbelav di vê meydana vekolînê de ew e ku di temasa zimanan de du an jî zêdetir sîstemên zimanî li hev diqelîbin, anku yek bi rêya wergirtina forma an jî avaniyên zimanê serdest, bêtir mîna wî zimanî lê tê. Ev yek bi giştî bi du rengan dibe: “qerzkirin” (an jî deynkirin, borrowing) û “levqelibîn” (convergence)”<sup>93</sup>*

Her wekî em dizanin kurd perwerdeya xwe bi zimanên serdestan digirin û di malên xwe de û bi hevalên xwe re kurdî diaxivin. Piştî vê merheleyê dest bi nivîsîn û xwendina kurdî dikin û ev jî girêdayî xwestekê ye. Ji ber vê yekê, li gor zanista zimannasîyê, di hişên mirovên pîrzimanî de repertûareke zimanî dertê meydanê û ev kes eger ew zimanên ku dizane baş nizanibe, dibe ku dema ew zimanekî bi kar bîne, ji zimanên din alîkarî hilde. Ev alîkarî bi du cûreyan dibe, yek alîkarîgirtina ji peyvên zimanê din û du, alîkarîgirtina ji straktûra zimanê din. Em hem di çapemeniya kurdî de hem jî di pirtûkên demên hevçerx de vê deynkirin û levqelibînê dibînin. Dema em li *Nûdemê* dinêrin, em rast li van cûre xerabiyên ziman tîn. Nivîskar bi gelemperî di bin bandora wan zimanan de mane ku ew bi wan perwerde hildane û bi profesyonelî bi kar

<sup>93</sup> Ergin Öpengin, *“Repertûara Zimanî û Afirandina Edebî: Nirxandineke Zimannasî li ser Edebiyata Kurmacî ya Hevçerx”*, ji navê *Tîr û Armanc*, Editor: Ramazan Alan û Engîn Opengîn, Weşanxaneyê Peywend, Amed, 2014, r.175

tînin. Bi taybetî wan zimanên ku aîdê malbata zimanên Hînt-Ewropî ne, wan zimanan bandora xwe pirtir li ser kurdî hiştine. Lê zimanê wekî Tirkî ku aîdê malbata zimanên Ural-Altayê ne jî bandora xwe li ser kurdî hiştine û vê bandorê ji hêla straktûra kurdî ve gelek zirarên cidî daye kurdî. Ev rewş jî di kovara *Nûdemê* de berbiçav e.

### 3.2.2. Çapxaneyê *Nûdemê* û *Nûdem Werger*:

*Nûdem* ne tenê navê kovarekê bû lê her wisa navê çapxane, cafê û kovareke din a bi navê *Nûdem Werger* jî bû. Çapxaneyê *Nûdemê* pirtûkên ji edebiyata klasîk û modern a dunyayê û edebiyata nûjen a kurdî diweşand. Di pêvajoya derketina *Nûdemê* de her wext reklamên *weşanên Nûdemê* di kovara *Nûdemê* de derdiketin. Di hejmara dawî de em dikarin bigihêjin hemû weşanên ku ji hêla weşanxaneyê *Nûdemê* ve heta wê tarîxê hatiye derxistin. Dîsa hûn dikarin vê lîstê di dawîya vê xebatê de wek pêvek bibînin. (Pêvek 1)

Der barê weşanên *Nûdem* û *Nûdem Wergerê* de Firat Cewerî wiha dibêje;

*“Di wan salan de zêde tişt tunebûn, loma, her valahiya ku min didît min dixwest ez dagirim. Gava min bi weşana Nûdemê re weşanxane ava kir, armanca min ew bû ku ez bingehê weşanxaneyê modern û profesyonel bavêjim. Ji ber ku heta hingî tiştêkî serbixwe tunebû. Armanca min bi derxistina kovara Nûdem Werger jî her ew bû. Ji ber ku min pîr guh dida wergerê û ez bawer bûm ku edebiyata kurdî ancax bi wergerê bikemile û bibe şîrîka edebiyata dinyayê. Fikra min a di derheqê wergerê de hê jî ev e”*

Weşaneke ku ji hêla koma *Nûdemê* ve dihat derxistin *Nûdem Weger* bû. Di vê kovarê de vê komê xwestiye ku ji wergerên çîrok û helbestan wêdetir wergerên teoriya edebiyatê, tevgerên edebî û dîroka edebiyatê biweşîne. Em agahiyên birêkûpêktir dikarin di reklameke kovara *Nûdemê* de bibînin. Di wê derê de di vê barê de wiha derbas dibe;

*“Polîtîkaya NÛDEM Werger jî wê mîna ya NÛDEM demokratîk û serbixwe be, bi gotineke din wê Kurdistanê be, Wê salê du hejmar derkevin, ango biharan û payîzan û wê her hejmarek ji dusedî (200) heta çarsed (400) rûpelî be. Wê ebada wê ji kovara Nûdemê meznintir be lê wê nêzîkî karektera wê be... Heta ji me bê, em ê wergerên ji zimanên orîjînal bikin. Ji niha ve hevalên me li seranserê dinyayê dest bi wergerên ji zimanên mîna îngilîzî, almanî, fransî, tirkî, swêdî, erebî û hwd, kirine.”<sup>94</sup>*

Elemanên ku ji zimanên biyanî bo kurdî werger dikin ji bo wergeran pêdiviyêke mezin e. Ji bo vê yekê divê zanîngeh hebin an jî saziyên ku van kesan digihînin. Kurd ji van saziyan mehrûm bûn lê di nav pêvajoya xwe ya xwezayî de hin kesên ku xwe pêş

<sup>94</sup> Nûdem, “Nûdem Werger Dike!”, Nûdem, j.13, (Bihar 1995), r.2

xistibûn derketin ku wergeran ji zimanên orjînal bo kurdî bikin. Ev pêvajoya xwezayî di sê beşan de dimeşîya: yek; ji ber ku kurd ji hêla çar pênc dewletên cuda ve dihatin birêvebirin, bi zimanên desthilatan perwerdeya xwe hildidan û ji wan zimanan bo kurdî dikaribûn werger bikirana. Du; kurd dema perwerde hildidan, ji wan hin kurd di beşên zimanên mezin ên dunyayê de dixwendin wek îngilîzî, fransîzî û fêrî wan zimanan dibûn û ji wan zimanan ji bo kurdî werger dikirin. Sê; kurd tûşê koçê bibûn û li wan welatên ku surgun bûbûn, ew hînê zimanên wan welatan dibûn û ji wan zimanan werger dikirin.

### **3.2.3. Dibistana *Nûdemê***

*Nûdem* dema dest bi jiyana xwe kir gelek armanc dabûn pêşîya xwe. Yek ji wan armancan aktuelhiştina zimanê kurdî û bi zimanê kurdî danasîna edebiyata kurdî û ya dunyayê ji bo xwendevanên xwe bû. Di vê çarçoveyê de em rastî hin çalakiyan tên ku *Nûdem* bi van çalakiyan, xwestiyê xwendevanên xwe perwerde bike. Di nav van çalakiyan de quncika Agorayê, xelata *Nûdemê* û xelata Nobelê heye. Em ê bi rêzê behsa wan bikin.

#### **3.2.3.1. Quncika Agorayê**

Di vê quncikê de ku em di hejmara heştan a vê kovarê de rastî wê tên, pirsên der barê ziman û edebiyata kurdî ya klasîk û nûjen û edebiyata dunyayê ya klasîk û nûjen cih digirin. Ji bo vê quncikê di *Nûdemê* de ev derbas dibe, “Li ser daxwaza hin xwendevan û nivîskarên *Nûdemê*, me bi navê quncikeke nû vekirîye. Di vê quncikê de em dixwazin di warê dinyaya huner û kulturê de bi metoda pirs û bersivê dest bi danûsitandineke din jî bikin.”<sup>95</sup> Ji bo naveroka van pirsan eger em pirsên ewil binêrin, em ê bigihêjin fikrekî. Pirsên ku di *Agorayê* de hatine pirsîn bi vî rengî ne; Xelata Nobelê ya Edebiyatê ji hêla kîjan saziyê ve tê belavkirin, bestekarê “Dansa Ciwanên Kurd” kî ye, navê Berhemeke John Steinberk, berhemeke Bethoven, pirsê der barê Honorê de Balzac, pêşevanê fikrî û edebî yê ekzîstantiyalîzmê kî ye, pirsê der barê Siyahpoş de û hwd. Her wekî ku em ji van pirsan jî fêm dikin ji edebiyata kurdî û ya dunyayê pirsin hatine pirsîn.

---

<sup>95</sup> *Nûdem*, “Agora”, *Nûdem*, j.8, (Zivistan 1993), r.110

### 3.2.3.2. Xelata *Nûdemê* ya Edebiyatê

Çalakiyeke din a *Nûdemê* ye. *Nûdem* salê carekê xwestiye ku di bin navê xelata *Nûdemê* ya edebiyatê de xelatek bide û bi vê yekê re nivîskariya kurdî teşwîq bike. Ekîba *Nûdemê* di daxuyaniya xwe ya vê barê de wiha dibêje, “Ew ê kovara me *Nûdem* ji salê carekê di bin navê “*Xelata Nûdemê ya Edebiyatê*” de xelatek belav bike. Ev xelata ha, ku armanca wê teşwîqkirina nivîskariya kurdî û vejandina edebiyata kurdî ye, wê ji aliyê jûriyeke xurt ve bête belavkirin.”<sup>96</sup>

Piştî ku daxuyaniya *xelata Nûdemê* ya edebiyatê tê kirin di hejmara 7an de daxwiyaniyeke din jî der barê pêvajoya vê xelatê de heye. Li gor biryara lijneyê, ew pêşî dixwazin xelata kurteçîrokan û salên pêş de jî bi jûriyên cihê cihê, ew ê di warê helbest, roman, lêkolîn û resmê de xelatan bidin. Dîsa xwestine ku kurteçîrokên hêjayî çapê ne û yên ku xelat girtine, di nav pirtûkekê de çap bikin. Jûriya *Nûdemê* ya kurteçîrokan ji van kesan pêk dihat; Nacî Kutlay (Nivîskar), Mehmed Uzun (Nivîskar), Rohat (Lêkolîner), Şahînê Bekirê Soreklî (Nivîskar), Fawaz Husên (Nivîskar), Firat Cewerî (Nivîskar).<sup>97</sup>

Rewşa nivîsîna bi zimanê kurdî diyar e û ne pêwist e ku em dîsa behsa wê bikin. Ev rewşa paşdemayî pîrî caran pêşiya çalakiyên edebî bûye astengeke mezin. Ev astengî xwe di *xelata Nûdemê* ya edebiyatê de jî dide hîskirin. Di paragrafên jor de me behsa rê û rêbaza *xelata Nûdemê* kir. Mixabin pirsgirêka kêmasiya çendanî û çawaniya nivîsan derketiye. Ji bo vê di hejmara 10an a kovarê de ev tê gotin:

*“Heta niha nêzîkî deh çîrokan ji bo pêşbaziya Nûdemê ji me re hatine. Piraniya çîrokan ji Sûriyê hatine, hinekên wan jî ji Swêdê ne. Em bi xemgînî dibêjin ku li gorî pîvanên çîroka navneteweyî, çîrokên ku ji Nûdemê re hatine gelekî qels in. Me nikaribû ji nava van çîrokan sê çîrok ji bo xelatê hilbijartina... Em tika dikin, yên ku ji me re çîrok şandine û nav û navnîşana xwe nenivîsîne, ji kerema xwe re ji Nûdemê re binivîsînin, da em li ser çîrokên we agahdariyê bigihînin we û ew pereyên ku me ji bo xelatê diyar kiribû, li we deh kesan belav bikin.”*<sup>98</sup>

Pey vê bûyerê *Nûdem* xwestiye rê û rêbaza xwe ya xelatê biguherîne û ev xelata ku ji bo nivîskarên amator bû veguherîne li ser nivîskarên profesyonel. Wê jûriya *Nûdemê* ji salê carekê, pirtûka ku di salê de derketiye û qîmeta wê ya ziman, edebî û hunerî bilind e, xelat bikira. Lê ev biryar negihişt armanca xwe.

<sup>96</sup> Nûdem, “*Xelata Nûdemê ya Edebiyatê*”, *Nûdem*, j.6, (Bihar 1993), r.1

<sup>97</sup> Nûdem, “*Xelata Nûdemê ya Çîrokan*”, *Nûdem*, j.7, (Payîz 1993), r.1

<sup>98</sup> Nûdem, “*Xelata Nûdemê ya Edebiyatê*”, *Nûdem*, j.10, (Havîn 1994), r.113

Di hevpeyvîna me ya bi Firat Cewerî re, Cewerî der barê xelatên edebiyatê de û ev xelata ku ji hêla *Nûdemê* ve hatibû dayîn, wiha dibêje:

*“Mîna doh, ez îro jî kêmaniya xelateke edebiyatê dibiîm. Heke îro îmkanek têkeve destê min û ez zanibim ez ê bikaribim bingehê xelateke edebiyatê ya berdewam biavêjim, ez aniha wî bingehê deynim. Armanca min ya xelata edebiyatê ya *Nûdemê* ew bû ku ez bi riya xelatkirina nivîskarên ciwan, hem wan teşwîqî nivîsandina edebiyata kurdî bikim û hem jî ez hewayeke erênî ya xwendin û nivîsandina zarê kurdî ava bikim.”*(Pêvek 3)

### **3.2.3.3. Xelata Nobelê**

Xelateke ku “li Swêdê ji sala 1901ê vir ve tê belavkirin. Niha bi navê xelata Nobel di şeş şaxan de; şaxa edebiyatê, aştîyê, fîzîkê, kîmyayê, fîzyolojî û tibê de tê belavkirin. Berpirsiyarê xelata edebiyatê, Akademiya Swêdê ye ku ji 18 kursiyan pêk tê.”<sup>99</sup> Roja ku ev xelat dihat belavkirin, di meha 12an de pêk dihat, ev xelata Nobelê bala nivîskarên kurd ên Swêdê jî dikişand. Ji ber vê yekê em di gelek hejmarên *Nûdemê* de rastê xelatgirê xelata edebiyatê ya Nobelê tên. Di van nivîsan de xelatgir tê danasîn û behsa berhemên wî/ê tên kirin. Dîsa der barê vê xelatê de em di hejmara 4an a *Nûdemê* de rastê nivîseke berfireh tên ku di wir de Swêd, Alfred Nobel û xelata Nobelê tê danasîn. Bi vê yekê re *Nûdemê* bi tarzeke cuda, xwendevanên xwe perwerde dikir. Firat Cewerî di hevpeyvîna xwe de ya bi me re kirî, wiha dibêje; ‘ji ber ku *Nûdem* li welatê Nobelê derdiket û xwediyê *Nûdemê* pir guh dida û hê jî guh dide xelatên edebiyatê.’ (Pêvek 3) ev girîngî ji bo vê xelatê hatiye dayîn.

### **3.2.3.4. Cafê *Nûdem***

Cihên Cafêyên çandî di siyaset û birêvebiriya welatan de ji roja ku ev cafê derketine meydanê vir ve gelek muhim e. Hê di salên 1670ê de li Londrayê birêvebirên hukûmetê bi îdfayên ku li cafêyên Londrayê siyaset tê mineqeşekirin û di encama mineqeşeyên siyasî de rexneyên tûj li hikûmetê tên girtin, avêtine ser hin cafêyan û azadiya wan bi sînor kirine. Dîsa gelek şaîran li Cafêyan şîrên xwe dinivîsandin; an jî şîr, çîrok û gotarên di kovar û rojnameyan de dihatin weşandin, li Cafêyan dihatin nirxandin. Li gelek ji van cafêyan rojnameyên çend rûpel û kovarên edebî derdiketin. Wekî din gelek ji van cafêyan aboneyên bi sedan kovar û rojnameyan bûn.<sup>100</sup> Ji ber vê yekê Firat Cewerî dema li ser projeya xwe ya *Nûdemê* difikirî, dixwest ku vê kovarê li

<sup>99</sup> Firat Cewerî, “Swêd, Alfred Nobel û Xelata Wî”, *Nûdem*, j.4, (Zivistan 1992), r.100

<sup>100</sup> Firat Cewerî, “Rola Cafêyên Kulturî”, *Nûdem*, j.34, (Havîn 2000), r.5

Diyarbekirê derxe û li wir bi navê Cafê *Nûdem* cafêyekê veke ku fonksiyona van cafêyan dibîne. Lê ji ber rewşa siyasî ya Tirkiyê û rewşa kêmbûna entelektuelên kurd û kurdînivîs li Diyarbekirê, Cewerî kovara *Nûdemê* li Swêdê derdixe. Ji ber vê yekê projeya xwe ya Cafê *Nûdemê* jî piştî salên dirêj li Swêdê dide destpêkirin. Ji bo vê yekê em di hejmara 33 ya *Nûdemê* de, di vê barê de rastê reklamekê tên. Reklam wiha ye:

*“Ji vê hejmarê û pê ve em ê sohbet û gotûbêjên edebî, kulturî û entelektuelî yên ku li Cafê NÛDEM dibin, di Nûdemê de pêşkeşî we xwendevanên diloan bikin. Armanca me ew e ku Cafê NÛDEM bi mijar û pisporên cihê, rengê nû bide jiyana kurdan ya hunerî, edebî, çandî û enelektuelî. Cafê NÛDEM, meydana fikr û ramanên cihê, agoraya întelgensa kurdan e. Li bendê bin!...”<sup>101</sup>*

### 3.3. ABORIYA NÛDEMÊ

#### 3.3.1. Astengên Aborî

Pirtûk, kovar, rojname û cureyên din ên weşanan ji bo bîr çapkirin hêzeke aborî lazim e. Bi taybetî kovar û rojname ku ne carê tenê lê bi periyodên diyarbûyî têne çapkirin, zêdetir girêdayî hêzeke aborî ya berdewam in. Çavkaniyên aborî yên van weşanan herdemî hin caran dewlet in, hin caran kes in, hin caran reklam in, hin caran weqf û partiyên siyasî ne û pirî caran jî abone û xwendevanên van weşanan demdemî ne. Di dîroka çapemeniya kurdî de her wext ji destpêkê heta roja îro yek pirsgirêkeke girîngtirîn a çapemeniya kurdî, pirsgirêka aborî bûye. Ji bo fêhmkirina sebebên vê pirsgirêkê, em divê li çavkaniyên aborî yên weşanan binêrin ên ku me li jor behsa wan kir.

Çavkaniya herî bihêz dewlet e. Dema em rewşa sosyo-polîtîk ya Kurdistanê dinêrin em dibînin ku ji bilî perça Iraqê û ji bo demeke kin li Sovyeta Kevî tu carî piştgiriya dewletê ji bo çapemeniya kurdî çê nebûye heta van dawîyan ku dewleta Tirkiyê piştgiriya da çapemeniya kurdî. Dîsa wek çavkaniyeke herî bihêz ji çavkaniyên aborî yên çapemeniyê di jiyana kapîtalîst de reklam in. Lê belê dîsa ji ber rewşa sosyo-polîtîk a Kurdistanê ev çavkanî jî ji bo finansmanê kêr nehatiye. Ji ber ku pirî caran tu şîrket naxwaze navê wê di weşanekê de derkeve ku dewlet li hemberê wê ye. Ev sedem jî bo şexsan jî pirî caran derbasbûyî ye. Çimkî tu şexsekî dewlemend naxwaze dewletê bide li hember xwe.

Di vê rewşê de du çavkanî tenê dimînin ji bo çapemeniya kurdî, ew weqf û partiyên siyasî û abone û xwendevan in. Ji van çavkaniyan weqf û partiyên siyasî pirî

<sup>101</sup> Nûdem, “Cafê Nûdem”, Nûdem, j,33, (Bihar 2000), r.138

caran piştgiriyê didin wan weşanan ku di pelên xwe de ji bo îdeolojiya wan cih vediqetînin. Ji ber vê yekê bi giranî weşanên serbixwe ji vê çavkaniyê nikarin sûd wergirin. Di vê barê de, di gelek cihên *Nûdemê* de ji vê rewşê gilî tînin kirin û ji partî û rêkxistinên kurdan, welathez û dewlemendên kurdan ji bo geşbûna ziman û edebiyata kurdî piştgirî tê xwastin.

Ji bo rewşa çapemeniya kurdî baştir were fêhmkirin di *Nûdemê* de mîna keke baş hatiye dayîn. Behsa serpehatiyeke weşangerekî pirtûkên kurdî tê kirin. Di wir de wiha derbas dibe:

*“...wî di hundirê çend salan de deh pirtûkên bi naverok û sipehî derxistin. Li gorî agahdariyên weşanger, ji her pirtûkekê pêncî lib jî nehatiye firotin. Loma hêviya wî şikestiye, wî dev ji karên weşanxaneyê berdaye, pirtûkên ku çap kirine li dezgehên kurdan belav kirine û bi wê riyê xwe ji pirûkan pak kiriye.”<sup>102</sup>*

Der barê aboriya *Nûdemê* de, di hejmara 26an a *Nûdemê* de, di nivîsa sereke de, bi hûrgilî li ser vê mijarê hatiye sekinîn. Di serî de, bi gotineke Celadet Elî Bedir-Xan dest pê kirine ku di wê nivîsê de gilî ji nexwendina bi zimanê zikmakî tê kirin. Piştî behsa pêvajoya aborî ya *Nûdemê* tê kirin. Xwedî û berpirsiyarê kovarê *Firat Cewerî* dibêje:

*“Fikra derxistina kovara Nûdemê hê di nava salên 1980ê de di serê min de çêbûbû, lê problema mezin problema aborî bû. Me bi keda xwe ya şexsî ya deh dozdeh salan bingehe aborî danî. Ev bingehe bi hesab bû û wê vî hesabî têra jiyandina Nûdemê ya pênc salan bikira.”<sup>103</sup>*

Her wekî di vir de jî derbas dibe, bingeha aborî ya pênc salan ji hêla xwedî û berpirsiyarê kovarê *Firat Cewerî* ve hatiye avêtin. Gelo *Firat Cewerî* wan pereyan ji ku peyda kiriye? Der barê vê mijarê de dîsa di hejmara dawî ya kovarê de bi hûrgilî agahî hatiye dayîn. Li gor wan agahiyan *Firat Cewerî* li Swêdê ji xwe re pîzzaxaneyek vekiriye û ji ber ku karê wê derê baş çûye wê pîzzaxaneyê bi bihayeke baş firotiye û ji wî pereyî 500 000 kronî ji bo kovarê veqetandiye. Bi pereyên ji wê pereyê maye jî ji bo piştgiriyê di pêvajoya çapbûyîna kovarê de bide kovarê marketek vekiriye.<sup>104</sup>

Welatên demokrat ji bo piştgiriya çand û edebiyatê fînanzman vediqetînin. Her wekî ku em dizanin *Nûdem* li Swêdê derdiket û gelek gotûbêj hene ku dibêjin ev welat weşanan fînanse dikin. Gelo ji bo *Nûdemê* jî fînanmaneke wiha çê bû? Bersiva vê pirsê jî em di rûpelên *Nûdemê* de dibînin. Ji bo vê yekê *Firat Cewerî* dibêje:

<sup>102</sup> *Firat Cewerî*, “Ji bo Çi Kurd bi Kurdî Naxwînin?”, *Nûdem*, j.22, (Havîn 1997), r.4

<sup>103</sup> *Firat Cewerî*, “Nûdem û Aboriya Wê”, *Nûdem*, j.26, (Havîn 1998), r.5

<sup>104</sup> *Firat Cewerî*, “Çiroka Min û Nûdemê”, *Nûdem*, r.39-40, (Payîz-Zivistan 2001), r.9

“Dibe ku hin kes bi vê demokrasiya Swêdê bawer dikin ku Swêd ji bo kovarên kurdî peran dirijîne. Tiştêkî welê tuneye. Mîna gelek welatên dinyayê, wezaretê çandî ya Swêdê jî bi cidiyeta weşanê ve girêdayî alîkariyê aborî dide lê divê weşan xwe bi xwe finansê bikin. Ji 26 hejmarên *Nûdemê*, me jî heqê 5 hemaran alîkarî ji konseya çandî girtiye. Lê mîna gelek kovar û rojnameyan em jî îro ji wê alîkariyê jî bêpar in. »<sup>105</sup>

Em dizanin ku *Nûdem* çil hejmar derketine û ev nivîs di hejmara 26an de hatiye weşandin. Gelo pey vê hejmarê ji hukumeta Swêdê destek hatiye sitandin an na? Ji bo vê yekê Firat Cewerî wiha dibêje: ‘Me deh salan kovar derxist, di hundirê deh salan de, konseya kulturê ya Swêdê alîkariya pênc şeş hejmarên me kir, lê em li ser aboneyên xwe dijiyan.’ (Pêvek 3) Em ji vê fêhm dikin ku kovar di hejmarên hatî de ji hukumeta Swêdê alîkarî nesitandiyê.

Li jorê me got *Nûdem* dema dest bi jiyana xwe kiribû soza pênc salan dabû û aboriya xwe li gor pênc salan eyar kiribû. Lê *Nûdem* ji bo deh salan derketiye. Gelo çi bû sedem ku *Nûdem* wiha emir dirêj be? Li gor ku Firat Cewerî di hejmara dawî de tîne ziman, dema *Nûdem* pêncsalîya xwe tije dike, ji ber ku kar û barên *Nûdemê* baş rûniştine, ji hêla raya giştî ya kurdî ve jî *Nûdem* bi kalîteya xwe ve hatiye qebûl kirin û wek berpirsiyarê kovarê Firat Cewerî jî xwe ji bo pênc salên din amade dibîne, di encamê de biryara pênc salên din tê dayîn.<sup>106</sup> Dîsa di vê biryarê de şevê ku ji bo 5 salîya *Nûdemê* hatiye dayîn jî bi bandor bûye. Di wê şevê de gelek nivîskarên kurd jî beşdarê vê şevê bûne û ev jî şewqeke mezintir ji bo pênc salên din daye.

Ji bo pênc salên duyem ji ber ku ji hêla aborî ve amadehiyek tunebû gelo *Nûdem* çawa jiyana xwe berdewam kiriye? Her wekî tê xuyan di hejmarên pênc salên duyem de em pirtir li rastî nivîsên piştgirî ji bo *Nûdemê* tên. Gelo çend abone tîrî *Nûdemê* dikirin? Di vê barê de Firat Cewerî wiha dibêje, “Ji bo finanskirina kovareke mîna *Nûdemê* 800 abone an jî 1000 abone tîr dike.”<sup>107</sup> Ji bo abonetiya *Nûdemê* em di pelên *Nûdemê* de rastî gelek nivîsên balkêş tên. Mîna jî wan ev e, “Her abonetiyeke *Nûdemê* ji bo avakinina edebiyata kurdî alîkariyek e. Tu jî vê alîkariyê bike û bibe aboneyê *Nûdemê!*”<sup>108</sup> Mîna keke din ji bo wê jî di hejmara 27an a *Nûdemê* de derbas dibe. Di wir de anektodeke balkêş ji kovara *Hawarê* hatiye sitandin. Ew anektod wiha ye, “Ezbenî! Îro ji postê pênc heb *Hawar* li ser navê min hatine. Ez hêvî dikim ji niho û pê de ji min

<sup>105</sup> Cewerî, “*Nûdem û Aboriya Wê*”, r.5

<sup>106</sup> Cewerî, “*Çîroka Min û Nûdemê*”, r.27

<sup>107</sup> Cewerî, “*Nûdem û Aboriya Wê*”, r.5

<sup>108</sup> *Nûdem*, “*Bibe Aboneyê Nûdemê*”, *Nûdem*, j.10, (Havîn 1994), r.107

re hejmarekê bişîne. Ji ber ku kes *Hawarê* naxwîne. (Hebeş Smaîn, Mektele, 24/7/1941)”<sup>109</sup> Cûreyên xwestina alîkariyan di *Nûdemê* de diguherin. Di *Nûdemê* de hin caran hin kes wek mînak dihatin nîşandayîn. Mesela, “Di vê weşana heftsalane de wê rojê ji Norwecê, ji aboneyekî me î bi navê Walîd Saîd heqê abonetiya 1998an 1000 Kronên Norvecî hat. Yanî vî camêrî 700 kron alîkarî ji *Nûdemê* re şandiye. Em çî bêjin, ew destê xwe bavêje axê, ax di destê wî de bibe zêr.”<sup>110</sup>

Piştî ku deh sal qediya gelo *Nûdem* ji ber sebebên aborî rawestiya? Esas *Nûdem* xwestiye pênc saleke din dîsa bijî, heta wê xwestiye di vê pênc salên xwe yên din de jî li welêt bijî, lê ji ber hin sedemên psîkolojîk ên xwedî û berpirsiyarê kovarê Firat Cewerî ev wisa nebûye. Firat Cewerî dibêje, “Lê bi hatina payîzê re ewrekî xemgînîyê xwe bi ser jiyana min a taybet de girt, destê min li kar sist kir, hêviya min çilmisand, ez dilşikestî kirim û bû seba ku *Nûdem* bi tenê di dehsaliya xwe de bimîne.”<sup>111</sup>

### 3.3.2. Di *Nûdemê* de Reklam

Wekî her weşanê, kovara *Nûdemê* jî ji bo reklaman divê pere bista. Ji bo vê yekê, di hejmara yekem de wiha tê gotin: “Rûpela dawî bi reng 2000 Skr, rûpelên nêvî 1200 Skr.”<sup>112</sup> Di dawiya hejmarên *Nûdemê* de hema bêje bi temamî reklamên pirtûkên weşanxaneyên kurdan hebûn û piranî pirtûkên zaravayê kurmancî di vê quncikê de cih digirtin. Wek mînak di hejmara 13an de reklamên van weşanxaneyan hene; Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, Weşanên Welat (Swêd), Weşanên Xanî & Bateyî (Denmark), Weşanxaneya Nûbiharê (Pirtûk bi tirkî ye, Turkiye), Weşanxaneya ABC (Belçîka), Weşanxaneya Pêncînar (Swêd), Weşanxaneya Çanda Nûjen (Swêd), Weşanxaneya Çarçira (Turkiye), Weşanxaneya Jîna Nû (Swêd), Rojnameya heyfeyî Welatê Me (Turkiye), Kovara Nûbiharê (Turkiye). Her wekî em dibînin piraniya weşanxaneyên ku reklama wan hatiye kirin weşanxaneyên kurdan ên li Ewropayê ne û bi taybetî yên li Swêdê ne. Lê di hevpeyvîna me de ya bi Firat Cewerî re, em fêhm dikin ku vê kovarê jî bo reklaman pere nedistand. Firat Cewerî di vê barê de wiha dibêje; ‘mixabin, me jî reklaman pere qezenc nedikir. Reklamên ku me carinan dikir jî reklamên kovar û weşanxaneyan bûn û bi wê jî armanaca me ew bû ku em balê bikişînin ser ziman û edebiyata kurdî.’ (Pêvek 3)

<sup>109</sup> Firat Cewerî, “Hawara Netewî”, *Nûdem*, j.27 (Payîz 1998), r.4

<sup>110</sup> Cewerî, *Nûdem û Aboriya Wê*, r.5

<sup>111</sup> Cewerî, “Çîroka Min û *Nûdemê*”, r.28

<sup>112</sup> *Nûdem*, *Nûdem*, j.1, (Bihar 1992), r.1

*Nûdem* ji ber polîtîkaya xwe, pirî caran reklamên weşanên rêkxistin û grûbên li dijî hev jî dikirin. Ev rewş hin caran dibû pirsgirêk û di hişê hin kesan de wê gumanê çê dikir ku *Nûdem* kovareke girêdayî wan rêkxistinan e. Ji bo vê yekê di hejmara dawî ya *Nûdemê* de mîna keke baş heye. Dema hejmara ewil a *Nûdemê* Firat Cewerî dibe civateke kurdan da ku *Nûdemê* bi wan bide nasîn rastê bertekekê tê. Ew bertek di rûpelên *Nûdemê* de wiha derbas dibe, “Demekê bêdengiyek çêbû, du re rehmetyê Mahmûd Baksî tiliya xwe danî ser reklama rojnameya Welat û got: “Ev çi ye? Yê min ez vî kovarê naxwînim. Apocî vê kovarê derdixin û her kes zane ku rişma apociyan di destê kê de ye.”<sup>113</sup> Paşê Firat Cewerî dixwaze ji Mahmûd Baksî re vebêje reklam çi ye çi nîne lê Mehmûd Baksî guh nade wî, heta ku di hejmara duyem de bi Mahmûd Baksî re hevpeyvînek tê weşandin. Ji ber rewşa sosyo-polîtîk a kurdan ji şîrketan an ji saziyên din ên parçeyên jiyana kapîtalîzmê ne û saziyên fermî yên girêdayî dewletê reklam nehatiye hildayîn. Ji ber vê yekê em di *Nûdemê* de rastî reklamên bi wî şiklî nay ên.

### **3.4.XÎMÊN NÛDEMÊ**

Dema em kovara *Nûdemê* bi gelemperî dinêrin em dibînin ku du sê tiştên sereke henin ku ev kovar xwe diparêze wan. Yek ji wan têkiliya di navbera kovara *Nûdemê* û ya *Hawarê* de ye ku kovara *Nûdemê* xwe wek nîşandana tradîsyona *Hawarê* ve meşrûfiyet ji bo xwe peyda dike. Xîmeke din ya ji bo vê kovarê jî werger in. Di vê kovarê de werger gelekî henin û ciheke girîng ji bo wê hatiye veqetandin. Ji ber vê yekê têkiliya di navbera kovara *Nûdemê* û *Hawarê* û werger û wergervanî û di kovara *Nûdemê* de werger dê dive beşa xebatê de were pêşkeşkirin.

#### **3.4.1. *Nûdem* û *Hawar***

Kovara *Nûdemê* ji gelek aliyan, di bin bandora kovara *Hawarê* de maye û ev bandor bi serfirazî di gelek cihên kovara *Nûdemê* de derbas dibe. Di vê beşê de em ê pêşî bi kurtî behsa kovara *Hawarê* bikin, paşê em ê armanca vê kovarê bidin zanîn û bi armanca kovara *Nûdemê* re bidin ber hev da ku têkiliya di navbera *Hawar* û *Nûdemê* de zelaltir bibe.

---

<sup>113</sup> Firat Cewerî, h.g, r.13

Kovara *Hawarê* ji hêla Mîr Celadet Alî Bedir-Xan ve, li Şamê di navbera salên 1932 û 1943an de hatiye derxistin. Ev kovar bi temamî 57 hejmar e. Celadet Alî Bedir-Xan xwedî û gerîndeyê *Hawarê* bû. Ji bo fêmkirina fikr û ramanên Celadet Bedir-Xan ên ku ji hêla gelek kurdî ve wek rênîşandaneke hatiye qebûlkirin, bi kurtasî behsa jiyana wî dê bi kêr were. Celadet Alî Bedir-Xan,

*“Di sala 1893an de li Stenbolê ji dayîk dibe. Avakarê ziman, rêziman û alfabe Kurdî ye. Lawê Emîn Elî Bedir-Xan û birayê Kamiran û Sureyya Bedir-Xan e. Di I. Herba Cîhanê de di nav artêşa Osmanî de wek serbaz şerr dike. Piştî ku Dewleta Osmanî têk diçe û Komara Tirkîyê ava dibe bav û birayê wî Sureyya surgunê Misrê û ew û birayê xwe Kamiran Alî Bedir-Xan jî surgunê Almanyayê dibin. Mîr Celadet Alî Bedir-Xan li Almanyayê dadmendiyê dixwîne. Piştî 3 salên gelekî xerab û ne xweş ên li Almanyayê di sala 1925an diçe Misrê û ji wir jî derbasî Sûriyê, bajarê Şama ku hingê di bin destê Fransiyayê de ye dibe.”<sup>114</sup>*

Gelek malmezin û dîplomatên kurdan, wekî Celadet û birayên wî Kamiran û Sureya Bedir-Xan ji Komara Tirkîyê reviyabûn û komê Suriyê bibûn. Van rewşên bîr, axa û şêxên kurdan li Suriyê rêxistineke bi navê *Xoybûnê* ava kiribûn ku armanca wê ya bingehîn li Kurdîstana Tirkîyê avakirina Kurdîstaneke serbixwe bû. Serokê vê rêxistinê Celadet Alî Bedir-Xan bû û endamên komîteya merkezî ya *Xoybûnê* jî ev bûn; Mehmed Şukrî Sekban, Celadet Bedir-Xan, Memdûh Selîm, Haco Axa, Emînê Perîxanê, Elî Riza, Mistefa Şahîn, Kerîm Ristem Beg.<sup>115</sup> Ev rêxistin di sala 1927an de hatibû avakirin û di sazkirina *Xoybûnê* de tiştê herî girîng ew bû ku cara pêşîn di tarîxa kurdan de çend rêxistinên kurdan berjewendiyên xwe yê rêxistinî avêtin alîkî û li dora berjewendiyên netewî civiyan.

Dema *Xoybûnê* di sala 1927an de tê sazkirin, li devera Araratê (Agirî) serhildaneke kurdan a demdirêj dest pê dike. *Xoybûnê* bi hemû hêza xwe alîkarî û piştgiriya vê serhildanê dike. Ev serhildan bi qasî çar salan (1927-1930) dewam dike û di dawiya sala 1930î de ji ber sedema lihevhatina Turkiye, Îran û Sovyetê ev serhildan têk diçe.<sup>116</sup> Têkçûyîna vê serhildanê sedemek e ku Celadet Elî Bedirxan ji siyasetê dûr bikeve û ji bo xilasbûna welêt berê xwe bide ziman, çand û hunera kurdî. Sedemeke din a ku Celadet Alî Bedir-Xan ji siyasetê dûr xistiye û bûye sebeb ku Celadet berê xwe bide zimanê kurdî, ew dubendiya di nav *Xoybûnê* de bû. Di sala 1929an de gelek kesên mala Cemîlpaşa ketin nav refên *Xoybûnê* û bûne endamên wê. Vê carê di navbera Bedir-Xanî

<sup>114</sup> Koleksiyona *Hawarê*, Stenbol: Belki Basın Yayın Dağıtım, 2012, r.1

<sup>115</sup> Nûdem, “Rohat Alakom: “Armanca *Xoybûnê* avakirina Kurdîstaneke serbixwe bû”, Nûdem, j.27 (Payîz 1998), r.39

<sup>116</sup> Nûdem, h.g, r.51

û Cemîlpaşayîyan de berberî û dijayetiyek dest pê kir. Di dawiyê de Celadet, Kamiran û Sureya Bedir-Xan di sala 1932an de ji nav refên *Xoybûnê* veqetiyên.<sup>117</sup>

Celadet Elî Bedir-Xan ji ber vê jiyana xwe ya bi binketinên siyasî ve tije, berê xwe da rêyeke din û di wê rêyê de têkoşîna xwe ya netewî berdewam kir. Rêya wî ya nû ya dijwar û demdirêj jî di nav kurdan de bi zimanê wan ê zikmakî belavkirin û geşkirina zanîna ziman û edebiyata kurdî bû. Ji ber ku wî bawer dikir; eger yek xwe nas bike ew ê bikaribe xwe bide nasîn. Ji bo ku di vê xwesteka xwe de serkeftî be, kovareke bi navê *Hawarê* di sala 1932an de derdixe. Di hejmara ewil a kovarê de qala armanc, awayê xebat û nivîsandina *Hawarê* dike û wuha dibêje,

*„Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike.<sup>118</sup> Her kesê xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ku ziman şerta heyîne a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendewar e, pê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê.<sup>119</sup>”*

Her wekî ku em bi vê jêgirtinê jî têdigihên, armanca bingehîn a *Hawarê* zanîne di nav kurdan de belavkirin e û bi bikaranîna zimanê xwe re xwenasîn e. Ji ber kesê ku xwe nas bike dikare xwe bide nasîn. Kesên xwe dikarin bidin nasîn dê di meydana hebûnê de bikaribin hebûn û nasnameya xwe bidin pejirandin. Ji siyasetê dûrbûyîn prensîbeke bingehîn a *Hawarê* bû ku di *Hawarê* de û di nav nifşên dahatûyê de her wext behs li wê prensîbê dihat kirin.

*Hawar* û prensîbên wê, dema xwedî û berpirsiyarê kovara *Nûdemê* Firat Cewerî ji bo projeya xwe rê û rêbazek digeriya, ji bo wî bû çirûskê. Firat Cewerî piştî ku diçe Swêdê û pirtir dikeve nav xebat û tevgerên kurdî, rast li *Hawarê* tê û dest bi xwendina vê kovarê dike û paşê projeya *Hawarê* ji bo xwe bigeh digire û bi vê dest bi projeya *Nûdemê* dike. Firat Cewerî di vê barê de dibêje,

*“Tiştê ku ez lê digeriyam Hawar bû, fikra ku min ji bo me maqûl didît fikra xwediyê Hawarê bû, riya ku em ê pê bibûna xwediyê nasnav û şexsiyeta xwe naverok û çaçoveya Hawarê bû, ramana ku me ê xwe bispartayê ramana dûrbîn ya Celadet Alî BedirXan bû.<sup>120</sup>”*

Dema em dîroka têkoşînên siyasî ya dunyayê dinêrin em dibînin ku têkçûyînen siyasî hin caran berê xwe ber bi cûreyeke din a têkoşînê ve vegerandiye ku ew têkoşîn jî

<sup>117</sup> Nûdem, h.g, r.47

<sup>118</sup> Di hejmarên *Hawarê* yên pêşî de di şûna tîpa “k” yê tîpa “q” û di şûna tîpa “q” yê de jî tîpa “k” hatiye bikaranîn. Lê min di vir de ji bo herikbariya nivîsê wek rêbaza îro nivîsiye.

<sup>119</sup> Hawar, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, Hawar, j.1, (Gulan 1932), r.1

<sup>120</sup> Cewerî, “Çiroka Min û Nûdemê”, r.6

têkoşîna pasîf e. Ango gava di qada siyaset û polîtîkayê de grûbek an kesek nikare li hember reqîbê xwe bi ser bikeve an dest ji reqabetê berdide an jî di qadeke din de wê têkoşîna xwe didomîne, wê çaxê berxwedana pasîf rû dide. Di tarîxê de mînakên vê gelek in. Mesela, wexta Komara Turkiyeyê ava dibe û serdestî dikeve destê kemalîstên laîk, dîndarên Turkiyê di meydana siyasetê de na lê bi şiklekî pasîf, têkoşîna xwe berdewam dikin. Saîdê Nûrsî û tevgera wî Nûrcîtî û Suleyman Hîlmî Tuna û tarîqata wî ku wek Suleymancîtî tê zanîn ji bo vê, mînakên di cih de ne. Wek vê rewşê, dema rewşenbîrên kurd piştî herba cîhanê ya yekem ji bo Kurdistaneke serbixwe bi ser neketin û dîsa serhildanên piştî damezirîna Komara Tirkîyê li Kurdistanê derketin jî bi serne ketin bi taybetî jî serhildana Agiriyê, rewşenbîrên kurd dev ji qada siyasetê berdan û dest bi xebatên ziman û çandî kirin.

Ji bo têkiliya *Nûdem* û *Hawarê* baştir bête têgihiştin behsa salên 1980yê kirin, dê karê me hêsantir bike. Pêşiya salên heştêyê li Turkiyeyê tevgerên siyasî gelek geş bibûn. Ciwanên kurd ji rewşa xwe ya wê rojê qayîl nebûn û gelek aktîf di nav tevgerên siyasî de cih digirtin. Dema cûntaya eskerî ya 12ê îlonê ya sala 1980yê pêk hat van ciwan û aktîvîstên kurd mecbûr man welêt biterikînin û wek penaberên siyasî biçin welatîne Ewropayê. Ev têkçûyîna siyasî mîna mînakên me li jor jî qala wan kir, berê xwe ber bi têkoşîna di meydana ziman, çand û edebiyatê ve vegehand. Çawa Celadet jî di hejmara ewil ya *Hawarê* de dibêje “Her kesê xwe nas bike, dikare xwe bide naskirin” ev rewş ji bo van kesên salên 80yê xwe wek rastîyek nîşan da. Yek sedemeke ku kovara *Nûdem* wek rêber kovara *Hawarê* girtiye dibe ku ev paşxaneyê dîrokî û civakî be.

Rêkxistina *Xoybûnê* gelek komele û grûbên kurdan di bin banekî de civandibû û ew grûb û rêkxistin berjewendiyên xwe ji bîr kiribûn ên ku bi wê rêkxistin û grûbê re sînorkirî bû. Di bin banê *Xoybûnê* de, ji bo armanceke hevpar dixebitîn û bi dijmineke hevpar re têdikoşîn. Dîsa wek dewama vê tradîsyonê di kovara *Hawarê* de dîsa her çiqas em giraniyeke mala Bedir-Xaniyan bibînin jî, em rast li nivîsên Cemîlpaşazadayan, axayan, entelektuel û xwendayên kurdan tînin. Em ji vê agahiyê dikarin bigihêjin wê armanca kovara *Hawarê* ku ev kovar, kovareke grûbek nebû lê wek platformek bû ku her kes dikarî di wê de nivîsên xwe biweşîne. Dema em vê rewşê didin ber rewşa roja ku *Nûdem* derdiket, em dikarin pêwendiyekê di navbera wê de deynin. Çunkî pêşiya salên 1980yê li Turkiyê di navbera fikr û ramanên kurdên aktîvîst de gelek dubendî hebûn û ev rewş piştî salên 1980 li derveyê welêt kûrtir bû. Em ê di

beşên bê de jî bînin ziman ku taybetiyeke bingehîn a surgunê ew e ku di navbera fikrên surgunan de dijberiyên mezin çê dibin. Ji ber ku kurd jî surgun bûbûn, ev taybetiya surgunê ji bo wan jî derbas dibû û wek wan dubendiyên li welêt ne kêmbûn, dubendineyên din li derveyê welêt derketin meydanê. Em mînakên vê di gelek cihên *Nûdemê* de dibînin û em ê paşê behsa wan bikin. Di vê çarçovê de Firat Cewerî jî projeyeke wisa difikirî ku wek *Hawarê* bila her kes ji her aliyên kurdan bikaribin ji vê kovarê re binivîsîn û bikaribin têkiliyê daynin. Ji bo vê yekê, *Nûdem* her wext xwestiye ji siyasetê û ji gengeşiyên navbera kurdan dûr bisekine.

Têkiliya *Hawar* û *Nûdemê* tenê bi vê yekê re sînorkirî nebû. Firat Cewerî pirî caran li ser pêwendiyên *Hawar* û *Nûdemê* disekinî. Mesela, hin nivîsên nivîskarên *Hawarê* hin cara di *Nûdemê* de dihat weşandin. Bi taybetî hejmara van nivîsan piştî ku kovara *Hawarê* careke din ji hêla weşanxaneya *Nûdemê* ve hate weşandin, zêdetir bû. Yanê meriv dikare bêje di zêdebûna nivîsên *Hawarê* di *Nûdemê* de reklameke veşartî ya vê çapa nû ya *Hawarê* ye. Dîsa di *Nûdemê* de em rastê nivîsên *Hawarê* tînin ku der barê teşwîqa ziman û xwendina zimanê zikamakî dike. Mesela, di dawîya hejmara 13an de wiha derbas dibe,

*“Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtî, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan bidedilîn. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stuna xwêl de ye. (Celadet Alî Bedir-Xan)”<sup>121</sup>*

Wekê vê gelek mînakên din hene. Mînakek din a balkeş jî, çawa Celadet Alî Bedir-Xan *Hawarê* mînandiye zarokek nûza, Firat Cewerî jî *Nûdemê* dişibîne keçeke nûza. Celadet Bedir-Xan dibêje, “*Hawar* zarokeke nûza ye, Zarowa me ye; zaroya kurdan e. Wek her zaro bi xweyîtiya dê û bav, bira û pismamên xwe dikare bijî.”<sup>122</sup> Qasê ku em di vê derê de dibînin Celadet Bedir-Xan vê mînandinê ji bo piştgiriya *Hawarê* xwestiye. Em ji bo piştgiriya *Nûdemê* di nav rûpelên *Nûdemê* de tiştine wek vê dibînin. Mesela, Firat Cewerî di sêsalîya *Nûdemê* de dibêje *Nûdem* keçiyeke sê salî ye, di pêncsalîya wê de dibêje, ev keçika pêncsalî ez nikarim bi destê xwe ve bikujim û di dehsalîya *Nûdemê* de dibêje, ez bûm sebep ku *Nûdem* di deh salîya xwe de bimîne.

<sup>121</sup> Celadet Alî Bedir-Xan, Qapaxa Paşî, *Nûdem*, j.13 (Bihar 1995), r.116

<sup>122</sup> *Hawar*, r.11

Têkiliya *Hawar* û *Nûdemê* bi vê ve jî sînordar nebû. Çawa ku em dizanin Celadet Alî Bedir-Xan tenê kovara *Hawarê* dervedixist lê bi wê re ji bo bigihêje armanca xwe ya geşkirina ziman, çand û edebiyata kurdî pirtûkine jî çap dikirin. Her wekê vê, *Nûdemê* jî daye pey şopeke wiha û weşanxaneyêke bi navê *Nûdemê* vekiriye û gelek pirtûk di wir de weşandine. Em di beşa weşanxaneyê *Nûdemê* de behsa wê bikin. Lê di vê weşanxaneyê de hemû hejmarên kovara *Hawarê* ji nû ve hatine weşandin. Em di *Nûdemê* de dema ev weşan li ber çapê ye û piştî ku çap bûye û çîroka çapbûna wê dibînin. Ji bo reklama wê ev tê gotin:

*„Hawar derdikeve! Di demeke kurt de wê hemû hejmarên HAWARê bi awayekî ji çavan re baş, bi çapeke pedegojîk, bi kaxezên sipehî, bi cîldeke mîna pirtûkeke pîroz û bi form û ebada Nûdemê di nava Weşanên Nûdemê de derkeve... Piştî derketina HAWARê em ê li Stockholm, Uppsala, Kopenhagen, Olso, Bruksel, Parîs, Köln, Hamburg û hin bajarên din turneyên civînan çêbikin û HAWARê bigihînin destên xwendevanên kurd.”<sup>123</sup>*

Dema *Hawar* tê çapkirin ji hêla çapxaneyê *Nûdemê* ve di hejmara kovara *Nûdemê* ya 27an de di nivîsa sereke de Firat Cewerî qala vê dike. Ji ber ku ev çap li Swêdê ango li derveyê welêt hatiye derxistin, diyar e ku dê vê weşanê pirsgirêka firotinê û belavbûnê bikişîne. Ji xwe rewşa xwendina kurdî li meydanê ye, li ser vî jî faktora derveyê welêt jî îlave bibe, gelek pirsgirêk dê derkevin holê. Di vê nivîsa sereke ya di hejmara 27an de Firat Cewerî alîkarî ji dezgehên kurdan ji bo belavkirina vê weşanê xwestiye. Firat Cewerî wiha dibêje:

*“Heta niha ji hin der û doran, hin şexan xwe dane ber firotin û belavkirina Hawarê. Lê ev kême, çavên me li rîya dezgehên kurdan in. Hêviya min ew e ku wê dezgehên kurdan bi çavê xezîneyêke kultur û edebiyata kurdî li vê berhemê binêrin û li ser wê bingehê destê alîkariyê dirêjî me bikin.”<sup>124</sup>*

Der barê belavkirin û firotina *Hawarê* de henekeke ku hatiye kirin di vê nivîsa sereke de derbas dibe û gelek manîdar e. Dema çapên *Hawarê* tînin û li pêşiya *Nûdemê* tînin danîn, hevaleyê Firat Cewerî ji wî re dibêje, “Heta ku Kurdistan xilas bibe jî ev *Hawar* ma.”<sup>125</sup> Ev jî rewşa çepemenî û xwendevaniya kurdan re mînakeke balkêş e.

Ji bo ku bibe encam û pixte ji bo tîkiliya *Hawar* û *Nûdemê* mirov dikare bêje, Firat Cewerî ji *Hawarê* îlham hilda û *Nûdemê* li ser bingehên *Hawarê* ava kir. Dîsa Cewerî ji bo rê û rêbaza xwe meşrû raweyê raya giştî ya entelektuel, nivîskar û xwendevanên

<sup>123</sup> Nûdem, “Hawar Derdikeve!”, Nûdem, j.22, (Havîn 1997), r.2

<sup>124</sup> Firat Cewerî, “Hawara Neteweyî”, Nûdem, j.27, (Payîz 1998), r.5

<sup>125</sup> Cewerî, h.b., r.5

kurd bike, pišta xwe daye Celadet Alî Bedir-Xan û Hawarê û pirî caran ji bo rêbaza xwe referans daye.

Wek dawî em ji bo têkiliya Hawar û *Nûdemê* gotinên Firat Cewerî bidin dê ji bo vê mijarê bibe kurteyê baş. Firat Cewerî wiha dibêje;

*“Gava xwediyê Nûdemê bi dû şopa Hawarê ket, hemû hejmarên Hawarê ên wendabûyî bi dest xist, ket nav rûpelên wê, dît tiştê ku ew lê difikire, wa ye Celadet Alî Bedir-Xan berî bi salên dirêj kiriye. Ji ber ku armanca Hawarê ne siyaseta rojane ya partîtiyê bû, Nûdemê jî li dû tiştêkî weha digeriya û xwest wê tradisyona kevin, ya bêalîtiya edebiyatê bidomîne”*

### 3.4.2. Di *Nûdemê* De Werger

Di kovara *Nûdemê* de gelek werger henin. Wek di vîzyona *Nûdemê* de jî hatibû zimên wê ji edebiyata dunyayê ya klasîk û modern wergeran bikin. Di vê çarçoveyê de, dema em li *Nûdemê* dinêrin em dibînin ku di *Nûdemê* de gelek weger henin. Gelo çima ekîba *Nûdemê* ewqas giringiyê daye wergerê? Firat Cewerî dibêje; ‘Bi riya wergerê zimanek dikemile. Formulasyon û hostatiya nivîskarên cîhanî dibin malê zimanê me. Ji aliyê din ve zimanê me dibe şîrkê zimanên cîhanê û edebiyata me ji qalibê xwe ê teng rizgar dibe û rengêkî cîhanî werdigire.’ Ji bo bersivîna vê pirsê em ê di vê beşê de derbarê wergerê, dîroka wergerê û giringiya wergerê de agahî bidin û paşê jî wergerên di *Nûdemê* de hatine kirin di çarçoveya gurza numûne ya *Nûdemê* de binirxînin.

Werger; teksteke zimanekî qulubandina zimanêke din e ku bi awayekî bi plan û bi kontrol tê kirin û ev yek di navbera ziman û çandan de pîreyek datîne.<sup>126</sup> Werger kareke gelek muhim e û perwerdehiyek baş divê. Wergêr divê herdu zimanan jî baş bizanibe ew zimanê werdigerîne û wergerê ji bo wî dike. Di vê derbarê de nivîskar Oguz Yücel wiha dibêje;

*“Ziman ji hêlekê ve însan e. Ma zimanek bê însan, hin îşaretan wêdetir tiştêkî ye? Însan, hebûna yekda ye ku dikare zimên bikar bîne, ziman eyina însan e û ziman wek wekîlekî însan e di jîyanê de... Nexwe werger jî ne ew tişt e ku peyv, hevok û tekstên zimanekî qulubandina ji bo zimanekî din e. Beranberê wê, werger, wergera însanek ji bo însanekî din e. Ji ber ku peyv ambalaja hêst û fikrên însan in an jî qundaxeke ku însan di wê de hatiye pêçandin in. Divê tu ambalajê bi dîqat vekî, tiştên di wê de derxî û di nav ambalajêke din de pakêt bikî. Jixwe zehmetiya wergerê jî ji vir tê. Însan çiqas mezin û zehmet be, werger jî ewqas mezin û zehmet e.”<sup>127</sup>*

<sup>126</sup> Oğuz Yücel, *Yabancı Dil Öğretiminde Çevirinin Yeri ve Önemi?*, Ankara: Yelken Basın-Yayın-Dağıtım, 2004, r.5

<sup>127</sup> Yücel, h.b, r.7

Werger kareke gelek zehmet e lê ji bo pêşketina zimanan gelek bifeyde ye. Bi wergerên pirtûkên Yewnaniyan, Romayî xwediyê medeniyeteke mezin bibûn. Dîsa ereb bi wergerên yewnanî û romayîyan û Ewropî bi wergerên ereban xwediyê mediniyetên mezin bibûn. Bi wergerên Încîlê di dema ronesans û reformê de zimanên Ewropî pêş ketin û xwediyê pirtûkên giramerê bûn. Yanê em dikarin bêjin ku wergervanî di damezirîna zimanên standart û yê nivîsê de hîmeke bingehîn e.

Dema em dîroka wergervaniya kurdî dinêrin, cara pêşî rast li wergerên di kovar û rojnameyên kurdî yê di dema Osmaniyan de tî. Bo nimûne di *Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurd* de em rast li wergereke ji zimanê tirkî bo kurdî tî. Lê wergerên di vê qonaxê de zêde pêşneketine. Em wek her cureyên din di kovara *Hawarê* de rast li wergeran tî. Pey kovara *Hawarê* qonaxa Ewropayê û bi taybetî Swêd û kovara *Nûdemê* gelek girîngî daye vê karê. Wergervaniya kurdî heta roja îro jî ji profesyonelî gelek dûr e. Ew nayê wê maneyê ku ev wergerên hatin kirin ne baş in lê ew tê wê maneyê ku ew kesên ku werger dikin wek kar vê karê nakin lê wek xizmet dikin û ji pêvajoya perwerdehiyê wergerê derbas nebûne.

Gelek pirsgirêkên wergerê henin. Bi taybetî wergera kurdî pirtir xwediyê pirsgirêkan in. Nebûna ferhengên baş û tengbûyîna lîteratura zanistî, dîsa nebûna perwerdehiya bi zimanê kurdî di pêvajoya perwerdehiyê û bi taybetî jî di zanîngehan de hin ji van pirsgirêkan in ku bi zimanê kurdî re têkildar in. Di vê derbarê de Sedar Roşan ku wergêrekî kurd e, dibêje, tunebûna ferhengên baş yê kurdî-kurdî, hem jî yê bi zimanên din û kurdî problemek e.<sup>128</sup> Wergêrên kurd dema werger dikin rast problema zimanê duyem jî tî. Hin caran teksta ku tê wergerandin dibe ku xwe jî wergerek be. Di vê rewşê de eger wergêr ji vê tekstê werger bike ew dibe wergera ji zimanê duyem. Ji bo vê yekê dîsa Sedar Roşan behsa serpêhatiyê xwe dike. Ji bo zelalkirina vê mijara wergera ji zimanê duyem vê serpêhatiyê dê kêr werê. Sedar Roşan wiha dibê,

*“Çîrokên Hezar û Şevk bi sedsalan e ku li Rojhilata Navîn û heta ez dikarim bêjim ji Misrê bigire heta Hindistanê tî gotin an jî hatine gotin. Berî bi sed, sed û bîst salî li Misrê komisyonek dicive û van çîrokan hemûyan bi erebî berhev dikin û bi qasî panzdeh-şanzdeh cild çîrok tî ser hev. Pişt re yekî fransîz rûdine û van cildan wedigerîne fransîzî. Paşê ev çîrok bi riya fransîzî wedigerin gelek zimanên din. Swêdiyan bi xwe jî ev çîrok ji fransîzî wegerandine. Min bihîst ku tirkan bi xwe jî ev*

---

<sup>128</sup> Firat Cewerî, “Cafê Nûdem”, Nûdem, j.34, (Havîn 2000), r.16

*çîrok ji fransîzî wergerandine. Vêca min jî ji swêdî wergerandine. Ev çîrok çiqasî nêzî orjînalê erebî mane ez nizanîm.*”<sup>129</sup>

Ji van gotinên Serdar Roşan em hem wergera zimanê duyem çiyê fêhm dikin hem jî wergerên ji hêla wergêrên kurdên li Ewropayê de agahî hildidin. Em dibînin ku ew ciwarê kêjan welatê Ewropayê bûne, li wê derê wî zimanî fêhm bûne û ji wî zimanî çî berhemên aîdê wê zimanî nin û çî jî berhemên aîdê zimanên din in bi wî zimanî wergêrandine.

Kurdî xwediyê hin zaravayan e û du zaravayên sereke yê kurdî xwediyê kevneşopiyê nîspeten fireh a nivîskî ne. Ango kurmancî û soranî du zaravayên sereke yê kurdî nin. Gelo berhemek ji soranî bo kurmancî dema tê qulubandin em dikarin ji wê re bêjin ev werger e? Nivîskarên kurd li ser vê yekê jî sekinîne û di vê mijarê de hin nêrînên cuda pêşkeş kirine. Bo numûne, Elîşer yek wergêrekî kurdî ye ku ji zaravayê soranî bo kurmancî werger dike, di vê derbarê de ew wiha dibêje,

*„Werger, gava mirov tiştêkî ji zimanekî werdigerîne zimanekî din e. Lê ez dixwazim vê jî bibêjim, mîna ku zimanzanan jî dane xuyakirin, gava mirov ji zaravayekî werdigerîne zaravayekî din, ew nabe werger. Bi vê ve girêdayî, tiştê ku ez jî dikim ne werger e; tiştêkî di navbera tîpguhêzî û wegerê de ye.*”<sup>130</sup>

Nivîskarên wek Elîşer wergêra ji zaravayekî bo zaravayê din ya heman zimanî mîna wergerê nahesibînin lê wek cureke wergerê dihesibînin. Lê nivîskarên henin ku ji bo wergera di navbera zaravayan de wek werger dibînin û ji bo vê navlêkirinê jî tu problem nabînin. Mesela, Serdar Roşan dibêje, “werger ne ew e ku mirov bi tenê ji zimanekî wergerîne zimanekî din, gelek ziman hene ku zaravayên wan hene. Gava mirov ji zaravayekî wergerîne zaravayekî din, ew jî dibe werger. Mirov dikare navê wergera ji zaravayekî bo zaravayê din lê bike.”<sup>131</sup> Di vê mijarê de nîqaş berdewam in, lê gelemperî wergerên ji zaravayekî ji bo zaravayê din wek werger tê hesibandin, lewra hem hevoksazî hem jî hin peyv diguherin. Eger ne wisa bûya dê îhtiyacî ji wergerê tunebûye.

Pirsgirêkeke din ya wergervaniya kurdî, wek hemû beşên çapemeniya kurdî, pirsgirêka aborî ye. Ji ber ku saziyên kurdan yê perwerdehiyê tunin, wergêrvanên kurd bi amatorî ango xwe bi xwe kurdiya nivîskî hîn dibin û bi îmkanên xwe wergeran dikin. Dîsa ji ber ku piyasa kurdan kesad e ango pirtûkên kurdî zêde nayên firotin û heta

<sup>129</sup> Cewerî, h.g, r.20-21

<sup>130</sup> Cewerî, h.g, r.7

<sup>131</sup> Cewerî, h.g, r.7

nikarin mesrefa xwe derxin, werşanxane ji wergêrvanan daxwazê nake ku wergera hin pirtûkan bikin. Wergêrvanên kurdî pirtûkan dixwînin û yên ku xweşê wan diçin werdigerînin û bi îmkânên xwe wan çap dikin. Ji xwe rewşa piyasaya pirtûkên kurdî li ber çav e û di encama vê rewşa xirab de ew hem wergeran dikin hem jî ji bêrîkên xwe peran didin da ku wan pirtûkên wergerandine çap bikin. Dîsa ji ber ku bi profesyonelî, ji ber pirsgirêkên aborî yên şexsî, nikarin vê karê bikin, ew nikarin encamên baş bidin. Di vê derbarê de Elîşer dibêje,

*“Meseleya wergerê jî mîna gelek meseleyên kurdan ên din in. Naxêr, tu weşanxane ji me kitêban naxwawzin û em li gora wan wernagerînin. Ji ber ku em vî karê mîna karekî welatparêziyê dibînin û em ji xwe re li gora dilê xwe dikin. Em ji vê karê xwe tu fêdeyê aborî nabînin û tu weşanxane jî tu pereyî ji bo vî karê nadin me . Karê me karê fîsebilulah e.”*<sup>132</sup>

Pirsgirêkên wergerê hem yên kurdî hem jî yên gelemperî gelek in. Em ê di vir de listeyeke van pirsgirêkan bidin da ku meseleya wergerê baştir were fêmkirin. Nivîskareke bi nav û deng bi navê Savary, di pirtûka xwe ya bi navê “Hunera Wergêrê” de van pirsgirêkan wiha tîne ziman û pîvanên wergêrê wiha dibêje,

- *Wergerek divê peyvên eslê xwe nîşan bide*
- *Wergerek divê fikrên eslê xwe nîşan bide*
- *Dema wergerek tê xwendin divê hîssa orjînaltiyê bide*
- *Weger divê wek werger bê xwendin*
- *Werger divê şêweya eslê xwe nîşan bide*
- *Werger divê şêweya wergêr nîşan bide*
- *Werger divê wek berhemêke aîdê dema wergêr bê xwendin.*
- *Di wergeran de, di metna zimanê hedefê de dibe ku îlave û jêhavêtin hebin.*
- *Di wergeran de, îlave û jêhavêtin divê çênebe*
- *Divê wergera helbestan bi pexşanê bibe*
- *Wergera helbestan bi helbestan nabe.”*<sup>133</sup>

Pey ku me bi gelmperî behsa wergerê û wergervanîya kurdî kir, em nuha li ser wan wergeran bisekinin ku di kovara *Nûdemê* de derketine û ji hêla *weşanxaneya Nûdemê* ve hatinin weşandin. Di kovara *Nûdemê* de ji bo wergerê giringiyeke gelek mezin hatiye dayîn. Ji bilî kovara *Nûdemê*, weşanên *Nûdemê* jî girîngî daye pirtûkên wergerê. Dema em *weşanên Nûdemê* dinêrin, em dibînin ku rêjeyek mezin ji hemû weşanên *weşanxaneya Nûdemê* wergêr e. Rêjeya wergerên *weşanxaneya Nûdemê* hinek


<sup>132</sup> Cewerî, h.g, r.15

<sup>133</sup> Yücel, h.b, r.15

ji nivê hemû hejmaran kêmtir e. Dema kovara *Nûdemê* hejmara xwe ya dawî di sala 2001ê de derdixe, ew çax ji 55 weşanên weşanxaneyê *Nûdemê* 23 heb ji wan werger bû. Xên ji vê, *Nûdemê* di bin navê *Nûdem Wergêr* de kovarek derxistiye. Ev kovar her çiqas emirdirêj nebûye jî dîsa jî xebateke hêja ye.

Kovara *Nûdemê* jî giringî daye wergeran. Me ji bo kovara *Nûdemê* bide nasîn, gurzeke numûne a kovara *Nûdemê* amade kiribû. Ew gurza numûneyan ji bo agahiyên di vê xebatê wek bingeş hatiye bikaranîn. Di wê gurza numûneyan de 263 nivîs henin û ji wan 36 heb werger in. Her çiqas rêjeya wan kêmtir jî werê xwiyane, ji ber ku wergerên hatinin kirin gelek dirêj in, werger di kovarê de ciheke fireh girtiye. Ji nivîskarên rûs yê klasîk bigrê heta nivîskarên hevdem yê Ewropî dîsa nivîskarên tirk û yê ereb werger hatinin kirin. Ji gelek cureyên nivîsan werger di vê kovarê de dertê pêşiya me. Ew curên ku di gurza numûneyan de ev in; *Lêkolîn*, *gotinên navdar*, *Biyografi*, *ceribîn*, *çîrok*, *helbest*, *bîranîn*, *rexne*, *serpêhatî*, *parçe pirtûk* û *name*. Me ji bo rêjeya van curên nivîsan were diyarkirin, diyagramêk gilover ji gurza numûneyan ya *Nûdemê* çêkir.

Şekil 1: 3.4.2.a Rêjeya Nivîsên werger ya di G.N. a *Nûdemê* de



Diyagrama gilover 3.4.2.a. rêjeya curên nivîsên wergeran yê di gurza numûneyan ya di kovara *Nûdemê* de nîşanî me dide. Ji sê perçên hemû nivîsên vê

diyagrama gilover yek parçeyeke wî piçek zêdetir *helbest* in. Ji nav cureyên nivîsan ya ku pey *helbestê* zêdetirîn hatiye wergêrandin *çîrok* e ku rêjeya wê pênc perçên hemû nivîsan parçeyek parîkî zêdetir e. Pey van herdu cure nivîsan, cureya nivîsa *lêkolînê* bi rêjeya sedî hevdeh ve wan dişopîne. Cura dawî ya ku bi rêjeya xwe ve ber çav dikeve *ceribîn* e ku bîst perçên hemû nivîsan parçeyek kêmark zêdetir e. Hemû cure nivîsên din ji hêla rêjeya xwe ve hem ji helbestan hem jî ji çîrokan kêmtir e lê piçek ji lêkolînan zêdetir e. Rêjeya nivîsên din hema hema ji pênc perçên hemû nivîsan parçeyek e.

Wergerên di kovara *Nûdemê* de ji gelek zimanên cuda hatinin kirin. Ji zaravayê soranî heta tirkî ji wir heta erebî û ji erebî jî heta swêdî werger hatinin kirin. Ji hin zimanên din yê ewrupî jî werger hatinin kirin. Ji bo zimanê ku werger jê tên kirin, Firat Cewerî wuha dibêje;

*“Piştî çend salên weşana Nûdemê, her ku çû hejmara nivîskarên me zêdetir bûn û ji ber ku nivîskarên me li seranserî dinyayê hebûn û bi gelek zimanan dizanîbûn, me jî wergerên ji gelek zimanên cihê dikirin. Yanî, me bi taybetî berê xwe nedida zimanekî. Me hewl dida ku gelek ziman di Nûdemê de werin temsîlkirin da ku em di pêşerojê de berhemên wan ziman wergerînin kurdî.”* (Pêvek 3)

Dema em li gurza numûneyan ya kovara *Nûdemê* dinêrin em rastê gelek wergêran tên. Wergêrê herî çalak li gor gurza numûneyan Firat Cewerî ye ku ew hem bi navê xwe hem bi naznavê Dr. Poloço û hem jî wergerên li ser navê *Nûdemê* kiriye. Di gurza numûnan de bi navê Dr. Poloço werger ji Hemingway û Paul Lafargue kiriye. Em dizanin ku Hemingway yek nivîskarek navdar yê Yekîtiya Dewletên Emrîkî ye. Dîsa Paul Lafargue jî komunîstekî bi nav û deng e û zavayê Marx e. Hemîngway berhemên xwe bi zimanê înglîzî û Paul Lafargue jî bi fransîzî nivîsine. Wek ku me li jor jî hanî ziman Firat Cewerî ji sê zimanan werger dikir. Ew jî kurdî, swêdî û tirkî bû. Yanî Firat Cewerî dema wergerên van nivîskaran dikir zimanê swêdî û tirkî bikar dihanî. Ji ber vê yekê pîrî wergerên Firat Cewerî wergerên ji zimanê duyem in. Qasî ku em ji gurza numûna ya *Nûdemê* dibînin, Firat Cewerî li ser navê xwe ji Jostein Gaarder û ji Oktavio Paz wergeran kiriye. Oktavio Paz yek helbestvaneke bi nav û deng e ku ji Emrîka Latînî ye. Li ser navê *Nûdemê* jî Firat Cewerî, li gor gurza numûna ya *Nûdemê*, ji Arthur Rimbaud, Henry Miller û Sharock Kamyab wergeran kiriye. Wek ku em dibînin Firat Cewerî pirtir ji edebiyata dunyayê ya klasîk û modern wergeran ji bo kurdî kiriye û di *Nûdemê* de ew weşandine. Dema em kesên ku wergera berhemên wan hatine kirin yê

edebiyata dunyayê ya klasîk û nûjen dinêrin ew kesan dertê pêşberî me; Edward Petêşka, Alponse Daudet, Hermann Hesse, Jaques Prevent, Jaques Prevent, Juhani Hinkkanen, Margereta, Mayakovskî, Varlin Stransev.

Wergêrê duyem yê yek ji herî zêde werger kiriye jî Mehmed Uzun e. Em hemû dizanin ku Mehmed Uzun romanivîsekî gelek binavûdeng yê kurdan e. Ew dema wergerê xwe kiriye, her çiqas bi fransîzî û swêdî bizanibe jî, wergerên xwe ji zimanê tirkî kiriye. Ji ber ku, li gor gurza numûneyan a *Nûdemê*, hemû wergerên ji hêla Mehmed Uzun ve hatinin kirin, berhemên nivîskarên tirkînivîs in. Nivîskarên ku Mehmed Uzun ji wan werger kiriye ev in; Ali Biçer, Huseyin Elçi, A. Hicri İzgören, İhsan Fikret Biçici, Yılmaz Odabaşı nin. Van nivîskaran qîsmek mezin ji wan bi doza kurdayetî re eleqedar in. Ji zimanê tirkî xên ji Mehmed Uzun nivîskarînin din jî werger kirine. Dema em li gurza numûneyan a *Nûdemê* dinêrin kesên ku ji tirkî wergerên wan hatinin kirin ev in, Ahmet Altan, Nilgün Demirkaya, Özkan Mert.


Em di *Nûdemê* de rastê wergerên Şahîne Bekirê Soreklî û Serdar Roşan jî tên ku yê pêşî çîroknivîsekî çalak yê *Nûdemê* û ya duyem jî wergêrekî baş yê *Nûdemê* û yê zimanê kurdî ye. Şahîne Bekirê Soreklî ji înglizî berhemeke fransîzî ya bi navê Antione de Saint-Exupery wergerandiye. Serdar Roşan jî, qasê ku em di gurza numûneyan a *Nûdemê* de dibînin, ji Guy de Maupassant çîrokeke wergerandiye. Em dizanin ku Guy de Maupassant yek çîroknivîseke fransîz e û Serdar Roşan jî ji Swêdî ev werger kiriye. Ango hem Şahîne Bekirê Soreklî hem jî Serdar Roşan wergerên xwe ji *zimanê duyem* kirine.

Di gurza numûneyan a *Nûdemê* de em rast wergerên ji zimanê erebî û ji zaravayê soranî jî tên. Zimanê erebî wergêr di gurza numûneyan a *Nûdemê* de Emîn Narozi dertê pêşberî me ku ew wergêrekî baş yê zimanê kurdî ye. Ew ji Mele Ehmedê Zivingî û ji Necîb mehîfûz wergêran kiriye. Wergêrê soranî jî di gurza numûneyan a *Nûdemê* de Ziya Avcî ye. Ew ji Refîq Hîlmî û Kemal Mazhar Ehmed wergeran kiriye. Lê wergerên ji zaravayê soranî di hejmarên dawî yên kovara *Nûdemê* de dertên pêşiya me, lewra her wekî me li jor jî hanî ziman kovara *Nûdemê* di serî de dixwest bibe platforma hemû zaravayên kurdî û ji bo vê yekê jî ji hemû zaravayan nivîs diweşand. Lê dema di vê de ser neket û bû kovareke kurmançî êdî di hejmarên dawî yên kovarê de cih ji bo wergerên ji soranî bo kurmançî vekir.

Em ê vê derê di diyagrameke gilover de, rêjeya ew nivskaran bidin ku di *Nûdemê* de werger kirine. Van agahiyên wek hemû agahiyên din yê çendahî ji gurza numuna ya *Nûdemê* hatiye girtin. (bnr. Pêvek 2) Di vê diyagrama gilover a 11 an de, em ê nivîsên ji hêla Firat Cewerî ve wergera wan hatine kirin lê ne bi navê wî lê bi navê Dr. Poloço û li ser navê *Nûdemê* derketinin, li ser navê Firat Cewerî bidin.

Şekil 2: 3.4.2.b. Rêjeya Wergêran ya di G.N. a *Nûdemê* de

■ Firat Cewerî                      ■ Emîn Narozi                      ■ Ziya Avcî  
■ Serdar Roşan                      ■ Mehmed Uzun                      ■ Yên Din



Di Diyagrama gilover 3.4.2.b. de, li gor gurza numûneyan a *Nûdemê*, rêjeya nivîskarên *Nûdemê* hatiye dayîn yê ku herî zêde di kovara *Nûdemê* de werger kirine. Qasê ku em dibînin hema hema nivê wergeran ji hêla pênc nivîskaran ve hatiye kirin û yê mayî jî ji hêla hemû nivîskarên din ve hatiye kirin. Nivîskarê herî çalak di vê mijara wergerê de Firat Cewerî ye ku ji pênc perçên hemû nivîsan parçeyek piçek zêdetir ji hêla wî ve hatiye nivîsîn. Pey Firat Cewerî, Mehmed Uzun tê ku rêjeya wergerên wî sedî 13 e. Emîn Narozi, Ziya Avcî û Serdar Roşan di nav rêja wergêran de ji sedî dehî derbas nebûne.

Dawiya dawî em dikarin ji bo beşa duyem bêjin ku me xwest bi kurtenasîna hin nivîskarên kovara *Nûdemê* yê bingehîn ve têkiliya wan bi *Nûdemê* ve derxin holê û bi vê yekê hem *Nûdemê* bidin nasîn hem jî di gihandina nivîskarên kurdî de cihê wî derxin

holê. Dîsa perça duyem ya vê beşê de me xwest di derbarê naveroka kovara *Nûdemê* de agahiyên kurtir bidin û bi vê yekê ve jî dîsa *Nûdemê* kurtir bidin nasîn. Wek dawî me beşa sêyem de jî behsa wergervanî û di kovara *Nûdemê* de werger û wergêr kir. Bi vê jî me cihê weger û wergervaniyê di kovara *Nûdemê* mê de zelaltir kir.

### 3.5. Nivîskarên Sereke yê *Nûdemê*

Nivîskarên *Nûdemê* gelek in. Hin ji wan pêşiya ku *Nûdem* dihat derketin jixwe dest bi nivîsînê kiribûn û bi nivîsîna ji bo *Nûdemê* ve pirtir tecrube dest xistin, hin ji wan jî di pêvajoya jiyana *Nûdemê* de dest bi nivîsê kirin û bûn nivîskarên *Nûdemê*. Em ê di vir de nêzîkî deh nivîskarên *Nûdemê* bidin nasîn. Ev nivîskaran, kesên bingehîn in ji bo nivîsan û ji bo alîkariya xwedî û berpirsiyarê girştî Firat Cewerî.

#### 3.5.1. Firat Cewerî

Firat Cewerî xwedî û berpirsiyarê girştî yê Kovara *Nûdemê* ye. Di sala 1959an de an jî di sala 1960î de, li gundekî Dêrika çiyayê Mazî hatiye dunyayê. Di biçûktiya wî de, malbata wî ji bo demeke kin koçê Wêranşehrê kiriye, lê paşê ji ber reforma erd careke din vegeriyana gund. Li gund bi birayê xwe re dest bi dibistanê dike. Di sala 1970yî de malbata wî ji gund bar dike û diçe Nisêbînê û li wir jiyana xwe didomîne. Bêyî ku dîploma xwe ya lîseyê hilde, di sala 1980yî de derbasê binxetê angî Surî dibe û li wir bi riya Almaniyayê ve derbasê Swêdê dibe û heta îro li wir dijî.<sup>134</sup>

Pey vê kurtejiyanê em ê hinek behsa hin bîranînên wî bikin da ku em bikaribin fêhm bikin ka di jiyana wî de ji bo şikilgirtina fikr û ramanên wî çî bi bandor bûne. Em dizanin ku Firat Cewerî kurdperwerek e û kedkareke zimanê kurdî ye. Wek gelek kesan, di şikilgirtina fikr û ramanên Firat Cewerî de jî zilm û zora leşkeran cihek girîng digrê. Ew zulma eskeran a li gund û bajarên kurdan ji hêla Firat Cewerî wiha te zimên,

*“Piştî ku ro hebekî bilind bûbû, me ji lawikekî cîranê me bihîstibû, ku eskeran hemû zîlamên gund li meydana gund dane hev û bi dar û qamçiyên li wan dixin... Esker bi hêrs bi wan re dipeyîvîn, carê yek ji nava rêza zîlamên derdixistin, sê-çar heb lê dicivyan û heya ku ew ji ser hişê wî dibirin lê dixistin. Carna jê wan dudu ji nav rêzê derdixistin, dar dixistin destê yekî, li ser wî disekinîn û dixwestin ku ew bi wî darî li gundiye xwe xe. Ji gundîtiyê jî wêdetir li bavê xwe xe li birayê xwe xe.... Ez çiqas fikirîbûm min tu sedem ji wê zilma wan re nedîtibû. Lê kîn, nefret û girreki eceb di dilê min de çê bûbû. Dilê min ji ber van hê jî diperite.”*<sup>135</sup>

<sup>134</sup> Firat Cewerî, “Çiroka Jiyana Min”, *Nûdem*, j.4, (Zivistan 1992), r.90-93

<sup>135</sup> Cewerî, h.g, r.91

Meseleyên vî rengî di gelek serpehatiyên nivîskarên kurdan de rû dide. Ew zilm û zor, her wekî ku Firat Cewerî jî dibêje, di dilê wan de heta roja îro jî bandora xwe hiştiye. Di nav vê pîskolojiyê de Firat Cewerî dest bi lîsê dike. Ew dem lîse gelek aktîf bûn ji hêla fikr û ramanên siyasî ve. Di lîseyan de nerazîbûyîna sîstemê rû dida û xwendekarên lîseyan ji bo çareseriyê diketin nava tevgerên curbicur. Firat Cewerî jî ji xwe re rêyek hîlbijartibû ew deman de. Ew wiha salên xwe yê lîseyê tîne ziman, “Bi zixtikên vê pêla hişyarbûnê ez jî hişyar bûbûm; li dijî neheqî, zulmê û stemkariyê bi ciwanî û dînamîkbûna xwe, ez bi şev û roj dixebitîm. Gorî pêwîstiyên wê demê ez jî felsefeya îdealîst bi dûr ketibûm, min ji xwe re felsefeya materyalîst hîlbijartibû.”<sup>136</sup> Ji ber ku ew dem li Kurdistanê di nav ciwanan de fikrên materyalîst gelek berbelav bûn.

Ronakbîr û aktîvîstên kurd yê salên 1970 û 80yî li Tirkîyê dema dinivîsîn piranî zimanê tirkî bikar dihanîn. Lê pey darbeyan dema ew mecbûr man welêt biterikînin, ew li Ewropayê bi taybetî jî li Swêdê ji ber hin sedemên ku me di beşa ewil de hanî ziman, dest bi bikaranîna zimanê kurdî kirin. Di nava van de kesek ji kesên ku herî pir li ser vê mijarê sekiniye Firat Cewerî ye. Lê çîroka Firat Cewerî ya girîngîdayîna zimanê kurdî piçek cuda ye. Çimkî ew hê li Turkiyê bû dest bi nivîsîna kurdî kiriye û bûye evîndareke zimanê xwe yê zikmakî. Di vê derbarê de Firat Cewerî wiha dibêje,

*“Di sala 77an de pirtûkeke helbestan ya rehmetiyê Cegerxwîn ketibû destê min. Wê pirtûkê dilê min şa kiribû, hêvî dabû min, zimanê min bi min şêrîn kiribû. Ew pirtûka Cegerxwîn bû sedema nivîsandina min ya bi kurdî. Di eynî salê de min dest bi nivîsandina helbestên kurdî kir. Min xwe li helbesta nûjen rakişand. Gava li daweteke kurdî, li hemberî bi sedan kes min helbestên xwe xwendibûn, dengê çepikên guhdaran di dilê min de pêl dabû.”<sup>137</sup>*

Li Swêdê Firat Cewerî xwendina xwe didomîne, lîseya ku li welêt nivçî mabû diqedîne û ji bilî wî jî pîskolojî û pedagojî xwendiyê. Karê wergervaniya sê zimanan, mamostetiya dibistana destpêkê ya Swêdê, mamostetiya kurdî ya zarokên kurdan jî kiriye. Berda karê dikandariyê jî kiriye.

Firat Cewerî gelek berhemana nivîsandiye û wergeran kiriye. Di pêveka yekem ya di dawiya vê xebatê de ew berhem henin ku ji hêla *weşanxaneya Nûdemê* ve hatine weşandin, di wir de em dikarin di derbarê pirtûk û wergerên Firat Cewerî de agahî hildin. (Pêvek 1)

---

<sup>136</sup> Cewerî, h.g. r.92

<sup>137</sup> Cewerî, h.g. r.92-93

Pey ku bi gelemperî me Firat Cewerî da nasîn em ê vê carê behsa girîngî û cihê wî yê di kovara *Nûdemê* de bikinç. Her wekî ku me got Firat Cewerî edîtorê vê kovarê ye û di heman demê de xwedî û berpirsiyarê wê jî ye. Hemû nivîsên sereke (edîtoriyal) ji hêla wî ve hatine nivîsîn. Bi navê xwe ve wergeran kiriye û nivîsan di babetên cuda de nivîsîne. Dîsa ew bi navê Dr. Poloço ve navê mustear bikar anîye û bi vê navê ve bi gelemperî wergeran kiriye. Ew ji bo bikaranîna vê nave wuha dibêje;


*“Min navê Dr. Poloço hê berî dema Nûdemê bi kar dianî. Ji ber ku dema min dinivîsand temenê min biçûk bû û ez ji temenê xwe jî hê biçûktir dixuyam. Loma, kê li min dînerî, digot, ma wê ji ku vî zarokî ev tiştên cidî nivîsandibe. Yek jê min xwest bi vî navî hem bibihîzim ka gelo xelk di derheqê nivîsên min de çi difikirin, di dema Nûdemê de jî min xwest bi sernava Doktor bidim diyarkirin ku kadroya Nûdemê kadroyeke rengîn e.”(Pêvek 3)*

Ew dibêje min ji bilî navê xwe û Dr. Poloço navê Hatîce Al jî biakr anîye.

Her wekî ku me di serê vê beşê de jî got, me ji hemû hejmarên *Nûdemê* ango ji çil heban deh lib wek gurza numuneyê hilibijart û li ser wan kûr bûn. Me tabloyek ji wan hejmaran amade kir û di wê tabloyê de me van tiştan diyar kir; navê nivîskar, zaravayê wî/wê, cura nivîsê, eger nivîs werger e ji kî werger hatiye kirin. (bnr. Pêvek 2) Firat Cewerî gelek cûreyên nivîsan bikar anîye. Em ê nuha ew nivîsên *Nûdemê* yên ku Firat Cewerî bi navê Firat Cewerî ve nivîsîne di Diyagrama gilover de bidin.

Şekil 3: 4.5.1.a. Rêjeya nivîsên Firat Cewerî ya di G.N. a *Nûdemê* de

- |                              |               |
|------------------------------|---------------|
| ■ Nameyên Xwendekaran        | ■ Biyografî   |
| ■ Hevpeyvîn                  | ■ Lêkolîn     |
| ■ Nivîsa Sereke (edîtoriyal) | ■ Parçepirtûk |




Di diyagrama gilover 3.5.1.a. de, em dikarên rêjeya nivîsên Firat Cewerî yê di gurza nimûneyê de bibînin. Nêzikê sedî pêncî nivîsên wî ji *nivîsên sereke* pêk tîne. Em dikarin sedema vê yekê bi xwedî û berpirsiyariya kovarê ve girê bidin. Sedî sihê nivîsên wî, bi rêjeyên wek hev ve, ji *hevpeyvîn* û *lêkolînan* pêk tîne. Ji çaran yek nivîsên wî jî ji *nameyên xwendekaran, biyografî, parçepirtûk, çîrok* û *rexneyan* pêk tîne.

Em di vê diyagrama gilover de rast li heşt cur nivîsan tîne. Ji vir tê fêmkirin ku ji bo derketina vê kovarê Firat Cewerî bareke gelege giran hildaye li ser milên xwe. Ji van nivîsan qîsmeke wan werger in. Mesela Firat Cewerî ji Oktavîo Paz werger kiriye. Oktavîo Paz yek helbestvanê Emrîka Latînî ye ku xelata Nobelê ya Edebiyatê dest xistiye. Em ê di vê xebatê de li ser wergerê zêdetir bisekinin û di *Nûdemê* de ji kêjan nivîskaran çî cur nivîs hatinin wergerandin, bi kûrahî vekolin.

Me got xwedî û berpirsiyarê *Nûdemê* Firat Cewerî bû. Em di *Nûdemê* de rastê hin nivîsan tîne ku wek nivîskar *Nûdem* derbas dibe. Em dizanin ku barek giran yê kovarê Firat Cewerî hildabû ser xwe û van nivîsan jî ji hêla Firat Cewerî ve hatibûn nivîsîn. Yanî em dikarin van nivîsan wek nivîsên Firat Cewerî nîşan bidin. Di diyagrama gilover ya 2 de, em dikarin rêjeya nivîsên bi navê *Nûdemê* ve derketinin bibînin

Şekil 5: 3.5.1.b. Rêjeya Nivîsên Firat Cewerî ya di G.N.a Nûdemê de



Di rêjeya diyagrama gilover 3.5.1.b. de, sê perçan nêzîkê du parçeyan ji *hevpeyvînan* pêk tê. *Lêkolîn û helbest* bi rêjeyeke wek hev ve piçek kêmtirê sedî bîst e. Ya maye jî ji *nameyan* pêk hatiye. Em ji pîrbûna *hevpeyvînan* dikarin vê fêhm bikin ku Firat Cewerî ji bo nivîsan ji *Nûdemê* re amade bike vê metodê bikar aniye. Em dizanin ku *helbestên* ku li ser navê *Nûdemê* hatine nivîsîn ji hêla Firat Cewerî ve hatin nivîsîn lê ev *helbestan* werger in. Hin name jî bi navê *Nûdemê* derketine ev *nameyan* ji hêla Firat Cewerî ve wek bersiv hatine nivîsîn ji bo xwendekar an nivîskarên *Nûdemê*.

Me got Firat Cewerî bi navê Dr. Poloço jî nivîsan dinivîsî, Curêyê van nivîsan werger bûn. Em dema li gurza nimuneyê dinêrin, em rastê du wergeran tên. Ji van wergeran yek jê rexneye û ji Paul Lafargue hatiye wergerandin û ya din jî çîrok e û ji Hemîngway hatiye wegerandin.

Em dikarin bêjin Firat Cewerî di nav nivîskarên *Nûdemê* de nivîskarê herî aktîf bû. Bi gelek cur nivîs û wergeran ve rûpelên *Nûdemê* rengîn kiriye. Lê Firat Cewerî di gelek cihên kovara *Nûdemê* û cihên din de û wextên cuda de haniye ziman ku kovara *Nûdem* bi şev û roj bi zivistan û payîz deh salên wî xwarine.

### 3.5.2. Derwêş Medenî Ferho

Derwêş M. Ferho di sala 1961ê de li gundê Mizîzexê hatiye dunyayê ku ev gund girêdayê Mîdyadê ye. Wek pîrî kurdan roja bûyîna Derwêş M. Ferho jî nayê zanîn lê ew dibêje di rojêke zivistanê de hatime dunyayê. Di sala 1984an de pirtûka wî ya *helbestan* bi navê “*Dengê Roja Dîl*” hatiye çapkirin. Dîsa ferhengên basît yên bo turîstan “*Kurdî-Holandî*” û “*Kurdî-Tirkî*” derxistine.<sup>138</sup>

Derwêş M. Ferho sekreteriya *Enstîtuya Kurdî ya Brukselê* jî kiriye. Lê pêşiya ku ew enstîtu ava bibe, li Brukselê komek bi navê *Tekoşer, Yekîtîya Karker û Xwendekarên Kurd* hebûye û ew endamê wir jî bûye. Ew dibêje “*Tekoşer* di van yanzeh salan de xebatek hêja kir. Ew nekete bin tesîra partiyên kurd yên siyasî. Vê rêxistinê armanca xwe ji roja pêşî ve diyar kir. Divabû ew rêxistin Kurdistanî ba. Ne girêdayî tu hêz an partiyên siyasî ba.”<sup>139</sup> Ji van gotinên Derwêş M. Ferho jî tê famkirin ku ew şexsiyeteke Kurdistanî ye û di nav siyaseta kurdan de xwe aîdê tu hîzbek hîs nake. Ji xwe dema em polîtîkaya *Nûdemê* jî dinêrin di kovara *Nûdemê* de jî polîtîkayeke vî rengî hatiye qebûlkirin.


<sup>138</sup> Derwêş M. Ferho, “Kurtejiyana Min”, *Nûdem*, j.4. (Zivistan 1992), r.111-112

<sup>139</sup> Firat Cewerî, “Enstîtuyên Kurdî” *Nûdem*, j.6, (Bihar 1993), r.17

Di çêbûyîna nasnameya Derwêş M. Ferho ya Kurdistanê de gelo çî bi bandor bû? Ew sebebê wê bi dema zarokatiya xwe ve girêdide. Ew dibêje, “Kekê min, ku mamoste bû, di sala 1971ê de ji aliyê dewleta Tirk hate hepskirin. Girtina wî tesîreke mezin li min kir. Di wê demê de min dest bi nivîsa helbestan kir. Tiştên min dinivîsîn bi pirranî protestoya diwariya jînê bûn. Protestoya zilm û diwariyê bûn.”<sup>140</sup> Ew dema dest bi nivîsê dike, bi nivîsên polîtîk dest pê dike. Ew dibêje, “Eskerê ‘Rom’, polîsê xedar, muxbîrên bêbext ku xwe firoştine dewletê, feqîr û belengazî tesîreke dijwar li ser min kir. Ez bûm dijminê van tiştan. Ew tişt jî bûn sedemê nivîsa min.”<sup>141</sup>

Derwêş M. Ferho jî yek ji wan rewşenbîrên kurd e ku giringiyê dide zimanê kurdî û bi zimanê kurdî ve dinivîsîne. Ew rexneyan ji rewşenbîrên kurd yên tirkînivîs dike û di vê derbarê de wiha dibêje, “Demek berê meriv dinêrî ku çend kesên nivîskarê zimanê kurdî bibîne. Mixabin kêm bûn. Pîrr kurd nivîskar hebûn, pîrr kurd rewşenbîr hebûn, lê meriv çî bêje, ew nivîskar û rewşenbîrên tirkî bûn. Mala wan ava be wilo jî man”<sup>142</sup>

Şekil 6: 3.2.2. Rêjeya Nivîsên Medenî Ferho di G.N.a Nûdemê de



<sup>140</sup> M. Ferho, h.g, r.111

<sup>141</sup> M. Ferho, h.b, r.111

<sup>142</sup> M. Ferho, h.g, r.112

Di diyagrama gilover 3.5.2an de, rêjeya nivîsên Derwêş M. Ferho yên di gurza nimuneyan de hatiye diyarkirin. *Helbest, lêkolîn û çîrok* cureyên nivîsên wî ne. Rêjeya hemû cur nivîsên ku ew nivîsîne wek hev in.

### 3.5.3. Şahîne Bekirê Soreklî

Şahîne B. Soreklî kurdên Kobaniya rojavayê Kurdistanê ye. Ew di sala 1965an de, 19 saliya xwe de ji welêt dertê. Ango di sala 1946an de hatiye dunyayê. Ew pêşî diçe Ewropayê û pey wê derê derbasê Awustralyayê dibe. Di destpêka 1974an de ji nû ve dest bi xwendinê dike û di dawîya sala 1977an de di zanîngeha Macquarie ya Sydney de xwendina xwe bi şehadeyên Bachelor of Arts û Diploma of Education tewaw kiriye. Di 1988an ji bo Wezereta Perwerdehiyê ya Wîleyeta New South Wales dest bi xebatê kiriye.<sup>143</sup>

Şahîne Bekirê Soreklî di piçûktiya xwe de dest bi siyaseta dîke. Ew dibêje, “Di sinifa heftem, yan heştam de berpirisyarê partiya Komonîst li bajêr ez û du hevalan birin mala xwe û dersa me ya yekem di siyaseta “hizbî” de da me. Me êdî dest pê kir pirtûkên li ser Marksîzm-Lenînîzmê bixwînin.”<sup>144</sup> Pey vê, ji bo xwendinê Soreklî diçe Helebê û li wir dikeve nav aktîvîteyên siyasî. Ew rewş ji hêla malbata wî ve tê bihîstin û tişteke xerîb e ku malbata wî anga bavê wî jî piştgiriya dide wî. Ew dibêje, “Li Helebê em fêr xwebêja *Newrozê* bûn û me dest pê kir *Newrozê* pîroz bikin. Me belavok xwendin, belav kirin, di civînan de beşdar bûn, li ser mafên kurdan gotûbêj kirin. Ev bû xebata me ya siyasî, ‘veqetxwaz û nijadperest’”<sup>145</sup>

Şahîne Soreklî jî wek xwedî û berpirisyarê kovara *Nûdemê* Firat Cewerî xwediyê fikrên Kurdistanî bû û van fikran li derveyê welêt anga li Ewropayê dest xistibûn. Ew di nivîsa xwe ya di sala 1992yan de dibêje, ji 46 salên jiyana min tenê dora 14 salan bi tevahî li Kurdistanê derbas bûne, 5 salên din yê ber derketina welêt li Helebê derbas bûye, tev wê jî hestê kurdayetîya min li derveyê Kurdistanê kûrtir bûye. Li gelek cihan de Soreklî Kurdistanîbûna xwe tîne ziman û dibêje, di sala 1979an de li Awustralyayê komeleya kurd ya yekem damezirand, komeleyeke ku di destpêkê de li ser hîmên

<sup>143</sup> Şahîne Bekirê Soreklî, “Ji Australya: Roj Baş”, *Nûdem*, j.4, (Zivistan 1992), r.46-48

<sup>144</sup> Soreklî, h.g, r.47


<sup>145</sup> Soreklî, h.g, r.47

Kurdistanî hatibû damezirandin, dostaniya hemî partiyên kurd dixwast, piştgiriya hemî beşên welêt dikir.<sup>146</sup>

Şahîne Bekirê Soreklî xweyê taybetiya bi zimanê kurdî nivîsînê bû, taybetiyeke bingeîn ya kovara *Nûdemê* jî ev bû. Ev rewş jî îmkân da ku Soreklî di nav kodaroya *Nûdemê* de cih bigrê. Ew ji bo girîngîya ziman dibêje;

*“Eger nivîskarên neteweyekê li ser nexweşiyên civaka xwe nikaribin binivîsin; eger endamên wê civakê nikaribin bi zimanê xwe li ser van pîrsa bixwênin, gelo em ê çawa nexweşiyên xwe derman bikin?! Me du nîşên xwe di rêya ‘karkirên cihanê bi yek bin’ de wenda kirin. Gelo çend nîşên din divêt wenda bibin, da em fêr rastî û şaşiyên xwe bibin?!”<sup>147</sup>*

Şekil 7: 3.5.3. Rêjeya Nivîsên Sahîne Bekirê Soreklî ya di G.N.a Nûdemê de



Dema em nivîsên Şahîne Bekirê Soreklî di gurza mînakên ya nivîsên *Nûdemê* de dinêrin em dibînin ku di sê curan de wî nivîs nivîsîne; *çîrok*, *serpehatî* û *hevpeyvîn*. Rêjeya herî zêde ku ji nivê hemû nivîsên wî zêdetir in, *çîrok* in. Sedî çil nivîsên mayî jî bi rêjeyeke wek hev ve ji *hevpeyvînan* û *serpehatiyan* pêk tên. Em dikarin bêjin ku Soreklî nivîskareke *Nûdemê* bû ku bi giranî çîrokan dinivîsî.

Soreklî wergeran jî kiriye. Ew ji Antione De Saint-exupery wergerên çîrokan jî kiriye. Em ê peyra bi kûrahî li ser wergeran bisekinin. Soreklî yek nivîskareke bingeîn

<sup>146</sup> Soreklî, h.g, r.50

<sup>147</sup> Soreklî, h.g, r.51

yê *Nûdemê* bû ku hevkarê kovarê yê Auwstralayayê bû û bi piranî jî bi çîrokên nûjen ve beşdarî nivîsên kovara *Nûdemê* dibû.

#### **3.5.4. Dr. Cemşîd Bender**

Dr. Cemşîd Bender nivîskarek ji nivîskarên *Nûdemê* yê tirkînivîs e, lê nivîsên wî dihatin wergerandin ji bo kurdî û paşê dihat weşandin. Ew hevkarê Tirkiyê yê kovara *Nûdemê* bû. Ew di nav tirkan de ango li Edeneyê mezin bûye. Bavê wî ji Bîngolê û diya wî jî ji Wanê ye. Lê di herba cihanê ya yekem de malbatên dê û bavê wî mecbûr mane koç kirine û ji ser Helebê re derbasî Edeneyê bûne. Ew di sala 1927an de hatiye dunyayê. Dibistana destpêkê, a navînê û lîseyê li bajarê Edeneyê xwendiyê. Di sala 1946an de li Stenbolê dest bi zanîngehê kiriyê. Ji hêla mamosteyên cihû ve hatiye perwerdekirin yê wek Neumark, Swarts, Crozat, ku ji ber zilma nazîstan bazdabûn û li fakulteya hukûkê ya Stenbolê porfesorî dikirin. Di sala 1950 de mezûn bûye û pey sê çar salan ji bo doktoraya hukûkê çûye Parîsê.<sup>148</sup>

Çîroka têkiliya Dr. Bender bi kurdî re hinek ji nivîskarên din yê *Nûdemê* cudatir e, ji ber ku ew li gund û bajareke Kurdistanê na lê di bajareke tirkan de xwendiyê. Ew dema li Parîsê di pirtûkxaneyan de dixebite, rast li pirtûkên derbarê kurdan de tê û pey wê têdigihê ku paşerojeke kurdan ya dewlemend heye û gelek medeniyet ji dema antîk ji hêla kurdan ve pêşberî medeniyetê bûye. Ew di nav tevgerên şoreşgeriyê de jî cih digrê. Dema li Parîsê ye di nav tevgerên ji bo azadiya Cezayîrê peywir digrê. Pey darbeya 71ê ya li Turkiyê dikeve girtîgehê lê pey pênc mehan dertê.<sup>149</sup>

Nivîskariya Dr. Cemşîd Bender digihê salên dibistana navîn. Kurteçîroka wî ya pêşîn di kovara Arkadaş de derketiye ku ev kovar li Stenbolê diweşiya. Di salê 1959-60î de bi alfkariya wergerên jina wî ya Norvecî, çîrokên wî di kovarên Norvecî û Danîmarkî de weşiyane. Ew bi zimanê tirkî nivîsiye lê ew di vê derbarê de dibêje, ez nivîskarekî kurd im ku ji zimanê dayîka xwe hatime birîn û nikarim pê binivîsînim. Ji ber ku ez bi tirkî dinivîsim nayê wê manê ku ez ne nivîskarekî kurd im. Dîsa dibêje, ji xwe ev heftê sal in, ku nivîsandina bi kurdî li Tirkiyê qedexe ye. Lê ez nivîskarekî kurd im û ez bi vê jî serbilind im.<sup>150</sup>

<sup>148</sup> Cemşîd Bender, "Çîroka Jiyana Min", *Nûdem*, j.4, (Zivistan 1992), r.105

<sup>149</sup> Bender, h.g, r.105-106

<sup>150</sup> Bender, h.g, r.106-107

Dr. Cemşîd bender yek damezirînerê *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* ye û hevkarê kovara *Nûdemê* ya li Turkiyeyê ye. Nivîsên wî yên di *Nûdemê* de, ji hêla *Nûdemê* û hin caran ji hêla hin nivîskarên din ve hatine wergerandin û di kovarê de hatine weşandin. Her çiqas di gurza numuneyên hejmarên *Nûdemê* de nivîsên wî tunebin jî, di hejmarên din yên kovarê de nivîsên wî henin.

### 3.5.5 Zeynelabîdîn Zinar

Zeynelabîdîn Zinar di sala 1953yan de hatiye dunyayê. Bavê wî mele ye û ew ji ber vê yekê hêj ji zaroktiya xwe dest bi xwendinê kiriye. Pêşî li cem bavê xwe di nav feqiyên bavê xwe de xwend. Pey dibistanê ew di sala 1968an de dest bi lîseyê Îmam-Hatîbê dike lê ji ber cûntaya leşkerî ya sala 1971an ji dibistanê tê avêtin. Çend salan meletiyê dike û paşê di sala 1974an de di belediya Elihê de dest bi karmendiyê dike. Di cûntaya 1980 de ew gelek caran tê girtin û îşkence dibîne û paşê di sala 1984an de ji welêt direve û diçe Swêdê.<sup>151</sup>

Nivîskariya Zeynelabîdîn Zinar digihîje salên 1962an. Ew bi helbestan dest bi nivîsê dike û di serî de ji bo nivîsîna van helbestan alfabeya erebî bîkar tîne. Wek ku ew dibêje, hewesa wî gelek ji helbestên Melê Cizîrî, yên Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û Cegerxwîn tên.<sup>152</sup> Mîna gelek nivîskarên kurd yên surgunkirî, Zinar jî di biçûktiya xwe de rast hin bûyeran hatiye û fikrên wî yên kurdeyetyê şikl girtine. Di vê derbarê de ew behsa serpêhatiyekê xwe dike ku serpêhatî wiha ye,

*“Temenê min li dora heft, heşt salan bû. Ez tenê bi riyekê ve diçûm. Du cendirme rastî min hatin. Ew bi min re peyîvîn. Lê min tu tişt ji zimanê wan fêm nedikir. Yekî du şemaq li min xistin û ez giriyam. Dema ez çûm malê, min ji bavê xwe pirsî:*

*- Li rê du cendirme laqî min hatin, min û wan ji zimanên hevdu fam nedikir. Ez kurê mela me jî, yekî du şemaq li min xistin. Çima cendirmeyên Kurd jî nînin?*

*Bavê min kenîya û piştî jî hinek ponijî, got:*

*- Dema tu mezin bibî, tu yê sedem zanibî.”<sup>153</sup>*

Ev bûyer û bûyerên ku di girtîgehên Tirkiyê yên pey cûntaya 80yî di hişê Zeynelabîdîn Zinar de gelek bibandor bûne. Ew girtîgehan de rastê gelek heqaretên vî rengî hatiye ku ji wî re gotine, ne zimanê kurdan ê nivîskî heye û ne jî kurd ew meriv in ku karbin dewletek çê bikin. Ew gotin û gotinên din yên weke wan li ser Zinar

<sup>151</sup> Zeynelabîdîn Zinar, “Kurtebehseke Jiyanê”, Nûdem, j.4, (Zivistan 1992), r.82

<sup>152</sup> Zinar, h.g, r.83

<sup>153</sup> Zinar, h.g, r.83

bandoreke wisan çêkiriye ku ew dema gihiştiye Swêdê ji bo xwe du programên mezin amade kirine. Yek, wergerandina klasîkên bi tîpên erebî bo tîpên latîn û çapkirina wan. Ya din, programa *Xwençe* ku ew ê gotinên pêşiyar, çîrok, meselok, lêqemok, serpêhatî, stran û dîlokên ji nav xelkê berhev bikira, binivîsanda û wek pirtûk çap bikira.<sup>154</sup>

Hemû nivîsên di gurza nimune ya kovara *Nûdemê* de yê Zeynelabîdîn Zinar lêkolîn in. Dema em li van lêkolînan dinêrin ew bi piranî lêkolînên li ser nivîskarên edebiyata klasîk ya kurdî û berhemên wan in. Em dikarin bêjin ku Zeynelabîdîn Zinar di kovara *Nûdemê* de valahiya edebiyata klasîk ya kurdî tijî kiriye. Dîsa di hin gotarên ji hêla xwedî û berpirsiyarê giştî yê kovara *Nûdemê* Firat Cewerî de tê gotin ku ew di alîkariya çapê de û ji bo redaktasyonê jî alîkarê Firat Cewerî bûye.

### 3.5.6. Xelîl Dihokî

Xelîl Dihokî, wek ji navê wî jî tê fêmkirin ji başûra Kurdistanê ji bajarê Dihokê ye. Ew di sala 1951ê de hatiye dunyayê. Diya wî ji Şîmexê ye û ji ber herba cihanê ya duyem reviyê Dihokê û li wir mêr kiriye. Dema kurdên başûr di sala 1970an de, hin mafên neteweyî dest xistin li Kurdistanê bi kurdî perwerdehî dest pê kir. Xelîl Dihokî jî di wê salê de dest bi nivîsa helbestan kir û di sala 1972an de di rojnameya *Hewkarî* de dest bi belavkirina van helbestên xwe kir. Dema di sala 1974an de careke din navbera kurdan û nijadperestên Iraqîyan xerab bû, Dihokî kete nava safên şoreşê. Ji ber zor û zulma sîstema Iraqê ew mecbûr ma ku koç bike û di sala 1987an de bigihêje Swêdê.<sup>155</sup>

Xelîl Dihokî hevkarê kovara *Nûdemê* yê Swêdê bû. Ew pirî canan bi wan nivîsan ve beşdarê nav rûpelên *Nûdemê* dibe ku nivîskar û hunermendên kurdan bi taybetî jî yê başûr didin nasîn. Yanî em dikarin bêjin ku Xelîl Dihokî valahiya agahiyên di derbarê başûrê Kurdistanê de tijî dikir. Nivîsên Xelîl Dihokî yê di gurza nimûneyan a *Nûdemê* de ji hevpeyvîn û lêkolînan pêk tên. Lê bi piranî lêkolîn in. Xelîl Dihokî her çiqas jî başûr be jî, ew kurmanc e û bi devoka behdînan dinivîsîne. Bi nivîsên wî ve xwendevanên *Nûdemê* ferî devoka behdînan jî dibin.

### 3.5.7. Mehmed Uzun


Mehmed Uzun yek ji afirînerê edebiyata modern a kurdî ye. Di romanivîsîna kurdî de cihekî wî yê taybet heye. Ew di sala 1953yan de li Sêwregê hate dinyayê. Di sala 1977an de koçê Swêdê kir û heta mirina xwe jî li wir jiyana xwe berdewam kir. Bi

<sup>154</sup> Zinar, h.g, r.84

<sup>155</sup> Xelîl Dihokî, "Çîroka Jiyana Min", *Nûdem*, j.4, (Zivistan 1992), r.121-122

zimanê kurdî, tirkî û swêdî berheman da. Ew endamtiya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê kiriye. Di klûba PEN a Swêdê û ya navnetewî de bi awayek çalak kar kiriye. Dîsa endamê yekîtiya Rojnamegerên Swêdê û Cîhanê bû. Heft romanên wî henin û di gelek kovar û rojnameyên kurdan de nivîsên wî derketine. Ew gelek xelatan girtiye. Mesela “*Xelata Raman û Ravekirinê*” ji hêla *Yekîtiya Weşangeriya Tirk* ve, dîsa xelata herî girîn ya Skandînavya “*Torgny Segerstedt*” a bi navê “*Xelata Pênûsa Azadiyê*” sitendiye û her wekê vê gelek xelatan jî girtiye.<sup>156</sup>

Şekil 8: 3.5.7. Rêjeya Nivîsên Mehmet Uzun ya di G.N. a Nûdemê de



Diyagrama gilover 3.5.7, nivîsên Mehmed Uzun yê gurza nimuneyan a *Nûdemê* nîşan dide. Mehmed Uzun her çiqas hevkarê kovara *Nûdemê* nebe jî bi nivîsên xwe ve bi taybetî jî bi parçeromanên xwe ve kêmasiya parçeromanên di kovara *Nûdemê* de tije dike. Piraniya nivîsên wî ji helbestan pêk tê. Lê her çiqas em di vê diyagrama gilover de nebînin jî pirî van helbestan werger in. Ji bilî parçeroman û helbestan Mehmet Uzun bi rexneyan ve jî di nav rûpelên *Nûdemê* de nivîsên xwe weşandine.

### 3.5.8 Rojen Barnas


Rojen Barnas yek helbestvanê mezintirîn ê helbesta kurdiya kurmancî ye. Ew ji Farqîna Diyarbekirê ye. Di sala 1945an de hatiye dinyayê. Xwendegeha destpêkê û

<sup>156</sup> Mehmed Uzun, *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, Çapxaneya Îthakî, İstanbul, 2010, r.1

navînê li Farqînê, lîse û enstîtuya hînkariyê li Diyarbekirê xwendiyê. Di 1966an de wek hînkare koma edebiyatê dest bi kar kiriye û di hîn xwendegehên navîn û lîseya Silîvan de xebitiye.

Ji ber xebat û tevgerên xwe yê welatparêzî û şoreşgerî ew di sala 1971an de ji hêla îdara leşgerî ve hatiye girin û du salan ceza xwariye. Di sala 1979an de bi hin nasnavên cuda ve nivîsan nivîsiye. Di sala 1982yan de mecbûr maya welat terk kiriye û çûye Swêdê.<sup>157</sup>

Şekil 9: 3.5.8. Rêjeya Nivîsên Rojen Barnas a di G.N. a Nûdemê de



Diyagrama gilover 3.5.8, derbarê nivîsên Rojen Barnas yê di gurza nimunan a *Nûdemê* de agahî dide. Curên nivîsên Rojen Barnas yê ku di vê diyagrama gilover de dertên pêşberî me; *helbest*, *serpêhatî* û *lêkolîn* in. Ji çar perçên nivîsên Rojen Barnas sê perçên wî *helbest* in. Em dikarin bêjin yek *helbestvanê* kovara *Nûdemê* yê bingehîn Rojen Barnas e. Parçeya ji sê perçan mayî jî ji *lêkolîn* û *serpêhatiyan* pêk tê, lê rêjeya *lêkolînan* sê qatê *serpêhatiyan* e. Rojen Barnas her çiqas hevkarê kovara *Nûdemê* nebe jî ew nivîskarekî bingehîn yê kovarê ye.

<sup>157</sup> Rojen Barnas, Kadiz, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2013, r.4

### 3.5.9. Rohat Alakom

Rohat Alakom an jî tenê Rohat lêkolînerê mezînan yê nav û deng yê kurdan e. Ew di sala 1955an de li Qaxizmana Qersê gundê Kabakomê hatiye dunyayê. Dibisatana seretayî û ya navîn li Qaxizmanê xwend û 1983yan de li Qersê lîseyê qedand. Di navbera salên 1974-78an de li Erzurumê di Zankoya Perwerdehiyê de xwend. Pey vê yekê derkete dervê welêt û ji sala 1983yan vir ve li Swêdê dijî. Bi zimanê kurdî, tirkî û swêdî gelek berhemên lêkolînerî nivîsîye.<sup>158</sup>

Rohat Alakom bi navê Rohat û Rohat Alakom gelek nivîsên lêkolînî di *Nûdemê* de weşandiye. Ew ji bilî lêkolînan danasîna pirtûkan jî kiriye. Di gurza nimunan a *Nûdemê* de, sê parçe ji çar parçeyan nivîsên wî *lêkolîn* û perça mayî jî *danasîna pirtûkan* e. Em dikarin bibêjin ku Rohat Alakom yek nivîskarekî bingehîn e ku di kovara *Nûdemê* de valahiya lêkolînan tije kiriye.

### 3.5.10. Ferhad Pîrbal

Ferhad Pîrbal nivîskarê *Nûdemê* yê beşa soranî bû. Ew di sala 1961ê de li Hewlêrê ji dayîk bûye. Di sala 1979an de yekemîn berhema wî hate çapkirin. Di sala 1984an de ji Iraqê koç kir û li Îranê bû penaber. Piştê wê bi salekê ber bi Polonya û Almaniyayê û piştê jî li Denmarkê mafê penaberîya siyasî wergirt. Di sala 1987an de li zaningeha Sorbonne dest bi xwendinê kir û di sala 1994an de wegeriya Kurdistanê.

Ferhad Pîrbal nivîskarê beşa soranî ya kovara *Nûdemê* bû û di heman demê de hevkarê *Nûdemê* yê Fransayê bû. Di demên pêşî yê *Nûdemê* de, ekîba *Nûdemê* dixwest *Nûdem* bi hemû zaravayên kurdî derkeve. Ji bo vê yekê bikin jî nivîsên zazakî û soranî jî di *Nûdemê* de dihat weşandin. Em dikarin bêjin hema hema hemû nivîsên soranî ji hêla Ferhad Pîrbal ve dihatin nivîsîn. Lê paşê vîzyona kovara *Nûdemê* de guherîn pêk hat û ji vê biryara xwe vegeyriyan û tenê nivîsên kurmançî weşandin. Ev jî bû sebeb ku êdî Ferhad Pîrbal nivîsan nenivîse. Lê em di kovara *Nûdemê* de rast helbesteke Ferhad Pîrbal tên ku bi zaravayê kurmançî hatiye nivîsîn. Di gurza nimune ya *Nûdemê* de em rastê nivîsên Ferhad Pîrbal hem yê soranî hem jî yê kurmançî tên. Nivîsên wî yê soranî lêkolîn in lê nivîsên wî yê kurmançî helbestin. Em dikarin bêjin Ferhad Pîrbal ji bo demeke kurt be jî valahiya soranî ya *Nûdemê* tije kiriye.

---

<sup>158</sup> Rohat Alakom, Kars Kürtleri, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009, r.4

## BEŞA ÇAREM

### DI KOVARA *NÛDEMÊ* DE ŞOPÊN SURGUN Û DIYASPORAYÊ

Surgun cihûwarêxwebûyînek e ku di encama hin pirsgirêkên sosyo-polîtîk de dertê meydanê. Lê hemû cihûwarêxwebûyînin ne surgun in. Dibe ku di encama hin pirsgirêkên aborî an civakî de kes xwe mecbûr hîs bikin ku welatê xwe biterikînin. Ango hemû cihûwarêxwebûyînin ne di encama zordestî an jî bi darê zorê pêk tê. Lê surgun cihûwarêxwebûyînek e ku di encama darê zorê de derdikeve. Ango kes an grub dema bi darê zorê ji bo koçê mecbûr dimînin surgun derdikeve meydanê. Gelo diaspora çi ye û şimûlê kêjan gruban dibe? Diaspora jî cihûwarêxwebûyînek e. Li ser şumûla diasporayê gelek gengeşî henin. Hin dibêjin tenê wan kesan dikevin nav diasporayê yên ku di encama pirsgirêkên polîtîk û bi darê zorê ji welatê xwe hatinin derxistin. Lê li gor gelek nivîskarên modern vê şumûla diasporayê hatiye berfirehkirin û hemû kesên ku ji welatên xwe derketine û herî kêma du welatên din belav bûne wek diaspora hatine qebûlkirin. Me di nav beşên jor de behsa vê yekê bi berfirehî kir. Pey ku me kurtasî behsa şumûla surgun û diasporayê kir em ê niha li ser pêwendiya wan bisekinin.

Surgun dibe ku tenê be lê diaspora civatek e. Ji vê aliyê xwe ve diaspora berfirehtir e. Diaspora organîzasyon in ku ji hêla wan kesên cih û warê xwe bûne ve tê kirin. Ango kesên ku surgun bûne jî di nav van organîzasyonan de cih digrên. Heta em dikarin bêjin ku ji bo kurdan bi rêjeyeke bilind ve van organîzasyonan ji hêla kesên surgunbûyî ve pêk hatinin. Kes dema surgun dibin, bi gelek dijiwariyan re rûbirû dimînin. Ew dema bi van dijiwariyan re rûbirû dimînin du alternatîf dertê pêşiya wan; yek, têkçûyî û di koşa xwe de bédengmayî û du, bi wan zehmetî û dijiwariyan re mucadele û bi nasîna çand û milletên din ve xwe pêşxistin û ji bo gruba xwe kêrhatin e. Ji xwe civatên diasporayê bi gelemperî ji hêla wan kesan ve tî avakirin ku di encama surgunê de têk naçin û di nav tevgerên curbicur de cih digrên.

Pey van vegotinan vê carê em ê şopên surgun û diasporayê di vê çarçoveyê de di kovara *Nûdemê* de bigerin. Kovara *Nûdemê* kovarek bû ku li diasporayê û ji aliyê kesekî surgunbûyî ve dihat derxistin û bi gelemperî jî şopên jiyanê surgunê û diasporayê di wê de tê xwiyane. Em ê di vê beşê de, di çarçoveya taybetiyên surgun û diasporayê de vê kovarê binirxînin. Em di kovara *Nûdemê* de şopên diasporayê

zexm dibînin. Eger em di nav cureyên diyasporayê de cureya ku diyasporaya kurdan aîde tespît bikin û di kovar *Nûdemê* de taybetiyên vê cur diyasporayê bigerin dîsa em taybetiyên diyasporayê yên gelmperî di *Nûdemê* de bigerin ku ji hêla surgunan ve ev diyaspora derketiye meydanê, em ê şopên surgunê û diyasporayê di vê kovarê de bikaribin bişopînin. Di vê çarçoveyê de, em ê, her wekî ku me di beşa jor de jî diyar kiribû, behsa cureyên diyasporayê bi kurtî bikin û li ser wê curê bisekinin ku kurd di nav de nin. Pey wê, em ê di kovara *Nûdemê* de tiştine bi vê taybetiyê re eleqedarin bibîn. Pey re em ê taybetiyên diyasporayê yên gelemper bidin û binêrin ka gelo di kovara *Nûdemê* de çiqas em ê bikaribin şopên wan bibîn.

#### 4.1. DI NÛDEMÊ DE CUREYA DIYASPORAYA KURDÎ

Gelek cureyên diyasporayê henin ku li gor nivîskaran curbicur hatin sinifandin. Me di beşa têgehê de li ser sinifandina Michel Bruneau sekinî ku ew diyasporayê di bin çar beşan de disinifîne. Li gor wî, cureya ewil ya diyasporayê li *derûdora qutbeke mutesebbîsiyê*, ya duyem li *derûdora qutbeke dînî*, ya sêyem li *derûdora qutbeke polîtîk* û ya çarem jî li *derûdora qutbeke nijadî û çandî* kom dibe. Me di wê beşê de van cur diyasporayan terfî kiribû. Di nav van cur diyasporayan de cura ku diyasporaya kurdan di nav de ye cura sêyem e; anga cura ku li *derûdora qutbeke siyasî* kom bûye. Ji ber ku ev cur diyaspora di encama bertekê li hember hêzên dagirker derketiye. Anga diyasporaya kurdan ji hêla wan kesan ve pêk hatiye ku ew di encama hêzeke biyanî ya dagirker welatê xwe terk kirine û wek bertekê li hember vê yekê ji bo welatê xwe dest bi çalakiyan kirine. Em ê nuha di *Nûdemê* de şopên van çalakiyên li hember van dagirkeran bibînin da ku em îsbat bikin ku *Nûdem* kovarek e ku ji hêla kesên surgunbûyî ve hatiye derxistin û çalakiyên van surgunan di *Nûdemê* de wek civata diyasporayê cih digrê.

Em dizanin ku kovara *Nûdemê* ji hêla Firat Cewerî ve hatiye derxistin. Wek me di beşên ewil de jî haniye ziman, Firat Cewerî û bi gelmperî nivîskarên din yê kadroya *Nûdemê* yê bingehîn ji ber şert û şûrtên siyasî ji welêt reviyên. Anga ji ber cuntaya faşîst ya sala 1980yê welêt terk kirin. Dema em nivîsarên wan yê *Nûdemê* dinêrin pêşiya ku ev kes bî Ewropayê li welêt jî aktîvîst bûn. Mesela ji bo vê yekê em dikarin Mahmûd Baksî mînak bidin. Di hejmarê duyem ya kovara *Nûdemê* de bi Mahmûd Baksî re hevpeyvînek hatiye kirin. Di vê hevpeyvînekê de, Firat Cewerî vê pirsê ji

Mahmûd Baksî dike, “Gelo ji derketina derveyî welêt wêdetir tu riyên di tune bûn? Te nîkarî bû nivîskariya xwe li welat bidomanda?” Li ser vê yekê Mahmûd Baksî dibêje;

*“Baş bîne bîra xwe, ez di 68an de serokê TIPê me, min xwe sosyalîst îlan kiriye xelk wê çaxê bi ayet û qurana newêribûn xwe nêzîkî van mirovan bikirana, a din jî çiqas Kurdperestên wê çaxê hebûn, danûstanina min bi wan hemûyan re hebû. Ji ber wê yekê jî çavên MITê jî her tim li min bû û dixwestin min wînda bikin. A din jî romana min, “Mezra Botan” erê bi Tirkî bû, lê hemû li ser Kurdan bû. Vê yekê jî gelek bala MITê dikişand. Sê rê hebûn; an ez ê bihatama girtin, di hepsan de biriziyama, an ez ê ji aliyê MITê ve bihatam kuştin, an jî min ê welatê xwe terk bikira.”<sup>159</sup>*

Di vir de bi eşkere xwiya dike ku li ser aktîvîstên kurdan zordariyekê hebû ku ew mecbûr mane koç bikin. Di encama vê surgunê de çalakiyên wan yên li derveyê welêt çawa bûye? Gelo ew xwe hunda kirine û di nav wan tengasiyên surgunê de xwe kişandine koşa xwe an ew kurdayetiya xwe parastine û xwestine ku şert û şûrtên welêt sererast bikin û careke din vegerin welêt? Ji bo vê yekê di dewama nivîsê de Mahmûd Baksî wiha dibêje;

*“Ji bo ku ez asîmîle nebim, wînda nebim, ji bo ku tu car Kurdistan ji serê min û ji dilê min dernekeve, heta ji min hatiye ez weke kurmancekî jiya me. Pirraniya Ewrûpiyan û hevalên min dibêjin; ‘malxerabo, ev bîst û du salên te ne ku tu li Ewropa yî, hîn jî mirov dibêje, qey tu a niha ji çayxaneyê Batmanê derketiye û hatiye’. Ji ber ku ez ji zîmanê xwe yê Kurdî hez dikim. Ez ne bi wê niyeta ku ez bibim Swêdî ez hatime Swêdê. Na, ez bi wê niyetê hatime, ku ez jojekê zûtir şerdên Kurdisatnê didime guherin, bila para min jî tê de hebe û ez paşê vegerim welatê xwe.”<sup>160</sup>*

Em ji van jigirtinan fêhm dikin ku kurdên di encama zordestiyeke dagirker ya li ser welatê wan, weletê xwe terikandine û li derveyê welêt bi bertekeke li hember vê dagirkeriyê, di nav tevgeran de cih girtine. Wek gotinên Mahmûd Baksî jî tê fêmkirin ku ew dixwaze şert û şûrtên welêt biguherîne û demeke zûtir vegere welêt.

Me got diyasporaya kurdan di encama dagirbûyîna welatê kurdan û ji ber vê yekê koça wan li Ewropayê derketiye meydanê. Em di *Nûdemê* de gelek nivîs û nîşanan di vê derbarê de dibînin. Wek dawî û belkî ji bo kurtekirina vê mijarê em ê nivîske sereke yê xwedî û berpirsiyarê kovara *Nûdemê* Firat Cewerî binêrin. Di hejmarên ewil de bi taybetî li ser vê mijarê hatiye sekinandin. Sebebê vê jî dibe ku hêj bandorên salên heştîyî li ser Firat Cewerî û nivîskarên bingehîn yên *Nûdemê* pir jîndar bû. Firat Cewerî ji bo zordestiya dagirkeran li ser welêt wiha dibêje;

*„Welatên serdestan kurdan ji bo ku zîman, çand û edebiyata kurdî qedexe bikin, wînda û asîmîle bikin wan xwe gelekî eşandine. Ji ber ku ew jî zanîn ku zîman yek ji*

<sup>159</sup> Firat Cewerî, “Teyrikê Çemê Xerzan” *Nûdem*, j.2, (Bihar, 1992), r.28

<sup>160</sup> Cewerî, h.g, r.29-30

*nîşanên netewetiyê ye. Ku zimanê miletekî winda bibe, nemîne, hebûna wî milletî jî dikeve talûkeke mezin û piştî kurtedemek ew di nav rûpelên dîrokê de wenda dibin.*"<sup>161</sup>

Em di vê derê de dibînin ku nivîskarê *Nûdemê* ferq dike ku qesteke ji bo tunekirina zimanê wî heye û tunekirina ziman jî wek tunekirina millet dibîne. Ango ew tiştê ku em nuha di *Nûdemê* de digerin ku dagirkeriya li ser welêt e, em di nav van rêzikan de dibînin. Tişteke din ku di vê kovarê de em pey şopa wê nin jî ev e ku gelo ji bo van kirinan tu bertek di nav kovara *Nûdemê* de derbas dibe? Ji bo vê yekê jî di dewama wê nivîsê de agahî henin. Firat Cewerî wiha dibêje,

*"Ji ber ku gelê kurd êdî hew pîkolî û stemkariyê dipejirîne, ew li her derê, bi her awayî ji bo bidestxîsina mafê xwe li ber xwe dide. Di van deh donzdeh salên dawî de, bi şiyarbûn û li berxwedana gelê kurd re, di warê ziman, edebiyat û kutura kurdî de jî gavên dîrokî hatine avêtin. Deriyê civata me ya ku di tarîtiya salan de fetisî bû êdî vedibe, çirûsk û tîrêjên medeniyet û zanistiyê derbasî hundirê wê dibin.*"<sup>162</sup>

Qasê ku em di vê jêgirtinê de dibînin, berkekeke tund û tûj li hember sitemkarî û zordestiya dagirkeran heye. Behsa berxwedaneke deh donzdeh salî tê kirin. Em nizanin qest ji vê berxwedanê çi ye. Lê em dizanin ku dema vê nivîsê hatiye weşandin sal 1992 ye ku deh dozdeh sal ewil jî li beramberî salên cûntaya 1980yî tê. Îhtîmaleke mezin ji vê berxwedanê qest ew tevger bûn ku ji hêla kesên surgunbûyî ve li Ewropayê hatin kirin.

Ji bilî van nivîsên ku cureya diyasporaya kurdî eşkere derdixin holê, em dikarin ji tevger û armancên kovara *Nûdemê* jî derxin ku ev diyasporaya kurdî wek cur; diyasporayeke polîtîk e. Mesela, ev kovar gelek gîrîngî dida zimanê kurdî û edebiyata wî. Ji ber ku ji hêla welatên ku welatên kurdan dagir kiribûn ve ziman, çand û edebiyata kurdî hatibû qedexekirin û kurd nikaribûn bi zimanê xwe binivîsîn û nikaribûn xwediyê edebiyateke modern bibin. Ev jî bû sedem ku dema rewşenbîrên kurd li derveyî welêt firsend ket destê wan, dest bi nivîsîna bi zimanê kurdî û afiradina edebiyata kurdî kirin. *Nûdem* jî, her wekî ku di beşa me kovara *Nûdemê* da nasîn de jî me hanî ziman, wek aramanc ziman û edebiyata kurdî ya nûjen da pêşiya xwe û ji bo pêşxisina wan xebitî. Ev rewş jî ji bo ku em fêhm bikin gelo ji nivîs û tevgerên ekîba *Nûdemê* em dikarin derbarê cura diyasporayê ya kurdan de agahî hildin an na.

<sup>161</sup> Firat Cewerî, "Çend Gotin", *Nûdem*, j.2, (Bihar 1992), r.3

<sup>162</sup> Cewerî, h.g, r.4

## 4.2. DI NÛDEMÊ DE TAYBETIYÊN DIYASPORAYÊ

Me li jor bi gelemperî li ser van taybetiyan sekinî;

1. Ji welatê xwe bi darê zorê derketin ber bi herî kêr du welatan ve koçkirin.
2. Ji welatê xwe belavbûna welatên din ji bo kar, bazirganî an armancên koloniyal.
3. Bîr û baweriyeke hevpar ya derbarê welêt de, ew bîr û bawerî di nav xwe de cih, dîrok û tevgerên wê grubê jî dihewîne.
4. Îdealîzekirina welêt û qebûleke hevpar ya berdewamkirin, restorasyon, ewlehiya wê welatê, heta alîkariya afirandina wê welatê.
5. Pêşxisina tevgerê ku ev tevger qebûleke hevpar dest xistiye.
6. Berdewamiya bîr û baweriyeke hişk ya neteweyî ji bo demeke dirêj û hîseke xwe cuda dîtîne, dîrokeke hevpar û baweriyeke qedereke hevpar.
7. Bi civata xwedîmal re têkiliyên xirab, îddîaya ji hêla wê civatê ve neqebûlbûyîn.
8. Hîsa yekîtiyê û empatiyê bi nûnerên heman grubê re yên ku li welatên din dijîn.
9. Bi toleranseke puluralîzmê ve xwediyê îhtîmala pêşxistina jiyana xwe di welatê derve de.”

Taybetiyên diyasporayê bi van maddeyan ve sînordar nîne. Gelek taybetiyên din jî em dikarin ji vê yekê zêde bikin. Mesela, Michel Bruneau hin taybetiyên diyasporayê jimartiyê û di nav wan taybetiyan de hin henin ku di nav vê sinifandinê de tunenin. Wan taybetiyên ku Michel Bruneau behs dike lê di nav vê sinifandinê de tune ne ev in; dewama têkiliya transnasyonel, hîlbijartina cihê ku tê çûyîne û xwedîbûyîna otonomiyek dîtbarî di nav civata orîjînal û ya xwedîmal de.

Pey ku me behsa taybetiyên diyasporayê kir, em ê vê carê di *Nûdemê* de şopên van taybetiyan bibînin. Lê, ji ber ku şumûla diyasporayê li gor nivîskarên modern û yên klasîk diguherin dê em ê nikaribin van hemû taybetiyên diyasporayê di kovara *Nûdemê* de bibînin. Mesela, ji welatê xwe belavbûyîna welatên din ji bo kar, bazirganî an jî armancên din yên koloniyal, taybetiyeke diyasporayê ye. Lê em şopên vê yekê di kovara *Nûdemê* de dîrekt nabînin. Ji ber ku kovara *Nûdemê* ji hêla wan kesan ve

derdiket ku xwediyê nasnameyên siyasî bûn. Ji ber vê yekê, em di kovara *Nûdemê* de vê tabetiyê di nêrîneke dîrekt de nabînin. Em ê nuha yekbiyek li ser van taybetiyan bisekinin û di kovara *Nûdemê* de şopên wan bigerin.

#### **4.2.1. Ji Welatê Xwe bi Darê Zorê Derketin û Herî Kêm Ber bi Du Welatan ve Koç Kirin**

Welatê kurdan ji hêla çar dewletan ve tê rêvebirin. Ango welatê kurdan parçe bûye. Her wekî tê zanîn wan dewletên welatê kurdan rêve dibin Turkiye, Îran, Iraq, Suriye nin. Ji bili van deran kurd ji ber sedemên curbicur welatê xwe koç kirine û berbelavê gelek welatên din jî bûne. Di çarçova babeta me de dema em vê rastiya parçebûna welatê kurdan jî dinirxînin ev pirs dertê pêşiya me; gelo kurd ji hemû peçeyên welêt bi darê zorê hatine derxistin. Em ê di bin vê beşê de şopên vê yekê di kovara *Nûdemê* de bigerin.

Kovara *Nûdemê* kovareke bû ku xwedî û berpirsiyarê wê kurdeke parçeya Turkiyê bû. Ji ber vê yekê pirtir li ser wan kesan disekinî ku ji Turkiyê surgun bibûn. Bi taybetî jî li ser wan surgunan disekinî ku di pêvajoya darbeya sala 1980yê ya li Turkiyê ji wê dewletê reviyabûn û hatibûn Ewropayê. Li ser vê mijarê gelek nivîs di *Nûdemê* de henin. Em ê di vê derê de li ser hin nivîsên di vê derbarê de bisekinin. Di hevpeyvîneke Firat Cewerî de, ku bi Mahmûd Lewendî, Mehmet Uzun, Xelîl Dihokî re hatibû kirin, li ser edebiyata kurdî ya surgunê hatibû sekinin. Di wê derê de, derheqê vê mijara me de wiha tê gotin;

*“Bi hatina 12’ê Îlonê re hem tevgra kurdî, hem jî tevgera demokratîk a Turkiyê derbeyek mezin xwar. Bi hezaran mirov di îşkenceyên nedîtî de derbas bûn. Pîrr ji wan hatin kuştin. Hinekan jî xwe bi hoyîn gellek zehmet gihandin Ewropa. Îro, bi alîkariya wan kurdên ku xwe gihandine Ewropa mirov dikare behsa edebiyateke kurdî a nûjen bike. Bi dîtina hin kesan hatina 12’ê îlonê ji vê yeka han re bû sedem...”*<sup>163</sup>

Wekê ku di vê derê de jî em dibînin kesên pey cûntaya 12ê Îlonê sala 1980 koçê Ewropayê kirinin, bi piranî ji ber tîrsa mirinê reviyane. Ev kesên siyasî li Ewropayê di nav tevgerên diyasporîk de cih girtine. Di vê jêgirtina kovara *Nûdemê* jî tê fêmkirin ku bi alîkariya wan kurdên ku xwe gihandine Ewropa mirov dikare behsa edebiyateke kurdî ya nûjen bike.

---

<sup>163</sup> Firat Cewerî, “Edebiyata Kurdî ya Surgunê”, *Nûdem*, j.1, (Zivistan 1992), r.37

Bi darê zorê cihûwarêxwebûyîn di *Nûdemê* de çawa me li jor behs kir, di nav sohbetan û hevpeyvînan de hatiye behskirin, her wisa nivîskarên *Nûdemê* yên sereke jî behsa surguna xwe ya bi darê zorê dikin. Li vir em ê piçek behsa serpêhatiya surgunê ya Zeynelabîdîn Zinar bikin ku ew jî bi darê zorê ji cih û xwê xwe bûye. Ew di vê derbarê de wiha dibêje,

*“Di 12’ê Êlûna 1980 yê de ku Cunta Faşîst ya Sêyemîn hat, hetanî Sibata 1984 an, ez heft (heşt) caran hatim girtin. Çi cara ku ez dihatim girtin gelek îşkenceyên bi sosret li min dikirin. Heta li Îşkencexana “Kurdoğlu” ya herî bi navdeng ya Diyarbêkrê, wan ez anîm ber kuştinê. Lê berî ku bême kuştin, heval Mele Brahîm şehîd kirin û ji kuştina min vekîşyan. Yekê Adara 1984an Dadgeha Leşkerî-1 ya li Diyarbêkrê, ez bi pênc salan girtîgeh û 20 meh jî sirgûn tawanbar kirim... Di dawîya 1984an de ez ji Kurdistanê reviyam û hatim li Swêdê cîwar bûm.”<sup>164</sup>*

Çawa nivîskarên kovara *Nûdemê* direkt behsa vê bi darê zorê cihûwarêxwebûyînê dikin, her wekî wî em dikarin di nivîsên van nivîskaran de jî şopa vê yekê bibînin. Ji bo vê şopa zordariyê gelek nivîs henin û em ê yek û du heb ji van nivîsan mînak bînin. Mesela di helbesteke Medenî Ferho de em rastê vê tî. Ew di helbesta xwe de wiha dibêje, “Sal / Û wext / Ew kesê li devê derî ye / bê ol / û / bê xelat / Wek / Seyê har / Bi şev / Bi roj / Ew / Romî ye / Zilm û zora jiyana wî ye / Xwîn û kuştina xebata wî ye.” Dîsa di hejmara 3yem ya kovara *Nûdemê* de ji hêla A. Hîcrî Îzgoren ve helbesteke bi serenavê “*Mahcir*” hatiye nivîsîn. Di wê derê de jî em rastê şopên ji cihûwarêxwebûyînê tî. Wek vê em rastê gelek nivîsên vî rengî tî ku mijara wan bi darê zorê ji cihûwarêxwebûyîn e.

Welatê kurdan ne ji hêla dewletekê ve lê ji hêla pênc dewletan ve tê rêvebirîn. Me li jorê behsa cihûwarêxwebûyîna kurdên perça Turkiyê kir. Gelo ji hemû parçeya vê bi darê zorê cihûwarêxwebûyîn pêk hatiye an na? Em ê niha di *Nûdemê* de pey şopa vê yekê bikevin. *Nûdem* kovarekê bû ku dixwest xîtabî hemû kurdan bike û di navbera wan de bibe pîreyekî. Ji bo vê yekê jî gelek hevkarên *Nûdemê* hebûn ku hem li welêt hem jî li welatên mazûvan yên diyasporaya kurdan di nav danûstendinekê de bûn. Mesela, yek ji hevkarên Swêdê Xelîl Dihokî bû ku ji parçeya Iraqê hatibû û derbarê wan kesan de agahî dida ku ji perça Iraqê koç kiribûn. Eger em nivîseke Xelîl Dihokî ya di kovara *Nûdemê* de binêrin dê em ê bibînin ku tenê ne kurdên perça Turkiyê lê kesên ji perçên din yên welêt jî di encam zordariyeke li ser wan ji cih û warê xwe bûne. Ew ji bo rewşa kurdên Iraqê wiha dibêje;

<sup>164</sup> Zeynelabîdîn Zinar, “Kurtebehseke Jiyane”, *Nûdem*, j.4, (Payîz 1992), r.82-83

*“Dema milletê kurd di sala 1970’ê de, bi xwîna hezaran şehîdan hinek mafê xwe wergirtin, ji nû xwendina kurdî -ew jî bi kurmançiya jêrî (sorani)- dest pê kir.... Lê di buhara 1974’an de dîsan şer di navbera milletî û faşîstên Iraqê de destpêkir. Hingê pîrrianiya nivîskar û ronakbîrên kurd -ku ez jî yek ji wan bûm- gihane rêzên şoreşê û ber bi deverên rizgarîkirinê çûn.”<sup>165</sup>*

Em ji van rêzikan fêhm dikin ku li parçeya Iraqê jî şerreke dijwar di navbera kurdan û rejîmê de hebû. Ji xwe di dewama nivîsa xwe de Xelîl Dihokî wek sebebê koçkirina xwe, vê şerê nîşan dide û wiha dibêje, “Zulim (zilm) û stema dijmin cardin ez neçar kirim ku ez di sala 1982’an birevim û bigihêm hêzên şoreşa kurdî. Lê rewşa siyasiya aloza Kurdistanê ez neçar kirim ku di sala 1987’an bigihême welatê xerîbiyê, Swêdê.”<sup>166</sup>

Bi darê zorê ji cihûwarêxwebûyîn yek taybetiyeke bingehîn ya diyasporayê ye. Mirov dikare şopên vê taybetiyê di diyasporaya kurdî de jî bibîne. Me di paragrafên jor de şopên vê taybetiyê dîtine ku em dikarin vana wek delîl ji bo diyasporaya kurdî pêşkeş bikin. Her çiqas welatê kurdan ji hêla dewletên cuda ve werê rêvebirin jî, sedemê koça kurdan bo Ewropa û çêbûyîna diyasporayê di encama zordariya ew dewletan in ku kurdan rêve dibin û dixwazin nasnameya kurdan ji holê rakin. Ango sedema koçkirina kurdan diyasporaya kurdan pêk tînin yek e ku ew jî kurdbûyîna wan e. Gelek şopên di derbarê vê mijarê de di kovara *Nûdemê* de henin. Lê ji bo zêde dirêj nebe em ê bi vê ve kîfayet bikin.

#### **4.2.2. Bîr û Baweriyeke Hevpar ya Derbarê Welêt de**

Yek taybetiyeke bingehîn ya din ya diyasporayê jî xwedîtîya bîr û baweriyeke hevpar e. Ev bîr û baweriya hevpar di hundirê xwe de cih dîrok û tevgerên wî milletî jî dihewîne. Ango welateke hevpar, dîrokeke hevpar û bûyerine hevpar rêgezên vê bîr û baweriyê nin. Ev hevparî dibe sebeb ku hem vê grubê çêbibe hem jî jiyana xwe berdewam bike. Ji bo diyasporaya kurdan em dikarin behsa bîr û baweriyeke hevpar bikin. Ji ber ku welatekî kurdan ê hevpar heye her çiqas ev welat ji hêla dewletên cuda ve were rêvebirin jî. Dîsa dîrokeke hevpar ya kurdan heye an jî tê çêkirin. Ji bo tevgerên hevpar jî em dikarin hemû tevgerên ji bo kurdan tê kirin nîşan bidin. Em ê nuha di nav kovara *Nûdemê* de şopên van taybetiyan bigerin û bi vê yekê ve em ê hem bikaribin

<sup>165</sup> Xelîl Dihokî, “Çiroka Jiyana Mîn”, *Nûdem*, j.4, (Payîz 1992), r.121

<sup>166</sup> Dihokî, h.g, r.122

ispat bikin ku diyasporaya kurdî xwediyê vê taybetiyê ye û hem jî bikaribin ispat bikin ku di kovara *Nûdemê* de şopên surgun û vê taybetiya diyasporayê hene.

Em ê pêşî behsa dîroka hevpar bikin. Di kovara *Nûdemê* de ji dîroka kevn heta sedsalên dawî behsa dîroka kurdan tê kirin û bi vê yekê ve tê xwestin ku nasnameyek werê meydanê. Mesela, di nivîseke Dilovar Mêqerî de behsa dîroka kevn ya Cizîrê dike û ev nivîs wiha derbas dibe,

*“Ev herema belengaz û cîwarên hişkî, ku pirraniya Kurdistanê rojava, di navbera Dicle û Firat hemêz dike; bi xwe navenda bajarvaniya mirovaniya kevin bû. Li vir kevintirîn namazên rewîştên pêşhatî û çikên din wek cêr, mohr û wênegirtî, sergirtin. Herweha roleke pîr mezîna di hemû serdemên dîrokî de leyistiye.”*<sup>167</sup>

Li vê derê behsa mezintiya dîroka gelê kurd dike û bi vê yekê ve dixwaze bîr û baweriyêke hevpar ya kurdan derxe meydanê. Dîsa nivîseke vî rengî ji hêla nivîskarê gewre Dr. Cemşîd Bender ve hatiye nivîsîn. Ew behsa keşfkirina dîroka kurdan dike û kurdan jî wek parçeyêke medeniyeta dinyayê dîtîye. Ew jî di vê derbarê de wiha dibêje,

*“Nemaze gava min dîtibû ku gelek medeniyet ji dema antîk ji aliyê kurdan ve berpêşî mirovaniyê bûye, ez gelekî kêfxweş bûbûm. Tu bêjî nebêjî heta sedsala bîstana gelek medeniyetên din bingeha xwe ji medeniyeta gelê kurd stendine. Di dema me de gava Sumer, Hîtî, Asûr, Frîgya, Lidya asîmîle bûne û wînda bûne, di sedsala bîstana de gelê kurd bi hejmareke mezîna derdikeve pêşiya me.”*<sup>168</sup>

Di kovara *Nûdemê* de ne tenê behsa dîroka kurdan ya kevn hatiye kirin lê behsa dîroka kurdan ya nêzîk jî hatiye kirin. Wek mînak, Nûra Cewarî li ser dîroka berhevkirin û çapkirina folklorê kurdî disekine û bi taybetî jî di vê mijarê de rola mezîna ya ermeniyana tîne ser zimên. Ew wiha dibêje, “Keda rewşenbîrên ermeniyana di dereca berhevkirin, çapkirin û lêgerîna folklorê kurdî de mezîna e. Bi saya serê wan gelek nimûnên folklorê kurdî ên dawîya sedsala nozdan û destpêka sedsala bîstî gihîştine me. Ew nimûne ji bo zanyaran berhemên hêja ne.”

Di kovara *Nûdemê* de ji bilî van nivîsên ku me behs kir ku mijara wan dîroka kurdan e, em rastê hin çalakiyên din jî tên ku bi wan çalakiyan hatiye xwestin ku bîr û baweriyêke dîrokî ya hevpar were çêkirin. Ji bo van gelek mînak henin. Mesela, di sedsaliya Rojnamegeriya kurdî de li ser rojnameyên kurdan û dîroka çapemeniya kurdî di hejmara 25an de nivîsin henin. Dîsa di hejmara 17an de li ser Şerefexan Bedlîsî û *Şerefnameyê* hatiye sekinîn. Nivîsên *Şerefnameyê* didin nasîn, destpêka *Şerefnameyê* û

<sup>167</sup> Dilover Mêqerî, “Gerrek agahî li Cîgehên Hunera Kurdî yê Kevîna”, *Nûdem*, j.3, (Havîn 1992), r.78

<sup>168</sup> Cemşîd Bender, “Çîroka Jiyana Min”, *Nûdem*, j.4, (Payîz 1992), r.105

pêşgotinên wergerên *Şerefnameyê* yên soranî, erebî û fransîzî hatine çapkirin. Ji van mînakên em dikarin hin tiştên din jî zêde bikin. Sedsaliya Komara Kurdî ya Mahabatê, di hejmara 9an de, wek mijareke sereke hatiye hilbijartin û nivîsên derbarê vê komarê de hatiye weşandin. Di vê mijarê de kesên nivîsîne Firat Cewerî, Hesên Qazî, Kerîm Husamî û M.Mola Ezat in. Wek mînaka dawî em dikarin beshsa sedsaliya xwedêdayîna Celadet Alî Bedir-Xan bikin. Di hejmara 8an de bi nivîsên ji hêla Malmîsanîj, Rohat, Mehmet Uzun, Firat Cewerî û Rojen Barnas ve vê mijarê hatiye ziman. Her wekî em dibînin van bûyerên dîrokî ve hatiye xwestin ku behsa bîr û baweriyeke dîrokî ya hevpar bikin da ku têkiliyên di nav vê gruba diyasporayê de zexmtir bikin.

Di mijara bîr û baweriya hevpar de em dikarin pey dîroka hevpar behsa coxrafyaya hevpar bikin. Ji bo vê yekê di hejmara ewil ya vê kovarê de ji hêla Musa Anter ve nivîseke ku li ser parçeyek ji perçên Kurdistanê heye. Musa Anter wiha behsa vî bajarî dîke.

*“Nisêbînê yek ji bajarê kevintirîn yê Mezopotamya ye. Li gorî nivîsên bi Gotî û Sumerî yên li ser qehfikan ku îro di destên me de hene, Nisêbînê berî Mîladê bi 2880 salan, di dema qiralê Sumerî, Luga Zegîstî ava bûye.”<sup>169</sup>*

Dîsa wek mînak em dikarin nivîseke Edward Petêşka mînak bidin ku ji hêla Loran Cengîn ve ji bûlgarî hatiye wergerandin. Di wê nivîsê de welatê kurdan ango *Mezopotamya* hatiye nasîn. Mînakeke din ya ku bîr û baweriya cih ya hevpar raweyê me dîke helbesteke Mervanê Keleş e ku bi serenavê “Qamişloka Bavê Felek” ve di hejmara yekem de hatiye çapkirin. Her wekî ku em dizanin, di derbarê welatek an bajarekê de bi zimanek an miletek nivîs nivîsîbin an helbestan hunandibin ew delîkeke mezin e ji bo ew welat welatê wî mîletî ye. Mesela, helbestên mijara wan Îzmîr e ji hêla gelek nivîskarên tirk ve hatine nivîsîn. Ev delîleke mezin e ku ev bajar bajarê tirkan e. Her wekî wê helbestên ji hêla kurdan ku mijara wan bajar, çiya û deştên welat in jî delîl in ji bo ew welat welatên kurdan in. Bi vê xalê ve em dixwazin bînin ziman ku ew helbestên ku bajarên kurdan dikin mijara xwe, ji bo bîr û baweriyeke hevpar bingehên saxlem davêjin.

Di kovara *Nûdemê* de em rastê tevgerên kurdî yên ku ji bîr û baweriyeke yek dertê û dibe sedem ji bo avakirina bîr û baweriyeke hevpar. Mesela, dema di sala 1994an de Musa Anter li Diyarbekir hat kuştin ev bûyer bû sedem ku kurd vê bûyerê bînin ziman.

---

<sup>169</sup> Musa Anter, “Nisêbînê”, *Nûdem*, j.1, (Zivistan 1992), r.57

Di kovara *Nûdemê* de jî li ser vê mijarê bi kûrahî hatiye sekinîn. Di hejmara 11an de Firat Cewerî, yaşar Kaya û Medenî Ferho nivîsên derbarê Mûsa Anter de nivîsîne.

#### **4.2.3. Îdealîzekirina Welêt û Berpirsiyareke Hevpar ji bo Beqa, Ewlehî, Restorasyon, Refah û Jinûveavakirina Welêt**

Taybetiyeke din ya civakên diyasporayê jî îdealîzekirina welêt û xwediyê berpirsiyariyeke hevpar ya ji bo welêt e. Bi gelemperî welat ji her tiştî bilintir tê girtin. Wek îdealek e ku ji bo destxistina wî welatê xewn tên dîtin û gelek çalakî çî siyasî çî jî çandî tên kirin. Tiştê ku ji bo vê îdealê tê kirin jî bi berpirsiyariyeke hevpar ve tê kirin. Bi gelemperî welatê civatên diyasporayê di bin tahlûkeyan de ne ku divê ji van tehlûkeyan bê parastin. Mesela, îhtîmal heye ku ew welat û ew millet were pişaftin û ji holê rabe. Ji bo ewlehiya welat û beqaya wê tevgerên curbicur ji hêla wê civata diyasporayê ve tê kirin. Dîsa ne tenê ewlehî û beqayeta wî welatî lê ji bo restorasyona wî welatî û heta ji bo jinûveavakirina wî welatî ev civatên diyasporayê ked didin.

Gelo ev rewş ji bo civata diyasporayê ya kurdan jî derbasbûyî ye an na? Em ê di kovara *Nûdemê* de li pey şopên vê yekê bikevin. Em ê ,pêşiyê, pey şopa îdealîzekirina welêt bikevin û ji bo wê mînak bibînin. Pey vê yekê, em ê li pey şopên berpirsiyariyên hevpar bikevin û binêrin ka gelo ev berpirsiyarî ji bo çî tîne kirin? Yanê, em ê van şopan di kovara *Nûdemê* de bigerin; ji bo ewlehî û beqaya welêt û ji bo restorasyon û jinûveavakirina welêt çî hatiye kirin.

Di hişê nûnerê civata diyasporaya kurdan de welateke îdeal heye. Welateke ku ji dê û bav, ji yara/ê mirov biqiyemettir. Ji bo vê yekê mînaka baştirîn ji hêla Mahmûd Baksî ve hatiye dayîn. Di hevpeyvîneke ku Firat Cewerî bi Mahmûd Baksî re kiriye de, ev mijar hatiye rojevê. Mahmûd Baksî wiha dibêje;

*“Min digot ez ê di jiyana xwe de keçika Diyarbekirî, ya Fatîh Paşayê ji bîr nekim. Min digot, ger ez bi wê keçikê re nezewicim û ez rojekê wê wînda bikim, ez ê xwe bikujim. Ne mumkun e, ku ez bê wê bikaribim bijim. Lê mixabin, piştî salekê du salan min ew keçik ji bîr kir. Ez wîlo bawer im, ku wê jî niha ez ji bîr kirime. Piştî wê, min digot, xwedê neke bavê min bimire, diya min bimire, êdî jîyan ji min re namîne, ew ê jîyan li min bibe zîndan. Ne mumkun e, ku ez bikaribim bê dê û bavê xwe jîyanekê bidomînim. Dê, lo! Nexasim dê! Ew dayika ku mirov mezin kiriye. Ew dayika ku mirov di her şerd û şurûdan, di her perîşanî û belengaziyê de, di ber pêşîra xwe de mezin kiriye. Di sala 1986an de bav çû, di 88an de jî dê çû. Lê helbet mirov dê û bavê*

*xwe ji bîr nake, ew tişteki dîn e, lê ez gihîştîme wê qeneetê, ku evîna welêt di ser hemû evînan re ye. Ji ber vê yekê jî gava behsa Kurdistanê dibe, ez axînenê kûr dikişînim.*”<sup>170</sup>

Di vê paragrafê de evîna Kurdistanê li ser her evîni re hatiye girtin. Kurdistan wek tişteki hatiye nîşandan ku herî zêde evîn û hezkirinê heq dike. Îdealîzekirina welêt re van gotinên Mahmûd Baksî mînakê baş e. Vê carê em ê şopên berpirsiyariya hevpar ji bo welêt di kovara *Nûdemê* de bişopînin. Gelo ev civata diyasporayê ku pirî caran ji bo tevgerên diyasporîc kesên rewşenbîr û întelektuel pê divêt, xwediyê wan întelektuel û rewşenbîran bû ku berpirsiyariya xwe ya ji bo welat dihanîn cih? Ji bo erkên entelektuelên civata diyasporayê ya ji bo welêt di kovara *Nûdemê* de gelek nivîs henin. Em ê wek mînak li vir li ser nivîsa S. Sulevanî bisekinin ku di hejmara 33an de bi serenavê “*Berpirsiyariya Întelektuelê Kurd-1*” ve hatiye weşan. Ew ji bo rola entelektuelên kurdan û tevgerên wan wiha dibêje;

*“Di nav salên dawî de ronasekê di nav întelektuelên kurdan de dest pê kiriye û bi rastî jî hinek ji wan rola xwe ya pêwîst jî dilîzin. Ew di nav kurd û biyaniyan de wek lobiyê veşartî û aşkere, bêdeng û vekirî dixebitin. Ew di nav kurd û biyaniyan de peywendiyên xwe girêdidin digel kesên destalatdar û pîrsa kurdî bi rengê bajarvanî û mafdar radixin ber wan û daxwaza piştgiriya dikin.*”<sup>171</sup>

Di vê derê de behsa berpirsiyariyê hevpar ya ji bo pîrsa kurd ya li ser milê entelektuelên kurdan dike û tîne ziman ku ev berpirsiyarî jî ji hêla hinek entelektuelan ve tê cih. Xebatên lobîyan yê di nav kurdan û li diyasporayê ku ji hêla entelektuelên kurdan ve tên kirin wek bicihanîna vê erkê hatiye nîşandan.

Di kovara *Nûdemê* de gelo ji bo jinûveavakirina welat û restorasyona welat em rastê çi tên? Dema em armanca bingehîn ya kovara *Nûdemê* dinêrin, em dibînin ku ev kovar ji bo aktuelhiştina zimanê kurdî û avakirina edebiyata kurdî ya modern xebitiye. Xwestiyê qasê ku ji destê wan werê, alîkarê standardîzasyona zimanê kurdî bike û ji bo nivîsîn û xwendina zimanê kurdî bixebite, lewra zimanê kurdan li welêt hatibû qedexekirin û tevgerên ji bo edebiyata kurdî jî ji di encama vê qedexekirinê de pêş neketibû. Ji bo vê yekê, Firat Cewerî di hejmara yekem ya kovara *Nûdemê* de wiha dibêje, “Armanca wê (*Nûdem*) a sereke ew e ku di riya gel de be, ji bo vejandina zimanê kurdî û ji bo pêkanîna edebiyata kurdî ya nûjen bibe bingeh.”<sup>172</sup> Em dikarin hemû tevger û keda di kovara *Nûdemê* de hatiye dayîn ji bo zimanê kurdî wek mînak bidin ji bo vê berpirsiyariya hevpar ya ji bo restorasyon û jinûveavakirina ziman û welatê

<sup>170</sup> Cewerî, “Teyrikê Çemê Xerzan”, r.28-29

<sup>171</sup> S. Sulevanî, “Berpirsiyariya Întelektuelên Kurd 1”, *Nûdem*, j.33, (Bihar 2000), r.9

<sup>172</sup> Firat Cewerî, “Çend Gotin”, *Nûdem*, j.1, (Zivistan 1992), r.3

kurdan. Ev ekîba *Nûdemê* wisa girîngî danin ziman ku ziman wek mesela heyat û mirina milletê kurd didîtin. Ew hebûna zimanê kurdî wek hebûne milletî û tunebûna wî jî wek jîholêrakirina wî milletî dîtine.

Pirsgirêkên entegrasyona welatên mazûvan ne ji bo civata diyasporaya kurd bûye sedem ku ew welêt ji bîr bikin û ne jî ji bo restorasyon û jinûveavakirina welêt tevgerên wan kêr kirine. Ji ber ku civata diyasporaya kurdî her wext tundûtûjîyan dibîhîstin yê ku li welêt pêkan bû û ev jî dibû sebep ku ew ji bo welêt û dahatûya wê bixebitin. Ji bo vê yekê Xelîl Dihokî di hevpeyvîneke di kovara *Nûdemê* de wiha dibêje,

*“Ji ber ku her roj xeberên nexweş dibihîzin, dengê lêdan, îşkence û neheqiyê tê guhê wan.. Ji ber vê yekê jî ew her xwe parçeyek ji welatê xwe dibînin. Ew tu caran xwe ji milletê xwe mestir nabînin. Ez bawer im ku di siberoj rewşa welêt baş bibe, ew ê pîrr ji van hevalan vegerin welatê xwe û ew ê li welêt tiştên hîn baştir biafirînin.”*<sup>173</sup>

Di vê mînak de em ji bo welatekî baştir û dahatûyeke ronîtir dibînin ku civata diyasporayê ya kurdan di nav tevgerên wisan de nin ku di dahatûyê de vegegin welêt û bixebitin ji bo tiştên baştir biafirînin. Gelo ew tenê li benda wê roja vegeêrê bûn û li diyasporayê tiştin nedikirin? Em ji bo vê yekê jî di kovara *Nûdemê* de rastê gelek tiştan tên. Mesela. dîsa Xelîl Dihokî di hevpeyvînekê de, behsa wan xebatên ku li diyasporayê ji bo zimanê kurdî hatinin kirin dike û dibêje van xebatan bi hêsanî mirov dikare bigihîne welêt û ji bo welêt û zimanê kurdî bikar bîne. Ew di wê hevpeyvîna xwe de wiha dibêje,

*“Bes niho gelek derî li ber nivîskarê Kurdistanê Tirkiyê (yên diyasporayê) vekiriye, ku di vê azadiya niho heye de, tu bi azadî dikarî semînera bidî, dikarî kitêban çap bikî, dikarî kovar û rojname derêxî, tu dikarî van tiştan bigihênî xelkê jî. Ev pirtûk û kovarên ku ji aliyê nivîskarên Kurdistanê Tirkiyê ve tên çapkirin, mirov bi hêsanî dikare wan bigihîne Tirkiyê, bigihîne Sûriyê, bigihîne Iraqê û bigihîne Îranê. Yanî, mirov dikare vê mersela surgunê bike bingehê mezîna ku ji vê derê tiştan bigihîne welêt.”*<sup>174</sup>

Di kovara *Nûdemê* de me li jor hinek behsa jinûveavakirin û restorasyona welat ji hêla diyasporaya kurdî ve kir û em ê niha behsa endîşeyên ji bo beqaya netewa kurd û zimanê wê bikin. Wek ku me gelek cihan de jî anî ziman di nav entelektuel û civaka diyasporaya kurd de endîşeyeke mezintirîn ji endîşeyên bingehîn yê ji bo welêt tirsî ji holê rabûna zimên e û bi vê ve ji holê rabûna netew û millet e. Derbarê vê endîşeyê de gelek nivîs hatinin nivîsîn di kovara *Nûdemê* de. Em ê hinek mînakan bidin. Mesela

<sup>173</sup> Cewerî, “Edebiyata Kurdî ya Surgunê”, r.31

<sup>174</sup> Cewerî, h.g, r.41

nivîskar û helbestvanê gewre yê zimanê kurdî Rojen Barnas di nivîseke xwe de ku li ser qedera kurmancî nivîsîye wiha dibêje,

*“Ewê kurmancî hetanî serê sala 2100 î bimîne an ne? Dilê min çiqas dixwaze ku bikarim bêjim “erê ewê hetanî sala 2100 î û heta heta bi hindikî hetanî sala 3000 î jî hebe û wekî zimanekî zindî bijî.” Bi xwestinê dilê min dixwaze, lê bi gotinê wê ev gotin ji gotineke “sloganî”ya pûç a vala pêve tu manekê ifade neke.”*

Em di vê nivîsê de xwesteke gelek bi hêz ji bo berdewamiya jiyana zimanê kurdî dibînin. Lê dîsa em dibînin ku tirseke mezin jî heye di derbarê zimanê kurdî de. Entelektuelên kurdan yê li diyasporayê zimanê kurdî û bi vê re welêt û millet di nav ewlehiyekî de nabînin. Ji bo vê yekê, ango ji bo ewlehiya welêt, milêt û zimên ew di nav tevgerên gelek çalak de cih girtine. Bi taybetî di mijara zimên de kurdên parçeya Turkiyê ji kurdên perçên din cudatir bûne. Ew ewlehiya welêt û milêt bi zimên ve girêdane. Ji ber ku ew marûzê asîmîlasyona zimên û bi vê re jî asîmîlasyona miletî hatinin. Dema gihîştine Ewropayê wê çaxê bi çar destan ve xwe bi kurdî ve girêdane. Di vê mijarê de jî em rastê mînakên di kovara *Nûdemê* de tên. Mesela di hevpeyvîneke *Cafê Nûdemê* de wiha derbas dibe,

*„Ji ber ku li wir (parçeya Turkiyê) valahiyek hebû, kurdan nikaribûne weşanên bi zimanê kurdî li wir derxin. Lê belê astengiyeke weha li pêşberî kurdên Iraqê tunebûye. Wan di dema xwe de gelek weşanên bi zimanê kurdî derxistine. Lê ev yeka li ba kurdên bakur tunebû, kurdên bakur birçiyê vê yekê bûn û loma wan li Swêdê giranî dan xebat entelektuelî û çapemeniya kurdî.”<sup>175</sup>*

Statuya zimanekî pîrî caran biryara hebûn û nebûna wê zimanê dide. Yanî, eger zimanekî xwediyê statuyekê nebe, pey demekê êdî wê zimanê nayê axaftin. Hela ser vê bêstatubûyîne kesên wê zimanê diaxivin piçûk werên dîtin û dîsa werên cezakirin ji ber ku wê zimanê bikar tînin, êdî bi wî zimanî tu kes wê nexwazibe biaxive. Dema em rewşa zimanê kurdî dinêrin em di dema kovara *Nûdemê* derdiket de rastê vê rewşê tên. Ev rewş jî gelek rewşenbîrên kurdan û di çarçoveya mijara me de civata diyasporayê ya kurdan fikirandiye. Di kovar *Nûdemê* de em rastê ev cur nivîsan jî tên. Mesela, Rojen Barnas li ser vê mijarê bi israr her wext sekiniye û di gotareke xwe de vana tîne zimên,

*“Ziman bi saya gelê bi wî zimanî diaxîfe dijî. Gava xelkek bi zimanekî nepeyive, ew ziman dimire. Kurmancî jî bi wê êşê ketiye û ber bi rojên xwe yê dawî ve diçe. Kurd êdî naxwazîn bi kurmancî, bi wî zimanê bavûkalan bi zarûkên xwe re biaxîfîn. Bavûkal gundî bûn, koçer bûn, lê zarûyên wan ewê “bajarî” bin, “rojavayî” bin û ewê bi “zimanê bajarvaniyê”(!) bipeyivin.”*

<sup>175</sup> Firat Cewerî, “Cafê Nûdem”, *Nûdem*, j.37, (Bihar 2001), r.11

Di kovara *Nûdemê* de ji bo tundûtûjîya li kurdan tê kirin û bandorên wî li ser ziman û hebûna kurdî û kurdan jî mînak henin. Mesela ji bo vê mijarê ev hatiye gotin,

*“Li welat gund vala bûne, gundî ber bi bajaran ve çûne. Bajar vala bûne ber bi rojavayê Tirkiyê ve koç kirine. Çi bigire ji nivî bêtirê kurdan li rojavayê Tirkiyê qelibîne. Yê mayî hê jî di binê sawa kabûsa “korucu-tîm-hîzbullah” û w.d de ne. Kal û pîr ne tê de yên mayî çiqas bi kurmançî bi hevdu re û bi zarûkan re dipeyivin, bi tenê Xwedê pê dizane.”*

Di vê jêgiritinê de em hem dikarin şopên tundûtûjîtiya li welêt bibînin, him guherîna demografîk ya li welêt û him jî bandorên vê yên li ser ziman û çanda kurdî bibînin. Di nav civata diasporaya kurdî de van mijaran wek mijarên sereke hatinin qebulkirin û bi têkoşîna van pirsirikan ve jî ji bo tevgerên diasporayê dînamîzmekê dest xistine.

Bo encama vê binbeşê em dikarin bêjin ku di nav civatên diasporayan de taybetiyeke bingehîn ew e ku welat tê îdealîzekirin û tevgereke hevpar ji bo ewlehî û beqayeta welêt û dîsa ji bo restorasyon û jinûveavakirina welêt tê kirin. Me di vê beşê de bi mînakên kovara *Nûdemê* ve nîşan da ku diasporaya kurdî jî xwediyê vê taybetiyê ye.

#### **4.2.4. Pêşketina Tevgerên Vegerê yên Ku Qebûleke Hevpar Dest Xistiye**

Di terîfa diasporayê de tê gotin ku “kesên ji welatekê ber bi herî kê du welatan ve koç kirine”, wek têgeheke bingehîn ya ji bo terîfa diasporayê tê bikaranîn. Ango, di bingeha diasporayê de ji cihûwarêxwebûyîn heye. Ev kesên cih û warê xwe bûne dê bixwazin vegerin welatê xwe an na? Di terîfa diasporayê de, dema em li ser dîroka danasîna diasporayê sekinîn, me got diaspora xwediyê hin taybetiyan in ku ew taybetî li gor terîfên berê û yên nûjen diguherin. Di vê çarçovê de taybetiya vegerê jî li gor terîfên berê û terîfên nûjen diguhere. Terîfên berê ji bo civata diasporayê vegerê wek taybetiyeke bingehîn û îdeal dibîne û vê taybetiyê dixe merkezê ji merkezên diasporayê. Wek mînak me cihû û ermenan dabû. Lê terîfên modern yên ji bo taybetiya vegerê di vê nêrînê de nînin. Ew dibêjin vegerîna welêt dibe ku nekeve merkezê û nebe armanc. Ji ber ku li welatên mazûvan ew wek niştecih cih bûnin û naxwazin vegerin welatê eslî. Lê ew di şûna vegerê de pêvajoya surgunê û zehemtiyan derdixin pêş. Ji bo vê curê diasporayê em dikarin Afro-amerîkîyan mînak bidin. Di vê çarçova terîfa vegerê ya ji bo civatên diasporayê de dema em civata diasporayê ya kurdan dinirxînin em dibînin ku bi giranî li ser vegerê hatiye sekinîn û veger wek armanca bingehîn hatiye

hilibijartin. Mesela, em dikarin di hevpeyvîneke Firat Cewerî de rastê vê yekê di *Nûdemê* de bîn. Di wê hevpeyvînê de wiha tê gotin,

*“Ez ne bi wê niyeta ku ez bibim Swêdî ez hatime Swêdê. Na, ez bi wê niyetê hatime, ku ez rojekê zûtir şerdên Kurdistanê bidime guhertin, bila para min jî tê de hebe û ez paşê vegerim welatê xwe. Lê vê yeka ha dirêj ajot, dîsan jî ez ê her vegerim. Hê stiranên min, çîrokên min romanên min ji bo keç û xortên Kurdan hene.”<sup>176</sup>*

Civata diyasporayê ya kurdî wê armancê dabû pêşiya xwe ku di demeke kin de şert û şûrtên welêt guncav bikin û vegerin welêt. Di serî de, dema ew mecbûr man koç bikin, gelek kesên ji civata diyasporaya kurdan nedixwastin surgunê bimînin, ew dixwestin ku demek ji demek zûtir vegerin Kurdistanê. Ji bilî van nivîsên rasterast behsa vegeerê dikirin em di kovara *Nûdemê* de rastê helbestan jî tên ku mijara wan vegeer e. Mesela, Bedirxan Epozdemîr di helbesteke xwe ya bi sernavê “Bendewar Bin, Ez ê Bê” de xwesteka vegeerê wiha tîne ziman, “Ez ê bê / ku mecal nedin jî / rê û bend, / sûr û sînor / ez ê bê. / ku qam û taqeta min / nemîne jî, / bê mecal û îmkan bim jî / bi hawar û gazî / ezê bê. / ez ê bê / sond û peyman / ji we re bi govend û dîlan, / bi şabaş û stan, / bi hesreta salan / bendewar bin / ez ê bê”

Her wext di hişê entelektuelê/a surgunê yê/a kurd de fikra vegeerê hebû. Ew vê surguna derveyê welêt ji xwe re wek firsendekê didît û digot heta ku ez vegerim ez ê vê dema ku ketiye distê min ji bo xwe û milletê xwe wek firsendekê bikar bînin da ku destvala venegerim welêt. Di vê derbarê de şîrovevên Umer Şêxmûs yên derbarê vê mijarê de wiha nin ku di kovara *Nûdemê* de derbas dibin.

*“Tişteki din jî heye ku divê mirov bi bîr bîne, ew jî ew e kurdên ku hatine Swêdê, kurdên siyasî yên ku hatin Swêdê berê wan her tim li welêt bû. Ew ji bo demeke kurt hatibûn vir û loma hemû xebata xwe ya li Swêdê ji bo başkirina rewşa welêt dikirin. Wan kurtedema li Swêdê ji xwe re mîna firsendekê dizanibûn û dixwestin dema xwe pir baş bi kar bînin, vala nesekinin û ku rojekê vegeeriyên welêt destvala venegerin.”<sup>177</sup>*

Me li vir behsa armanca vegereke di demeke kin de ji bo welêt kir. Lê her wekî ku tê zanîn ew hatina ji bo du sê salan bû deh bîst sîh û zêde sal. Gelo ev li ser pisîkolojiya vegeerê ya vê civata diyasporiya kurdî çawa xwe nîşan da. Nivîsên nû yên ji vê nivîşê surgunbûyî di çî rewşê de bûn û ji bo vegeerê çî hîs dikirin. Li ser vê mijarê jî em dikarin di kovara *Nûdemê* de rastê nivîsan bîn. Li ser vê mijarê Firat Cewerî wiha dibêje,

<sup>176</sup> Cewerî, “Teyrikê Çemê Xerzan”, r.30

<sup>177</sup> Cewerî, “Cafê Nûdem”, r.9

*“Ji ber ku gava kurdên xwende û siyasî hatin Swêdê, ew bi niyeta salekê û du salan hatibûn, lê ew salek û du sal li wan bûn bîst sal. Bîst sal li wan bû kabûsek. Êdî wan xortanî li dû xwe hiştin û zarokên wan mezin bûn. Wan xwestin vegerin, nikarîbûn, adeptyî civata vir jî nebûn. Encama ku li Kurdistanê li bendê bûn jî nestendin. Problemên gelek bi malbata wan re derketin. Gelek ji wan gêj bûn, bûne mîna çûkên ku hêlîn li ber wan herimî be. Tiştêkî xwe wenda kirine, lê digerin, lê nizanin çi ye. Loma, mirov hem di warê siyasî de hem jî di warê edebî de bêhêvîtiyê dibîne. Di vir de krîzek xwe nîşan dide.”<sup>178</sup>*

Civata diyasporaya kurdî xwe wisa li gor vegeerê motîve kiribû ku dema ev pêk nehat di jiyana wan de krîz û tramwa dest pê kirin. Ew bi malbata xwe, civata xwedîmal re probleman jîyan. Ew taybetiya bingeheîn ya diyasporayê ku vegeer e, gelo vegeeriyaye li ser pênasayên nûjen yê ku me li jor behs kir. Ango vegeer ji navendê derketiye û tenê ew trajediya surgunbûyîne maye li paş? Gelo nivşên nû dê bixwazin vegeer? An hêsta vegeerîne di nav nivşên nû û yê berî ku di nav bêhêvîtiyeke mezin de bûn, dê xwe bikaribe biparêzîne. Me ji bo vê mijarê mînak di kovarê de nedîtin. Dibe ku kovara *Nûdemê* qasê ku em van mînakan di wê de bibînin dirêj nejiyabe. Lê bi gelemperî di vê kovarê de, di pêvajoya deh salan de, hêsta vegeerê her wext zindî hatiye girtin.

#### **4.2.5. Bi civata Xwedîmal re Têkiliyên Xirab, Îdiaya Neqebûlbûna ji Hêla Wê Civatê ve**

Taybetiyeke din ya civata diyasporayê têkiliyên xirab in ku di navbera civata diyasporayê û civata xwedîmal de dertê. Gelek civat bi nêrîneke xirab ve li civatên biyanî dinêrin. Wan wek wan kesan dibînin ku îstîlakar in an jî welatên wan ji destê wan hildidin an di welatê wan de dibin sebebê bêhûzûriyê. Dîsa civatên diyasporayê ji ber ku di nav xwe de mobîlîze dibin û ji civata derve re zêde ne vekirîne ev jî di warê têkiliyên navbera wan de pirsgirêkan derdixin. Vî rengî gelek pirsgirêkên din yê di navbera van herdû civatan de henin. Dema em kovara *Nûdemê* dinêrin, di derbarê vê mijarê de, anga derbarê têkiliyên xirab yê di navbera civata diyasporayê û ya xwedîmal de, gelek tişt nayên gotin. Heta her wext behsa aliyên erênî yê di navbera civata diyasporaya kurdan û hukûmet û welatîyên wan welatên xwedîmal dîkin. Pirsgirêkên ku di navbera van herdû civatan de derketin ne wê wextê derketin ku kurd koç kirin van welatan lê dema kurd ji bo demeke dirêj li wan welatan man. Dema ew ji bo demeke dirêj li wan welatên biyanî sekinîn û dest bi windakirina hêvîyên xwe yê derbarê vegeerê de kirin, ew çax dest pê kirin bi civata wan welatan re têkiliyeke kûrtir

---

<sup>178</sup> Cewerî, h.g, r.14

daynin û ev jî bû sedem ku di navbera civatên xwedîmal û ya diyasporaya kurdan de problem derên. Di vê derbarê de di hevpeyvînekê de wiha derbas dibe,

*“Divê mirov vê rastiyê jî bibîne, ku kurdên Swêdê ne mîna berê ne, ew di warê kulturî, civakî û edebî de ne mîna berê aktîv in. Ji ber ku êdî ew entegreyî civata Swêdê dibin û loma problemên wan û yên civata Swêdê derdikevin. Îro gelek komeleyên kurdan hatine vê nixteyê, gelo ew ê giraniyê bidin mesela Kurdistanê, an jî giraniyê bidin civata vir, ew ê balanseke çawa çêbibe. Wekî din ew alîkariya dewlet, dezgeh û mueseseyên Swêdiyan ku bi biyaniyan re dikirin jî an kêr bûne an jî nemane.”<sup>179</sup>*

Wek di vê jêgirtinê de jî tê îfadekirin, hukumatên dewletên xwedîmal pey demekê piştgiriyên xwe yên ji bo civatên diyasporayan kêr kirine an jî bi temamî kişandine. Ev jî pirsgerêkeke din e ya di navbera civata xwedîmal û civata diysporayê de.

Bi gelemperî di kovara *Nûdemê* de li ser pirsgerêkên di navbera civata xwedîmal û civata diyasporayê de nehatiye sekinîn. Lê di hin cihan de behsa entegrasyona civata diyasporayê ya ji bo civatên xwedîmal bûye mijara behsê. Mesela, enstîtuyên kurdan yên li Ewropayê ji bo armanca entegrasyonê jî peywir hildaye ser xwe. Mesela, nivîseke Firat Cewerî de li ser vê mijarê em dikarin mînak bibînin. Di wê nivîsê de hin pirs ji sekreterên enstutiyên kurdan yên navûdeng tên kirin. Di nav bersivên sekreterê *Enstutiya Kurdî ya Brukselê* de Derwêş M. Ferho de armanceke enstîtuyê wiha tê ziman,

*“Jîndarkirin, pêşvebirin û nasandina xebata çandî li ser ziman, dîrok, edebiyat û hunera kurdî. Alîkirina Kurdan ji aliyê civakî û çandî jî bo hêsankirina entegrasyona wan di civata Beljîkî û Ewropî de, bê ku ew şexsiyeta xwe ya kurdî winda bikin. Ev her du amancên ha bi xebata agahdarî û gihandinê di warê cihê yên civakî û çandî de bi cî dibin.”<sup>180</sup>*

Wek dawî em ji bo vê taybetiya diyasporayê dikarin bêjin ku ji ber ku dema bi welêt re tê berhevkirin piştgiriyê gelek baş û ciheke azad di diyasporayê de ketiye destê kurdan, di vê kovarê de li ser problemên di navbera civata xwedîmal û civata diyasporayê ya kurdan pirtir li ser avantajên van welatan hatiye sekinîn.

#### **4.2.6. Hîsa Yekîtî û Empatîyê bi Nûnerên Heman Grubê re**

Dema mirov ji welatê xwe dûr dikeve, ew çax pirtir xwe nas dike. Bi naskirina civatên din ve mirov pirtir hay ji xwe dibe û qiymetê dide welatê xwe û kesên weka

<sup>179</sup> Cewerî, h.g, r.14

<sup>180</sup> Derêş M. Ferho, “Sekreterê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê”, *Nûdem*, j.6, (Bihar 1993), r.17-18

xwe. Ji ber vê yekê dema kesek an civatek ji cih û warê xwe dibe, li derveyê welêt li derdora nasnameyekê de kom dibe û yekîtiyekê derdixe meydanê. Kesên weka xwe nêzîkê xwe dibîne û pirsgirêkên wan wek pirsgirêkê xwe dibîne û li hember wan empatiyekê xwedî dike. Di vê çarçoveyê de dema em li taybetiyên civatên diyasporayê dinêrin em rastê wê taybetiyê tên ku di nav wê civatê de yekîti û hîsa empatiyê li hember hevûdu heye. Mesela, dema kurd ji welatê xwe bûn û koç kirin li derveyê welêt gelek federasyonan ava kirin, saziyên yekîtiyê pêk anîn û ew qedera hevpar wan nêzîkî hevdu kir. Em di kovara *Nûdemê* de rastê vê yekê jî tên. Di wê derê de ev mijar wiha tê qal kirin,

*“Mîna tê zanîn, siyasethanên kurdên bakur çî bigire di her warê jîyanê de zîmanê tirkî bi kar tanîn.. Lê gava hatin Swêdê, bi kurdên parçeyên din re ketin têkiyê, bi hev re komele û federasyon ava kirin, hingî dîtî ku heger ew di axaftîna tirkî de serhişkiyê bikin, ew û kurdên parçeyên din wê ji hev tenegehîjin. Loma ew mecbûr man û hêdî hêdî li zîmanê kurdî vegehiyan. Gava li zîmanê kurdî vegehiyan û zîmanê xwe bi dest xistin, êdî şexsiyet û nasnava xwe di zîmanê xwe de dîtî. Loma heta ji wan hat xwe li zimên pêçan.”<sup>181</sup>*

Her wekî di vir de jî hatiye gotin qedera hevpar ya perçên Kurdan li diyasporayê gihandiye hevudû û ev jî bûye sedema pekhatina yekîtiyê.

#### **4.2.7. Di Welatên Xwedîmal de Îhtîmala Jiyanêke Afirîner û Zengîn bi Toleranseke Pluralîzmê ve**

Civatên diyasporayê ji ber ku ji civatên xwedîmal cudatir in, eger şert û şûrtên guncav ji bo wan were afirandin ew dikarin bibin sedema jiyaneke zengîn bi wê cudahiya xwe ve. Dema em civata kurdan ya diyasporayê û serpehatiyên wê dinêrin em rastê vê yekê tên. Bi taybetî li Swêdê ew îmkanên ku dewleta Swêdê ji bo kurdan û civatên din yê diyasporayê pêşkeş kiribûn, bibûn sebep ku li Swêdê mirov rastê çand û zîmanên cuda werên û ev jî nîşaneyêke mezin bû ji bo jiyaneke afirîner û zengîn. Di kovara *Nûdemê* de di derbarê îmkanên dewleta Swêdê ji bo civatê diyasporîk pêşkeş kiribûn gelek in. Em di vê derê de mînakek bidin. Mesela, di derbarê sebebên îmkanê baş yê Swêdê de wiha derbas dibe,

*“Yek di salên sihî û heta niha partiya Sosyaldemokrat li Swêdê hakim bûye. Dudo, di dema ku kurd hatine Swêdê de sosyaldemokratên Swêdê polîtîkayek ji sosyaldemokratên din çepîr dimeşnand û di vê polîtîkayê de jî piştgirî û dostaniya*

---

<sup>181</sup> Cewerî, “Cafê Nûdem”, r.11

*gelên bindest hebû. Hem pozîsyona sosyaldemokrasiya Swêdê ji ya partiyên sosyaldemokrat yê Ewropa cihê bû hem jî raya giştî ya Swêdê bêtir humanîter bû.*<sup>182</sup>

Ev avantajên ku hat behskirin bi xwe re gelek tiştên baş anîn ji bo civatên diyasporayê û ji bo jiyaneke afirîner û zengîn. Mesela, bi zimanên civatên diyasporayê ve zarokên wan dihat perwerdekirin. Di vê derbarê de wiha derbas dibe,

*“Ji sala 1975an vir ve ye ku li Swêdê bi awayekî fermî dersên zimanê zikmakî tê dayîn. Kurd jî van imkanan bi kar tînin, fêdê jê dibînin, lê li welatên din ev imkan tunene. Binêrin, li Swêdê dersên zimanê zikmakî tînin dayîn, pirtûkên dersê hatine çapkirin, heta niha zêdeyî sed pirtûkên zarokan hatine çapkirin. Hê di sala 81ê de kovarên zarokan li Swêdê hatine weşandin.”*<sup>183</sup>

Wek encam em dikarin ji bo vê taybetiya diyasporayê bêjin ku îmkânên baş yê li diyasporayê pêşkeşê kurdan bûn hem ji bo kurdan kêr hat hem jî ji bo wan civatên xwedîmal kêr hat. Ji ber ku kurd karîn xwe li wan deran biparêzin û ziman û edebiyata xwe pêş bixin û civatên xwedîmal jî karîn xwediyê civateke afirîner û zengîn bibin.

#### **4.2.8. Di Civata Orîjînal û ya Xwedîmal de Otonomiya Dîtbarî**

Civatên diyasporayê hem di civata xwe ya orîjînal de ango li welêt hem jî di nav civatên xwedîmal de xwediyê otonomiyeke nîsbî ne. Ji ber ku di nav civata welêt de ew ji hêla rewşenbîrî û entelektuelî de pêşdetir in. Sedemê vê yekê jî ew e ku bi civatên din re danûstandina wan çêbûye û dunyayê ji wan kesên welêt neterikandine zêdetir dinasin. Ev jî ciheke taybet dide wan. Di nav civatên xwedîmal de jî xwediyê otonomiyek nîsbî nin. Ji ber ku, ew xwe ji civatên xwedîmal cudatir dibînin û di nav xwe de xwediyê yekîtiyekê nin. Ev mijar jî di kovara *Nûdemê* de hatiye qalkirin. Mesela di derbarê îmkânê zimên li derveyê welêt û bi vê yekê ve destxistina otonomiyeke dîtbarî hatiye li ser zimên. Di kovara *Nûdemê* de wiha debas dibe,

*„Kurdên Swêdê gelek kursên zimanê kurdî li dar xisitîn, niha jî berdewam in. Li unîversîteya Stockholmê beşa kurdî hat vekirin, li unîversîteya Uppsalayê beşa kurdî heye. Kurd bi xwe di peywendiyên xwe de kurdî bi kar tînin. Gava di salên heştêyî de Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê hate avakirin, wê jî di warê bikaranîna zimanê kurdî de roleke mezîn lîst.”*<sup>184</sup>

Dîsa di warê ekonomîk de jî piştgiriya dewleta Swêdê ji bo kurdan çêbûye û ev jî mînaekeke baş e ji bo otonomiyek dîtbarî li welatê xwedîmal. Ji bo piştgiriya ekonomîk bo weşanên kurdî di kovara *Nûdemê* de gelek tişt derbas dibin. Em ê di vê derê de tenê mînakek bidin. Ew jî ev e,

<sup>182</sup> Cewerî, h.g, r.6

<sup>183</sup> Cewerî, h.g, r.12

<sup>184</sup> Cewerî, h.g, r.13

*“Îmkanên aborî ku dewleta Swêdê daye weşanên kurdan li tu welatên din tunebû. Heger te ev ronakbîrên kurdên Swêdê hemû li Almanyayê bicivandina û imkan nedaya wan, wan ê tu tişt nekirana.”<sup>185</sup>*

Di vê beşê de hemû mînakên me ji kovara *Nûdemê* anîn ji bo şopên diyasporaya kurdî ya li Ewropayê di kovara *Nûdemê* de pênasekar in. Bi vî rengî gelek mînakên din jî di vê kovarê de henin. Em ê bi ev qasê ve kîfayet bikin.

---

<sup>185</sup> Cewerî, h.g, r.12

## ENCAM

Kovara *Nûdemê* kovareke diyasporayê bû. Ew, wek armanc jîndarkirina ziman û edebiyata kurdî dabû ber xwe û di vê riyê de ji bo deh salan li xerîbiyê hate derxistin. Ev kovar ne tenê kovarek bû, lê heman demê de dibistanek jî bû. Ew dixwast hem xwendekarên xwe perwerde bike û wan di warê zimanê kurdî û edebiyatê de pêş bixe, hem jî dixwest ku ji bo edebiyata kurdî nivîskarên nû bigihîne. Her çiqas di vê mijarê de çiqas ser ket ne mijara me be jî, em dikarin bêjin qonaxek bû ku ji bo ziman, çand û edebiyata kurdî pir bifayde bû. He çiqas *Nûdem* bo standardîzasyona zimanê kurdî xebitîbe û ji bo hin tiştên rûnên gelek serketîbe jî di yekîtiya zaravayan de serneketiye.

Kovara *Nûdemê* ji hêla aboriya xwe ve hinek ji kevneşopiya kovargerîya kurdî cudatir bû. Lewra ev kovar wek kovar û rojnameyên din yê kurdî ji hêla ekonomîk ve tengasiyên mezin nekişand û vê serketina xwe jî ji tedbîrên edîtorê kovarê Firat Cewerî re deyndar e. Ji ber ku Firat Cewerî çî keda xwe ya şexsî çî jî kalîteya kovarê ve li hember vê pîrsgirêka aborî gelek serkeftî berxwe de. Jixwe derxistina vê kovarê ji ber tengasiyên aborî na lê ji ber hin pîrsgirêkên derûnî yê edîtorê wê dawî hat.

*Nûdem* ne tenê navê kovarek bû lê di heman demê de navê çapxane, cafê û kovareke din ya bi navê *Nûdem Wergerê* jî bû. Firat Cewerî, ji bo jîndarkirina ziman û edebiyata kurdî ne tenê vê kovarê derxist, ew têgihîştibû ku eger ew pirtûkên kurdî çap neke û derdoreke ku kurdî teşwîq bike dernexe holê dê kovar tenê kêmbimîne. Ji bo vê yekê, ew hem *çapxaneya Nûdemê* hem jî cafêyek bi navê *cafê Nûdemê* vekir da ku aktîvîteyên jîndarkirin û pêşxistina ziman û edebiyata kurdî firehtir bike.

Kovara *Nûdemê* ji bo pala xwe bide cihek û ji bo ji kevneşopiyekê destek bigrê, Firat Cewerî vê fikr û projeya *Nûdemê* parast kovara *Hawarê* ya ku ji hêla Celadet Elî Bedirxan ve hatibû derxistin. Firat Cewerî wek xîmê projeya xwe ya *Nûdemê* kovara *Hawarê* ji xwe re mînak girtibû û dixwest bi vê riyê ve wê xizmetê berdewam bike ku Mîr Celadet dabû destpêkirin. Ew digot; wek kovara *Hawarê*, kovara *Nûdemê* jî dixwaze ji siyasîetê dûr bimîne û tenê ji bo zimanê kurdî xizmetê bike.

Hêj ji dema Osmaniyan kurd dest bi çûyîna Ewropayê kiribûn. Lê ji bo diyasporaya kurdan ya ku mahiyeta diyasporayê dest xistiye, koçên pey salên 1950yî avakar bûn. Ev koçan çî di encama pîrsgirêkên aborî çî jî di encama pîrsgirêkên siyasî be, bû sebeb ku girseyeke mezin ya kurdan li derveyê welêt kom bibin. Ev girse, bi

taybetî jî yên di encama sedemên siyasî de çûbûn derveyê welêt di nav gelek tevgerên lobîyî de cih girtin û ji bo çand, ziman û edebiyata kurdan xizmetên hêja kirin. Ji nav kurdên Ewropayê, kurdên Swêdê ciheke taybet digrên. Lewra, ew her çiqas kêr bin jî, ji hêla çalakiyê ve gelek aktîf bûn. Kovara *Nûdemê* jî yek encameke van çalakiyan e.

Alieyke din ya ku di projeya *Nûdemê* de li ber çavê me dikeve, giringiya ji bo wergerê hatiye dayîn e. Kovara *Nûdemê* hem bi wergerên ku di kovarê de hatibûn kirin ve hem teşebbusa kovara *Nûdem Wergêr* ve û hem jî bi pirtûkên wergêr yên di *çapxaneyê Nûdemê* de hatibûn derxistin ve, wergêr û wergervaniyê di ciheke navendî ya vîzyona xwe de cih kiribû. Ew wek vîzyon wergêrê wek çavkaniya zengîniya ziman û pêşdaxistina zimanê kurdî didît.

*Nûdem* kovareke surgunê bû û ji hêla diyasporaya kurd ve dihat derxistin. Hem xwedî û berpirsiyarê kovarê Fîrat Cewerî hem jî pîrî nivîskarên vê kovarê kesên surgunbûyî bûn û parçeyek ji diyasporaya kurdî bûn. Em di vê kovarê de, di gelek cihan de şopên surgunê bi awayeke xwerû dibînin. Şopên surgunê yên erênî û neyînî, derûniyeta surgunê xwe di vê kovarê de bi şikleke aşîkar nîşanê me dide. Em xên ji şopên derûniyeta surgunîyê yên takekesî, di vê kovarê de suretê civateke diyasporayê jî dibînin. Hema bêje hemû taybetiyên diyasporayê klasîk ya polîtîk di vê kovarê de li ber çavê me ye. Ji saziyên civakî yên diyasporayê bigire heta tevgerên ji bo welat û têkiliyên hem tiransasyonel hem jî yên bi welatê eslî re, ev kovar eyîneya civatek diyasporîk e.

Wek dawî em dikarin bêjin, Kovar *Nûdemê* kovarek e ku ji hêla kesên surgunbûyî ve hatiye derxistin û wêneyeke zelal ya civata diyasporaya kurdan li ber çavê me radixe.

## PÊVEK

### Pêvek 1: Weşanên *Nûdemê*

1. Bingehên Gramera Kurmancî/Celadet Alî Bedir-Xan
2. Dê û Dêmarî/Egîdê Xudo/Roman
3. Keskesor/Nûredîn Zaza/Çîrok
4. Di Foklora Kurdî de Serdestiyeke Jinan/Rohat/Lêkolîn
5. Hêz û Bedewiya Pênûsê/Mehmet Uzun/Gotar
6. Mîrza Mehemed/Medenî Ferho/Roman
7. Milkê Evînê/Rojen Barnas/Şîr
8. Zaroka Şevê/Jack London/Werger Mustafa Aydogan
9. Biyanî/Albet Camus/Werger: Fawaz Husên
10. Gotin/Yaşar Kaya/Gotar
11. Antolojiya Çîroka Nû ya Kurmancên Başûr/Xelîl Duhokî
12. Şevên Sipî/Dostoyevskî/Werger: Firat Cewerî
13. Mişk û Mirov/John Steinbeck/Werger: Firat Cewerî
14. Bexçeyê Vîşne/Çexov/Werger: Firat Cewerî
15. Gotinên Navdaran/Firat Cewerî/Aforîsma
16. Girtî/Firat Cewerî/Çîrok
17. Kevoka Spî/Firat Cewerî/Çîrok
18. Kultur, Huner û Edebiyat/Firat Cewerî
19. Dara Hinarê/Yaşar Kemal/Werger: Firat Cewerî
20. Dîwar/Sartre/Werger: Firat Cewerî
21. Çîroka Malbata Evdo/Firat Cewerî
22. Li Mala Mîr Celadet Alî Bedir-Xan/Firat Cewerî
23. Xezal/Sîma Semend/Çîrok

24. Evîna Reben/Derwê M. Ferho/Şiîr
25. Banga Hawarê/Medenî Ferho/Şiîr
26. Kultur û Raman/Şerefxan Cizîrî/Gotar
27. Kurê Zinarê Serbilind/Sidqî Hirorî/Roman
28. Şîrên Bijarte/Mayakovskî/Werger: Süleyman Demir
29. Pêlên Bêrîkirinê/Mustafa Aydogan/Roman
30. Şerefa Wendabûyî ya Katharina Blum/H. Böll/Werger: Şahîne B. Soreklî
31. Hîngê/Rojen Barnas/Çîrok
32. Sorê Gulê/Süleyman Demir/Roman
33. Pêşmerge/Rehîmê Qazî/Weger Ziya Avcî
34. Keşa Kurd Zengê/Cemşîd Bender/Werger: F. Cewerî, S. Demir
35. Epîlog/Hesenê Metê/Çîrok
36. Siltanê Fîlan/Yaşar Kemal/Werger: Mustafa Aydogan
37. Evîn û Şewat/Sidqî Hirorî/Roman
38. Çîrokên Hezar û Şevkê/Serdar Roşan
39. Sê roj û Sê Şev/Laleş Qaso/Roman
40. Kultur û Edebiyata Devkî/Şerefxan Cizîrî/Gotar
41. Lawikê Xerzî/Mahmûd Baksî/Roman
42. Mircan Qelew/Maupassant/Werger: Serdar Roşan
43. Bi Xatirê Sîlehan/Hemingway/Werger: Serdar Roşan
44. Pêlên Derya Reş/Firat Cewerî/Gername
45. Emîl Li Lönnebergayş/Astrîd Lîndgren/Werger: Firat Cewerî
46. Şûmiyên Emîl Yên Nû/Astrîd Lîndgren/Werger: Firat Cewerî
47. Emîl hê jî li Lönnebergayê Dijî/Astrîd Lîndgren/Werger: Firat Cewerî
48. Çîroka Apoyê Hûrik/Barbro Lîndgren/Werger: Firat Cewerî

49. Ronya/Astrîd Lîndgren/Werger: N. Zaxuranî
50. Birayên Dilşêr/Astrîd Lîndgren/Werger: N. Zaxuranî
51. Moa û Pelle/Kerstîn Johansson/Werger: Serkan Birûsk
52. Matîlda/Annika Holm/Werger: N. Zaxuranî
53. Kûçikê ku ber bi stêrkekê ve baz da/Henning Mankell/Werger: Mihemed

Dehsiwar

54. Hawr 2 Cîld
55. *Nûdem* WERGER

## Pêvek 2: Gurza Numuneyan ya *Nûdemê*

**Tablo 2 Gurza Numuneyan ya *Nûdemê***

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
<b>A. Balî</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Abdullah Keskîn</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Abidîn</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Abidîn Azad</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Ahmet Akin</b>	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Jaques Prevent
<b>Ahmet Akin</b>	Kurmancî	1	Nameyên Xwendevanan	
<b>Arif Zêrevan</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Arjen Arî</b>	Kurmancî	5	Helbest	
<b>Asfika Qadir</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Asfika Qadir</b>	Kurmancî	1	Name	
<b>Azad Şatehî</b>	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Alponse Daudet
<b>B. Akreyî</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Badal Ravo</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Baran Fundermann</b>	Kurmancî	1	Ceribîn	
<b>Bareş Bettê</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Bedirxan Epozdemîr</b>	Kurmancî	1	Danasîn	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
<b>Bedîrxan Epozdemîr</b>	Kurmancî	2	Helbest	
<b>Bedîrxan Epozdemîr</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Beşîr Botanî</b>	Kurmancî	1	Danasîn	
<b>Beyhanî Şahîn</b>	Kurmancî	3	Çîrok	
<b>Brader</b>	Kurmancî	1	Ceribîn	
<b>Cafê Nûdem</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Can Gülşenoğlu</b>	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Jaques Prevent
<b>Can Gülşenoğlu</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Can Gülşenoğlu</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Celadet Elî Bedîrxan</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Çiya Mazî</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Derwêş M. Ferho</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Derwêş M. Ferho</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Derwêş M. Ferho</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Dilower Mêqerî</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Dost Çiyayî</b>	Kurmancî	2	Helbest	
<b>Dr. Poloço</b>	Kurmancî	1	Kurteçîrok	Werger Ji Hemîngway
<b>Dr. Poloço</b>	Kurmancî	1	Rexne	Werger ji Paul LAFARGUE

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
<b>Ebdulbaqî Huseynî</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Ehmed Huseynî</b>	Kurmancî	1	Ceribîn	
<b>Ehmed Huseynî</b>	Kurmancî	1	Kurteçîrok	
<b>Elend Darwin</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Elend Darwin</b>	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
<b>Elî Cefer</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Emîn Narozi</b>	Kurmancî	2	Lêkolîn	Werger ji Mele Ehmedê Zivingî
<b>Emîn Narozi</b>	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Necîb Mehfûz,
<b>Emîn Narozi</b>	Kurmancî	2	Bîyografî	
<b>Enwer Karahan</b>	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Ahmet Altan
<b>Enwer Karahan</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Enwer Karahan</b>	Kurmancî	1	Rexne	
<b>Evîn Aydar</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Faruk Yakûp</b>	Zazakî/Kirdkî	1	Bîyografî	werger ne diyar e.
<b>Faruk Yakûp</b>	Zazakî/Kirdkî	1	Bîyografî	
<b>Fawaz Husên</b>	Kurmancî	1	Bîyografî	
<b>Fawaz Husên</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Felat Dilgeş</b>	Kurmancî	1	Çîrok	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
Ferhad Pîrbal	Kurmancî	1	Helbest	
Ferhad Pîrbal	Soranî	1	Lêkolîn	
Fetulla Huseynî	Kurmancî	1	Danasîna Pirtûkan	
Fewzî Bilge	Kurmancî	1	Çîrok	
Firat Cewerî	Kurmancî	1	parçepirtûk	Werger ji Jostein Gaarder
Firat Cewerî	Kurmancî	2	Lêkolîn	werger nivîskar ne diyar e, ji Oktavîo Paz
Firat Cewerî	Kurmancî	1	Bersiv ji bo Nameyên Xwendekaran	
Firat Cewerî	Kurmancî	1	Bîyografî	
Firat Cewerî	Kurmancî	1	Çîrok	
Firat Cewerî	Kurmancî	3	Hevpeyvîn	
Firat Cewerî	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Firat Cewerî	Kurmancî	7	Nivîsa Sereke	
Firat Cewerî	Kurmancî	1	Rexne	
Firat Cewerî	Kurmancî	2	Sohbet	
H. Kiliç	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
H. Kiliç	Kurmancî	2	Name	
H. Kovan Baqî	Kurmancî	1	Helbest	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
H. Sefkan	Kurmancî	1	Helbest	
Havîz Qazî	Kurmancî	1	Çîrok	
Havîz Qazî	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Hemîd Kiliçaslan	Kurmancî	1	Serpêhatî	Werger ji kî ye ne diyar e.
Hesenê Metê	Kurmancî	2	Kurteçîrok	
Hesenê Qazî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Heyderê Omerî	Kurmancî	1	Bîyografî	
Heyderê Omerî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Heyderê Omerî	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Husein Muhammed	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Juhani Hinkkanen
Husein Muhammed	Kurmancî	1	Çîrok	
Husên Düzen	Kurmancî	1	Ceribîn	Werger ji Hermann Hesse
Hussên Hebeş	Kurmancî	1	Çîrok	
Î. Omerî	Kurmancî	2	Helbest	
Îbrahîm Al	Kurmancî	1	Ceribîn	
Îbrahîm Seydo Aydogan	Kurmancî	1	Helbest	
J. Espar	Zazakî/Kirdkî	1	Helbest	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
<b>Jîr Dilovan</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Kamran Haco</b>	Kurmancî	1	Kurteçîrok	
<b>Kawa Nemir</b>	Kurmancî	2	Helbest	
<b>Kekê Xêfît</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Konê Reş</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Koya Berz</b>	Zazakî/Kirdkî	1	Bîyografî	
<b>Laleş Qaso</b>	Kurmancî	1	Çîrok	
<b>Lokman Polat</b>	Kurmancî	1	Danasîna Pirtûkan	
<b>Lokman Polat</b>	Kurmancî	1	Kurteçîrok	
<b>Loran Cengîn</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	Werger Ji Edward Petêşka
<b>M. Bêkes</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>M. Emîn Pencewînî</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>M. Mayî</b>	Kurmancî	3	Lêkolîn	
<b>Medenî Ferho</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Medenî Ferho</b>	Kurmancî	1	Serpêhatî	
<b>Mehmet Aktaş</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Mehmet Uzun</b>	Kurmancî	5	Helbest	Werger ji Alî Bîçer, Huseyin Elçi, A. Hîcrî Îzgören, Îhsan Fîkret Bîçîcî, Yilmaz

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
				Odabaşî
<b>Mehmet Uzun</b>	Kurmancî	1	parçeroman	
<b>Mehmet Uzun</b>	Kurmancî	1	Rexne	
<b>Mervanê Keleş</b>	Kurmancî	5	Helbest	
<b>Mihemed Dehsiwar</b>	Kurmancî	3	Bîyografî	
<b>Mihemed Efif Huseynî</b>	Kurmancî	1	Helbest	
<b>Musa Anter</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Mustafa Aydogan</b>	Kurmancî	1	Lêkolîn	
<b>Mustafa Cizîrî</b>	Kurmancî	2	Hevpeyvîn	
<b>Mustafa Düzgün</b>	Kurmancî	1	Gotinên Navdar	Werger tevlihev ji Felsefeya Yewnanan
<b>N. Zarûxanî</b>	Kurmancî	1	Ceribîn	
<b>N. Zarûxanî</b>	Kurmancî	1	Rexne	
<b>Newzad Shokrî</b>	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Margereta
<b>Nûdem</b>	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Arthur Rimbaud
<b>Nûdem</b>	Kurmancî	1	Name	Werger ji Henry Miller

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
Nûdem	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Sharock Kamyab
Nûdem	Kurmancî	9	Hevpeyvîn	
Nûdem	Kurmancî	2	Lêkolîn	
Nurettîn Zaza	Kurmancî	1	Name	
Ömer Okumuş	Kurmancî	1	Helbest	
Osman Sebrî (Nivîskarê Hawarê)	Kurmancî	1	Çîrok	
Qedrî Can	Kurmancî	2	Çîrok	
Qedrî Can	Kurmancî	1	Helbest	
Remezhan Alan	Kurmancî	2	Helbest	
Rênas Jiyân	Kurmancî	1	Helbest	
Reşxan Mahmûdî	Kurmancî	1	Çîrok	
Rohat	Kurmancî	1	Danasîna Pirtûkan	
Rohat	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Rohat Alakom	Kurmancî	2	Lêkolîn	
Rojen Barnas	Kurmancî	13	Helbest	
Rojen Barnas	Kurmancî	3	Lêkolîn	
Rojen Barnas	Kurmancî	1	Serpêhatî	
Rojhat Azadî	Kurmancî	1	Kurteçîrok	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
S. Sulevanî	Kurmancî	1	Ceribîn	
S. Sulevanî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Sabah Kara	Kurmancî	4	Helbest	
Şahînê Bekirê Soreklî	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Antione de saint-exupery
Şahînê Bekirê Soreklî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Şahînê Bekirê Soreklî	Kurmancî	2	Kurteçîrok	
Şahînê Bekirê Soreklî	Kurmancî	1	Serpêhatî	
Şakir Epözdemir	Kurmancî	1	Helbest	
Şakir Epözdemir	Kurmancî	1	Nameyên Xwendevanan	
Salihê Kevirbirî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Sebrî Botanî	Kurmancî	1	Danasîn	
Şefik Kaya	Kurmancî	1	parçeroman	
Şefik Kaya	Kurmancî	1	Rexne	
Selahattin Bulut	Kurmancî	2	Çîrok	
Selahattin Bulut	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Serdar Roşan	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Guy de Maupassant
Şerefcan Cizîrî	Kurmancî	7	Ceribîn	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
Serkan Brûsk	Kurmancî	2	Helbest	
Seydoyê Kûso	Kurmancî	1	Helbest	
Sidqî Hirorî	Kurmancî	1	Çîrok	
Silêman Demîr	Kurmancî	1	Çîrok	
Siyamend Birahîm	Kurmancî	1	Bîyografî	
Suleyman Demîr	Kurmancî	2	Helbest	Werger ji Özkan Mert, Mayakovskî
Suleyman Demîr	Kurmancî	1	Ceribîn	Werger ji Vladimir Mayakovskî
Suleyman Demîr	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Tosinê Reşîd	Kurmancî	1	Çîrok	
Tosinê Reşîd	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Wezîrê Eşo	Kurmancî	3	Lêkolîn	
Xebat Arif	Kurmancî	1	Helbest	
Xelîl Dihokî	Kurmancî	1	Hevpeyvîn	
Xelîl Dihokî	Kurmancî	2	Lêkolîn	
Xelîlê Çaçan	Kurmancî	1	Kurteçîrok	
Yağob Tilermenî	Kurmancî	2	Çîrok	
Yaşar Kaya	Kurmancî	1	Serpêhatî	

Nivîskar	Zarava	Hejmara Nivîsan	Cure	Kesê ku werger jê hatiye kirin
Zagrosê Haco	Kurmancî	1	Çîrok	Werger ji Varlîn STRANSEV
Zekî Bozarşan	Kurmancî	1	Lêkolîn	
Zerdeşt Haco	Kurmancî	1	Helbest	Werger ji Nîlgûn Demirkaya
Zeynelabîdîn Zinar	Kurmancî	4	Lêkolîn	
Zîya Avcî	Kurmancî	1	Lêkolîn	Werger ji Kemal Mazhar Ehmed
Zîya Avcî	Kurmancî	1	Bîranîn	Werger ji Refîq Hîlmî (soranî)
Ziya Şeker	Kurmancî	1	Danasîn	

### **Pêvek 3: Bi Firat Cewerî re Hevpeyvîn**

**1-Di destpêka jiyana *Nûdemê* de we di nav rûpelên kovara *Nûdemê* de cih dan zaravayên kurdî; kurmancî soranî û zazakî. Ji vê yekê armanca we çi bû? Paşê we çima di kurmancî de biryar girt?**

- Di destpêka *Nûdemê* de min dixwest ez kovarekê derxim ku temsîla hersê zaravayên kurdî bike. Herçiqa di nav zaravayên kurdî de zaravayê kurmancî yê herî mezin û berfireh be jî lê dîsa herdu zaravayên me ên din jî ên nivîsandinê ne. Loma, min xwest ku ew jî di kovarê de bibe temsîlkarên zaravayên xwe. Ji ber ku ez bi xwe ne şarezayê van herdu zaravayan im, min nikarîbû korntrola nivîsan jî bikira. Gava min fêhm kir ku ez ê nikaribim bi qasî zaravayê kurmancî kontrola nivîsan bikim, min got ya herî baş ew e ku ez van herdu zaravayan ji şarezayên wan re bihêlim û loma min tenê bi kurmanciyê dewam kir.

**2-Gelo we ji reklaman pere distendin û pirtir reklamên tiştên çawa dikirin?**

- Na, mixabin, me ji reklaman pere qezenc nedikir. Reklamên ku me carina dikir jî reklamên kovar û weşanxaneyan bû û bi wê jî armanaca me ew bû ku em balê bikişînin ser ziman û edebiyata kurdî.

**3- Çend caran dewleta Swêdê ji bo ku hun kovara xwe derxin hun fînanse kirin? Derbarê van alikariyan û şert û şûrtên van alîkariyan de dikarin agahî bidin?**

- Me deh salan kovar derxist, di hundirê deh salan de, konseya kulturê ya Swêdê alîkariya pênc şeş hejmarên me kir, lê em li ser aboneyên xwe dijîyan.

**4- Derbarê *Nûdem Werger* û *Çapxaneya Nûdemê* de hûn dikarin hinek agahî bidin? Çima *Nûdem Werger* emirdirêj nebû?**

- Di wan salan de zêde tişt tunebûn, loma, her valahiya ku min didît min dixwest ez dagirim. Gava min bi weşana *Nûdemê* re weşanxane ava kir, armanca min ew bû ku ez bingehe weşanxaneyê modern û profesyonel bavêjim. Ji ber ku heta hingê tiştêkî serbixwe tunebû. Armanca min bi derxistina kovara *Nûdem Werger* jî her ew bû. Ji ber ku min pir guh dida wergerê û ez bawer bûm ku edebiyata kurdî anca bi wergerê bikemile û bibe şîrîka edebiyata dinyayê. Fikra min ya di derheqê wergerê de hê jî ev e.

**5- Nivîskarên *Nûdemê* kî bûn. Gelo di gihandina nivîskarên kurd de cihê *Nûdemê* çî ye?**

- Nivîskarên *Nûdemê* ji hemû pereçeyên Kurdistanê û ji diasporayê bûn. Herweha ji hemû partî û rêxistinên, an jî bêyî partî û rêxistin bûn. Armanca min tenê edebiyat bû. Gelek nivîskarên ku îro xwedî kitêb in û di riya nivîskariyê de berdewam in nivîsên xwe ên pêşî di *Nûdemê* de weşandine. *Nûdem* ji bo gihandina gelek nivîskaran bû deriyê pêşî, ew di wî deriyê re derbasî cihana edebiyatê bûn.

**6- Gelo cenabê we di kovara *Nûdemê* de kêjan nava bikara anîye?**

- Min ji bilî navê xwe navê Dr. Poloço û ez bawer dikim min navê Hatîce Al bi kar aniye.

**7- Bi taybetî Dr. Poloço ji hêla we ve hatiye bikaranîn û bi bikaranîna van nava jî armanca we çî bûye?**

- Min navê Dr. Poloço hê berî dema *Nûdemê* bi kar dianî. Ji ber ku dema min dinivîsand temenê min biçûk bû û ez ji temenê xwe jî hê biçûktir dixuyam. Loma, kê li min dînerî, digot, ma wê ji ku vî zarokê ev tiştên cidî nivîsandibe. Yek jê min xwest bi vî navî hem bibihîzim ka gelo xelk di derheqê nivîsên min de çî difikirin, di dema *Nûdemê* de jî min xwest bi sernava Doktor bidim diyarkirin ku kadroya *Nûdemê* kadroyeke rengîn e.

**8- Nivîsên ku nivîskarê wê wek *Nûdem* derbas dibin ji hêla we ve hatiye derxistîn?**

- Hemû navên ku di *Nûdemê* de wek *Nûdem* derbas dibin, ez bi xwe me...

**9- Çima we ewqas girîngî da wergerê?**

- Bi riya wergerê zimanek dikemile. Formulasyon û hostatiya nivîskarên cîhanî dibin malê zimanê me. Ji aliyê din ve zimanê me dibe şîrkê zimanên cîhanê û edebiyata me ji qalibê xwe ê teng rizgar dibe û rengê cîhanî werdigire.

**10- Cenabê we ji kêjan zimanan werger dikir û kirîterên we çî bû û di *Nûdemê* de wergerên dihatin kirin bi gelemperî ji kêjan zimanan bûn?**

- Piştî çend salên weşana *Nûdemê*, her ku çû hejmara nivîskarên me zêdetir bûn û ji ber ku nivîskarên me li seranserî dinyayê hebûn û bi gelek zimanan dizanîbûn, me jî

wergerên ji gelek zimanên cihê dikirin. Yanî, me bi taybetî berê xwe nedida zimanekî. Me hewl dida ku gelek ziman di *Nûdemê* de werin temsîlkirin da ku em di pêşerojê de berhemên wan ziman wergerînin kurdî.

**11- Pey ku xelata *Nûdemê* ya ji bo teşwîqa nivîskariya kurdî hate belavkirin biryara ji bo nivîskarên kurd xelata *Nûdemê* hatibû sitandin. Gelo ew careke din hate rojevê an na. Çima?**

- Mîna doh, ez îro jî kêmaniya xelateke edebiyatê dibinim. Heke îro îmkanek têkeve destê min û ez zanibim ez ê bikaribim bingehê xelateke edebiyatê ya berdewam biavêjim, ez aniha wî bingehê deynim. Armanca min ya xelata edebiyatê ya *Nûdemê* ew bû ku ez bi riya xelatkirina nivîskarên ciwan, hem wan teşwîqî nivîsandina edebiyata kurdî bikim û hem jî ez hewayeke erênî ya xwendin û nivîsandina zarê kurdî ava bikim.

**12- Çima *Nûdem* di şopa *Hawarê* de çû?**

- Gava xwediyê *Nûdemê* bi dû şopa *Hawarê* ket, hemû hejmarên *Hawarê* ên wendabûyî bi dest xist, ket nav rûpelên wê, dît tiştê ku ew lê difikire, wa ye Celadet Alî Bedir-Xan berî bi salên dirêj kiriye. Ji ber ku armanca *Hawarê* ne siyaseta rojane ya partîtiyê bû, *Nûdem* jî li dû tiştêkî weha digeriya û xwest wê tradisyona kevin, ya bêalîtiya edebiyatê bidomîne.

**13- Di *Nûdemê* de cihê jinê çî bû?**

- Min qîmeteke taybet dida jinê û hê jî wî qîmetî didim jinê, Edebiyata ku jin tê de tunebe, bi ya min ew edebiyat xav e.

**14- Çima di kovara *Nûdemê* de zêde girîngî ji bo *Xelata Nobelê* hatiye dayîn?**

- Ji ber ku *Nûdem* li welatê Nobel derdiket û xwediyê *Nûdemê* pir guh dida û hê jî guh dide xelatên edebiyatê.

**15- Vîzyon û mîsyona kovara *Nûdemê* ya ji bo standardîzasyona zimanê kurdî çî bû û gelo li gor we çiqas serket?**

- *Nûdemê* di dema xwe de standarteke zimanê kurdî ava kiribû. Piraniya nivîskarên *Nûdemê* hewl didan ku wek hev binivîsin. Min bi xwe jî, bêyî ku ez dilê nivîskaran bihêlim, gelek caran midaxeleyî nivîsan dikir, zimanê wan serast dikir û dikir ku hewayeke wekhev ji nivîsan bê.

**16- Pey ku hejmara dawî ya *Nûdemê* hate weşandin gelo weşanxaneyê *Nûdemê* dewamê çapa pirtûkan kir an na? Çima?**

- Gava kovara *Nûdemê* rawestiya, weşanxaneyê *Nûdemê* ket ber sikartê, ew jî hêdî hêdî mir...

## ÇAVKANÎ

### Pirtûk

- Akin, Salîh, **Lêkolînên Zimannasiya Kurdî**, Stanbol: Çapxaneya Avestayê, 2013.
- Alakom, Rohat, **Kars Kürtleri**, İstanbul: Avesta Yayınları, 2009.
- Alan, Remezan, Ergin Öpengin, **Tîr û Armanc**, Amed: Weşanxaneya Peywend, 2014.
- Alinia, Mînoo, **Sipaca of Diaspora; Kurdish Identities, Experiences of Otherness and Politics of Belonging**, Göteborg: Doctoral Dissertation, Department of Sociology, Göteborg University Press, 2004.
- Barnas, Rojen, **Kadiz**, Stenbol: Weşanên Nûbiharê, 2013.
- Baser, Bahar, **The Kurdish Diaspora in Europe; Identity Formation and Political Activizm**, Boğziçi University-TÜSİAD Foreign Policy Forum Research Report.
- Bauböck, Rainer and Faist, Thomas, **Diaspora and Transnationalism (Concepts, Theories and Methods)**, Amsterdam: Amsterdam University Press, 2010.
- Boldor, Alexandru, **Exile As Severance**, Teza Doktorayê, Louisiana State University.
- Bozarslan, M. Emîn, **Jîn (Kovara Tirkî-Kurdî, Türkçe-Kürtçe Dergi) (1918-1919)**, Uppsala: Weşanxana Deng, Sweden.
- Diken, Şehmuz, **Amidalılar Sürgündeki Diyarbekirliler**, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Dilgeş, Felat, **Rojnameya Kurdî ya Pêşîn Kurdistan**, Stenbol: Weşanê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 1992.
- Khayati, Khalid, **Sweden As A Gravitation Center For The Kurds - Diaspora Formation And Transnational Relations**.
- Koleksiyona Hawarê**, Stenbol: Belki Basın Yayın Dağıtım, 2012.
- Malmîsanij, **Kürt Teavün ve Terakki Cemiyet ve Gazetesi**, İstanbul: Çapxaneya Avesta, 1999.
- Ozmen, Zekî, **Kurdên Almanyayê**, Amed: Weşanên Ronahî, 2010.
- Said, Edward W., **Entelektüel (Sürgün, Marjinal, Yabancı)**, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2011.
- Said, Edward W., **Kış Ruhü**, İkinci Baskı, İstanbul: Metis Yayıncılık, 2006.
- Uzun, Mehmed, **Bir Dil Yaratmak**, İstanbul: İthaki Yayınları, 2009.
- Uzun, Mehmed, **Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê**, İstanbul: Çapxaneya İthakî, 2010.
- Yücel, Oğuz, **Yabancı Dil Öğretiminde Çevirinin Yeri ve Önemi**, Ankara: Yelken Basın-Yayın-Dağıtım, 2004.

### Gotar

- Alî Bedir-Xan ,Celadet, “Qapaxa Paşî”, **Nûdem**, j.3, Bihar, 1995.
- Bender, Cemşîd, “Çîroka Jiyana Min”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.

- Cewerî, Firat, “Bîranînên Mezinên Kurdan”, **Nûdem**, j.15, Payîz 1995.
- Cewerî, Firat, “Cafê Nûdem”, **Nûdem**, j.37, Bihar, 2001.
- Cewerî, Firat, “Çardesaliaya Şerefnameyê”, **Nûdem**, j.17, Bihar, 1996.
- Cewerî, Firat, “Çend Gotin”, **Nûdem**, j.1, Bihar, 1992.
- Cewerî, Firat, “Çend Gotin”, **Nûdem**, j.2, Havîn, 1992.
- Cewerî, Firat, “Çend Gotin”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.
- Cewerî, Firat, “Çîroka Min û Nûdemê”, **Nûdem**, j.39-40, Payîz-Zivistan, 2001
- Cewerî, Firat, “Hawara Netewî”, **Nûdem**, j.27, Payîz, 1998.
- Cewerî, Firat, “Ji bo Çi Kurd bi Kurdî Naxwînin?”, **Nûdem**, j.22 Havîn, 1997.
- Cewerî, Firat, “Kurdên Swêdê”, **Nûdem**, j.37, Bihar, 2001).
- Cewerî, Firat, “Nameyên Xwendevanan”, **Nûdem**, j.17 Bihar, 1996.
- Cewerî, Firat, “Nûdem Ber bi Sallên 2000ê ve”, **Nûdem**, j.32, Zivistan, 1999.
- Cewerî, Firat, “Nûdem Bû Sê Salî” **Nûdem**, j.12, Zivistan, 1994.
- Cewerî, Firat, “Nûdem û Aboriya Wê”, **Nûdem**, j.26, Havîn, 1998.
- Cewerî, Firat, “Nûsala We Pîroz Be!”, **Nûdem**, 16, Zivistan, 1995.
- Cewerî, Firat, “Rola Cafêyên Kulturî”, **Nûdem**, 34, Havîn, 2000.
- Cewerî, Firat, “Surgun û Edebiyata Kurdî”, **Nûdem**, j.33 Bihar, 2000.
- Cewerî, Firat, “Swêd, Alfred Nobel û Xelata Wî”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.
- Cewerî, Firat, Edebiyata Kurdî Ya Surgunê, **Nûdem**, j.1, Zivistan 1992.
- Cewerî, Firat, Hawara Neteweyî”, **Nûdem**, j.27, Payîz, 1998.
- Ferho, Derwêş, “Kurtejiyana Min”, **Nûdem**, j.4, Zivistan 1992.
- Hawar, “Armanc, Awayê Xebat û Nivîsandina Hawarê”, **Hawar**, j.1, Gulan, 1932.
- Lokman Polat, “Kovarên Kurdî li Ewropa”, **Nûdem**, j.5 Bihar, 1993.
- Nûdem, “Agahdariyek Ji Bo Xwendevan û Nivîskarên Nûdemê”, **Nûdem**, j.11, Payîz, 1994.
- Nûdem, “Agora”, **Nûdem**, j.8, Zivistan, 1993.
- Nûdem, “Bibe Aboneyê Nûdemê”, **Nûdem**, j.10, Havîn 1994.
- Nûdem, “Bibe Aboneyê Nûdemê”, **Nûdem**, j.11, Payîz, 1994.
- Nûdem, “Cafê Nûdem”, **Nûdem**, j.33, Bihar, 2000.
- Nûdem, “Enstîtuyên Kurdî”, **Nûdem**, j.6, Bihar, 1993.
- Nûdem, “Hawar Derdikeve!”, **Nûdem**.j.22, Havîn, 1997.
- Nûdem, “Nûdem Werger Dike!”, **Nûdem**, j.13, Bihar, 1995.
- Nûdem, “Rohat Alakom: “Armanca Xoybûnê avakirina Kurdistaneke serbixwe bû””, **Nûdem**, j.27, Payîz, 1998.

- Nûdem, “Xelata Nûdem ya Edebiyatê”, **Nûdem**, j.6, Bihar, 1993.
- Nûdem, “Xelata Nûdemê ya Çîrokan”, **Nûdem**, j.8, Payîz, 1993.
- Nûdem, “Xelata Nûdemê ya Edebiyatê” **Nûdem**, j.10, Havîn, 1994.
- Nûdem, **Nûdem**, j.1, Bihar, 1999.
- Şahînê Bekirê Soreklî, “Ji Australya: Roj Baş”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.
- Şermîn Bozarlan, “NÛDEM Herdem Hat Seredana Me”, **Nûdem**,j.39-40, Payîz-Zivistan, 2001
- Wezîrê Eşo, “‘Riya Teze’ di nav dîroka Rojnamegeriya kurdî de pşpelekî geş e”, **Nûdem**, j.26, Havîn, 1998.
- Xelîl Dihokî, “Çîroka Jiyana Min”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.
- Yusiv Biyanî, “Firat Cewerî: Hawar Dengê Bêhêviyan Bû”, **Yazinca (Kovara Werger, Lêkolîn û Edebiyatê)**, j.10, Bihar, 2009.
- Zeynelabîdîn Zinar, “Kurtebehseke Jiyanê”, **Nûdem**, j.4, Zivistan, 1992.

### **Malperên Înternetê**

**Boldor, Alexandru**, *Exile As Severance*, Teza Doktorayê, Louisiana State University, ([http://etd.lsu.edu/docs/available/etd-07122005-112749/unrestricted/Boldor\\_dis.pdf](http://etd.lsu.edu/docs/available/etd-07122005-112749/unrestricted/Boldor_dis.pdf)) (05.05.2015)

[http://www.lemonde.fr/idees/article/2015/02/10/injustice-francaise-envers-les-kurdes\\_4573389\\_3232.html?xtmc=kendal\\_nezan&xtcr=1](http://www.lemonde.fr/idees/article/2015/02/10/injustice-francaise-envers-les-kurdes_4573389_3232.html?xtmc=kendal_nezan&xtcr=1) (05.05.2015)

<http://dictionary.reference.com/browse/diaspora> (10.05.2015)

<http://dictionary.reference.com/browse/exile> (10.05.2015)

## ÖZGEÇMİŞ

Mehmet Yonat 01.05.1989 tarihinde Muş'da doğdu. İlk, orta ve lise öğrenimini Muş'da tamamladı. 2011 yılında Atatürk Üniversitesi, Kazım Karabekir Eğitim Fakültesi'nden mezun oldu. Yine 2013 yılında Anadolu Üniversitesi, İktisat Fakültesi, Kamu Yönetimi Bölümünden mezun oldu. 2012 yılında Muş Alparslan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Bölümünde yüksek lisans programına başladı. 2013 yılında Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü'nde Araştırma Görevlisi olarak atanmış olup halen bu görevini sürdürmektedir.

Mehmet YONAT

NÛDEM DERGİSİ VE NÛDEM  
DERGİSİ'NDEKİ SÛRGÜN İZLERİ

YÛKSEK LİSANS MUŞ 2015  
TEZİ